

NÛDEM

No 16 1995



Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

NÛDEM Kovara hunerî, edebî û çandî.



Kurd ji hev cuda dilopên baranê ne, cihê
cihê têne daqurtandin. Ko gihane hev
dibin lehî, lehîke boş. Tu kes, tu tişt li
ber wan nikare bisekine. Felata welatê
me di rabûna vê lehiyê de ye.

Celadet Alî Bedir-Xan

Navnîşan: Termov.52, 175 77 Järfälla-Sweden.Tel û Fax: 08/583 564 68

NÛDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî

Xwedî û berpirsiyarê giştî
Chief Editor

Firat Cewerî

Hejmar 16
Zivistan: 1995

Şerdên abonetiye (salek)

Swêd: 190 Sek
Welatên din: 50 \$
Institution 260 Sek

Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964

Wêneya bergê: Rebwar Saîd

Pergala berg û rûpelan: Nûdem

NÛDEM kovareke ser-
bixwe û Kurdistanî ye, fer-
qiyetê naxe navbera nêrîn
û îdeolojiyên kurdan, ji
dijminatîya kes û rêxisti-
nan dûr e, rûpelên wê ji
hemû nivîskarên kurd re
vekirî ne.

*Hejmar 16, Duan, N. Kulley, Z. Zinar, N. Duf, G. H. Niz,
H. D. Zinar, S. B. Zinar, H. Zinar, S. E. Zinar, E. E. Zinar, Z.
F. Zinar*

Navnîşan/Adress

Termov. 52 tr.

175 77 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 8-583 564 68

NAVEROK

- 4 NÛSALA WE PÎROZ BE ♦ **Firat Cewerî**
- 6 SEYÊN ME HENE ♦ **Rojen Barnas**
- 7 MONSIEUR ET MADAME N. ♦ **Hesenê Metê**
- 12 TOVREŞÎN IM ♦ **Arjen Arî**
- 13 GENERAL ŞERÎF PAŞA ♦ **Rohat Alakom**
- 27 YILMAZ GÜNEY ♦ **Mihemed Dehsîwar**
- 40 LI SER GÜNEY ♦ **Baran Fundermann**
- 46 RADYOYA YERÎVANÊ ♦ **Wezîrê Eşo**
- 49 LI WÊ DERÊ ♦ **Seydoyê Kûso**
- 50 FÎLOZOFÊ DESTHILATÊ ♦ **Şerefxan Cizîrî**
- 54 DU ŞÎR JI ♦ **Can Gülşenoglu**
- 55 RASTHATIN ♦ **Tosinê Reşîd**
- 60 JINA KURD ♦ **Xelîl Duhokî**
- 62 TIRSA MIRINÊ Û KEÇA MUXTÊR ♦ **Bêyhanî Şahîn**
- 67 HEVPEYVÎN BI GINA JAKOBI RE ♦ **Hesenê Qazî**
- 70 HEVPEYVÎN BI GULÎSTAN RE ♦ **Nûdem**
- 76 HEVPEYVÎN BI MERZIYE RE ♦ **Mustafa Cizîrî**
- 78 HEVPEYVÎN BI NASIR REZAZÎ RE ♦ **M. Cizîrî**
- 81 HEVPEYVÎN BI TEMO RE ♦ **Derwêş M. Ferho**
- 84 HEVPEYVÎN BI SEÎD YÛSÛF RE ♦ **Nûdem**
- 91 NE TU BÛ ♦ **Abidîn Azad**
- 92 ÇEND NAMEYÊN NÛREDÎN ZAZA JI F. CEWERÎ RE
- 96 EV JI BER XWE WILO YE ♦ **Mayakovskî**
- 97 ZERDEŞT PÊXEMBER ♦ **Zeynelabidîn Zinar**
- 112 HEVPEYVÎN BI RONALD HARWOOD RE ♦ **Ş. B. Soreklî**
- 114 XELATGIRÊ NOBELÊ YÊ ÎSAL SEAMUS HEANEY

NÛSALA WE PÎROZ BE!




Firat Cewerî

Ji mêj ve di hişê min de bû ku em hejmareke taybetî li ser muzîkê çêbikin. Ji ber ku muzîk, an jî stran bingehê jiyana kurdan e. Rola muzîk û stranan di civata kurdî de mezin e. Kurd bi stranan re dikenin, bi wan re digirin; kul û derdên xwe, êş û elemên xwe, xweşî û nexweşiyên xwe di stranan de dibînin. Stran ji bo her kategoriyên civakê xwediyê rolên taybetî ye. Tiştên ku kurdan nikarîbûne bi riya edaleta civakî û bi riya qanûnan bi dest bixin, wan bi gotinên xwe yê bi jarte ku ji kûraniya dilê wan dihat, rewşa xwe anîne ziman; gazin ji civakê û ji nevekheviya civakê kirine û di stranan de li riyên çareserkirina pirsgerikên xwe geriyane. Bi gotineke din, stran perçeyek ji jiya-

na kurdan e. Loma me xwest ku em bi hejmareke taybetî, bi nivîsên akademîk û ilmî muzîka kurdî ji aliyê dîrokî, civakî û psikolojîkî ve binirxînin. Lê gava dem stewya û me dest bi amadekirina hejmara xwe kir, me dît ku di vî warî de kesên xwedî gotin gelekî kêr in. An jî ji ber kêmasiya agahdariya civakî, em nikarîbûn bigihîştina muzîkzanên kurdan. Lê belê ev nayê wê maneyê ku muzîkzanên kurdan tunene, ez hawer im ger di civata me de komunikasyona agahdariyê baş bixebitiya, me ê tavilê bikarîba nav û navnîşanên muzîkzanên kurdan bi dest bixistana û hejmara ku em lê fikirîbûn, pêşkêşî we xwendevanên delal bikira. Em hêvîdar in, em ê di pêşerojê de vê soza xwe bi cih bînin û bi nivîsên zanyarî yê di derheqa muzîka kurdî de hejmarekê bixemilînin. Lê di vê hejmarê de, em li ser muzîka kurdî, li ser problemên muzîka kurdî, li ser rewşa guhdaran, li ser pevgirêdana siyaset û hunerê bi hin hunermendan re peyvîn. Di nava van hunermendên ku em

bi wan re peyivîne de, hunermendêke swêdî ya navdar *Gina Jacobi* jî heye. *Hesenê Qazî* jî bo Nûdemê bi *Gina Jacobi* re peyivî. *Gina Jacobi*, ya ku bi staranên xwe dilê kurdan ber bi xwe ve kişandiye, di hevpeyvînê de hezkirina xwe ya ji zimanê kurdî re tîne ziman û agahdariyên li ser xwe û li ser muzîka xwe dide. Ji bilî *Gina Jacobi*, du hunermendên kurd yê jin *Gulîstan* û *Merziye* jî hene. Gulîstana ku bêtir dengê wê bi dengê *Şivan* re hatiye bihîstin, ji gundekî Siwêregê koçî Ewrûpayê dike, bi şanzdeh saliya xwe bi *Şivan Perwer* re dizewice û her di wî temenî de dibe hezkira bi hezaran mirovên kurd. *Merziye Rezazî* jî di hevpeyvîna xwe de diyar dike ku dê di pêşerojê de kurd ê li hunermendên xwe yê jin xwedî derkevin. Hunermendên mêr *Seîd Yûstîf*, *Nasir Rezazî* û *Temo* jî ji civata kurdan gazinan dikin û bawer in bi qasî ku pêwîst e kurd li wan xwedî dernakevin. Di vê hejmarê de hûn ê hevpeyvînen bi van hunermendên me yê kedkar re bixwînin; li ser hunera wan, rewşa hunera kurdî û rewşa kurdan ya siyasî jî haydar bibin. Ji ber ku mecala me çênebû û em negihîştin piraniya hunermendên kurd, em ji wan lêborînê dixwazin û tavilê diyar dikin, ku em ê ji bo hejmarên pêş bi kêfxweşî bi wan re têkevin têkiliyê. Ji bilî van hunermendên ku di vê hejmarê de cih girtine, em bi *Şivan Perwer*, *Ciwan Haco* û *Birader* re jî peyivîne, hersê hunermendan jî pêşniyaza me bi dostanî pejirandine, lê ji ber tengbûna demê me nikarîbû hevpeyvînen bi wan re bigihanda ser vê hejmarê. Herweha gelek hunermendên din û hunermendên ku ji dibistana *Hunerkomê* û *Navenda Çanda Mezopotamyayê* gihîştine mêvanên me yê hejmarên pêşerojê ne.

Rohat Alakom di vê hejmarê de *General Şerîf Paşa* ku di salên 1898-1908'an de li paytextê Swêdê, li Stockholmê, mîna sefirê dewleta Osmaniyan mabû û paşê bûbû têkoşerekî kurd, dike mêvanê Nûdemê. Şerîf Paşa deh salên mîna bahoze li Stockholmê buhurandibû û di wan deh salên xwe de hem ketibû nava arîstokrasiya Swêdê, hem li ba sosyeteya Swêdê dihate dîtin, hem jî bi spehîtî û çelengiya xwe dilê gelek keç û jinên swêdî peritandibû. *Hesenê Metê* bi stîla xwe ya Çexovane dilşahiyeke reben ya jin û mêrekî kiriye mijara çîroka xwe *Monsieur et Madame N.* *Mihemed Dehsiwar* û *Baran Fundermann* li ser hunermendê kurd yê pirrhêl *Yilmaz Güney* radiwestin; kurdayetî, şoreşgerî, mêrxasî, aktorî û rejîsoriya wî radixin ber çavan. Herçî *Zeynelabidîn Zinar* e, bi dîrokê ve kûr çûye û li felsefeya Zerdeşt hûr bûye. Çîrok, şîr û nivîsên din ku *Nûdem* xemilandine, di sariya zivistanê de germahiyekê di giyanê mirov de digerin.

Bi hêviya rojên xweş û geş ez sala we ya nû ji dil pîroz dikim! 

SEYÊN ME HENE

Rojen Barnas

Seyên me hene
 Bi rastî se ne
 Hin fîno ne, bocîk in
 hûrik û şîrîn
 Hin bildo ne
 Bi saw in
 Sergir û qirase ne

Seyên me hene
 Ku bera se ne
 Li ber şekalan cî nabînin di civatên me
 Di protokola dewletê de li rêza pêşî
 Bi trêmbêlên resmî
 Bi sekreter
 û nitirvan
 û bi mase ne
 Gava çav bi hestiyek mîrî dikevin
 Seyîtî bi wan digre
 Tê sond bixwî, bêjî qey
 Ji havênê seyîtiya xase ne.

Seyên me hene
 Se ne:
 Ji me ye heyîna jiyana wan
 Dûv di nêv ling de li ber deryên me,
 Sil in
 Zexel in
 Û cangiran
 Lê li ber deriyê dijmin bi şipil
 Dev bi kefûkunc in
 Reng mêrxase ne.
 Seyên me hene
 Heyra çi se ne?!

MONSIEUR ET MADAME N.

Di şevşahiyeke welatê me de li restavanteke bajarê X'ê ez jî li ber maseyê hevaltiya şûşa xwe dikim. Ji bilî min bêyî jin û malî kesek tune, ku hebin, Xwedê dizane wan jî li kêleka xwedîmalan cî dane xwe, bi kêmanî diya xwe an jî nasên xwe yê biyanî bi xwe re hanîne vê şeva pîrozwer.

Her cara ku ez piyala şeraba xwe ber bi devê xwe radikim, çavên min jî pê re bilind dibin û ez dibînim. Dibînim ku beşdarên vê şevê çiqasî bextiyar in. Bextiyariya wan ji tevgerên wan, ji xwarin û vexwarina wan diyar e. Lê dîsa jî ku yek rabe û ji hemû mêvanên vê restavantê bipirse: «Ka bextiyartirîn kesê vê şevşahiyê kî ye?» bêguman dostekî min î kevn ê rabe û bibêje: «Ez im!»

Bi qasî sê masan jî min dût li kêleka diwêr li dor maseyeke gulover du mêt û du xatûn rûniştine. A jî wan mêran yek, ev dostê min î kevn û bextiyar e. Paşya dostê min bi min de ye û ew min nabîne. Herçiqas jî zû ve me hevdu ne dîtî be jî, min dil nîne ku ez di vê gavê de biçim û bibim xwedîparê bextiyariya wî. Bi bextiyarî piyala xwe bilind dike û bi hevalbendên dora xwe re dinoşîne. Di her carên weha de dostê min bi paş de ditewe û jora serê wî dibiriqe. Dora serê wî bi pirç û jora wî rût e. Bi gotineke din ku hinek fantazyên meriv hebe, biçê li paş vî dostê min bisekine û ji jor der lê binêre, ew ê bibêje:



Hesênê Metê

«Xwedê bi zanatî Û'yeke bêkumik bi jora serê wî ve zeliqandiyê.»

Bi qasî saet û nîvekê wext dibuhure, hemû mase hêdî hêdî ji giraniya xwarin, kevçî û çetelan sifik dibin û şûşe jî li ber valabûnê ne. Ez dibînim ev dostê min çawa ji ber masa xwe radibe, ber bi xatûna pêş xwe ditewe, tiştina jê re dibeje, ji bo yên kêleka xwe jî silaveke destûrane dide û ji wir ber bi hêla min tê. Li hêla min, bi gotineke din, masa min li kêleka barrê ye û riya tuwaletê jî di ber min re diçe. Dostê min bi dijwarî dilive, carina li paş xwe dizivire, dilikume û tê. Bi vê hatina xwe re çer ku çav li min dikeve, herdu destên xwe ber bi min radike, kujên çakêtê wî bi herdu aliyan de ba digirin û dibê:

– Wey, wey, wey!... De ji xwe re lê binêrin... ez kê dibînim, ji kengî ve ye, ezbenî!...

Li ser lîngan ez destê wî dişidînim û dibêm:

– Bi rastî jî ji zû ve ye... lê ez dinêrim ku tu îşev xweş û kêfxweş î, bextiyariya te bêpîvan e, dostê min.

– Ma kêf û xweşî... ma bextiyarî jî gotin e, ezbenî! Ez dikanim bibêjim ku ewk e... di roja îroyîn de ji min bextiyartir dîsa ez im. Tu ê bibêjî çawa?... Tê bîra min, ji bo ku ez formeke munasib bidime xwe, bi saetan min ewk dikir... min bi neynikan re pevdîçinî. Bi taybetî jî min xwe ji merivên xwedîjin û malî vedikişand ku vê rewşa min nebînin. Bi kurtî ez di ewkekê de bûm... ez di rezîlyekê de bûm. Lê... şikir ji Xwedê re piştî vê zewacê êdî neynikên herf mezin jî... belê, ew jî bala min nakişînin û

serê min ewk e... serê min bilind e.

Bi van gotinên xwe re dostê min serê xwe jî bilind dike, lê ez xwe li nezaniyê datînim û weha dibêjim:

– Ca lê binêre, ca lê binêre!... Xuyaye te jin haniye jî.

– Belê, ezbenî, belê... min jin haniye... binêre...

Dostê min dîsa li paş xwe dizivire, di ser wan sê masan re destê xwe bilind dike û mîna zarokên filîstîniyan du tiliyên xwe dike mîna heçf. Lê mebesta dostê min ne gotina serketinê ye. Lewra ew wan tiliyên xwe dûre hêdî hêdî dadixe, ber bi simbêla xwe ya gir dibe û Xwedê dizane bi viya dixwaze maçekê bistîne an jî bişîne û didomîne:

– Binêre... a çavreşa min li wir e!...

Li wir du çavên reş bi awurekî tirş ber bi me dinêrin. Dostê min çêlî başiyên zewacê dike û ji min re dibê:

– Bizewuce... Ji zewacê xweştir dîsa zewac e. Bi taybetî jî di şev û şahiyên weha de pêwîstiya meriv bi ewkekê heye... bi jinekê heye. Ez dizanim bê anuha rûniştina li ber vê masa hişk çiqasî bi te ewk e... bi te dijwar e! De ka tu li xwe mikûr were û ji min re bibêje... ma tu nabêjî: "Ax!... anuha min jî kevnejinek hebûya!" Belê, belê... tu wusa dibêjî û ya rastirîn jî ew e! Binêre... bi serê xwe û-te sond dixwim ku... ji xêra vê hurmeta ha ye ku îro ez jî beşdarî şevşahiyeke weha me. An ne... bawer bike anuha şûşa min di dest min de û Xwedê dizane bê ez di binê kîjan dîwarî de rûniştî bûm.

Ez sandaliya li kêleka xwe keremî dostê xwe dikim û dibêm:

– Ca kerem bike, xuyaye tu pir ji xatûna

xwe hez dikî.

Di rûniştina xwe de dostê min destê xwe jî ber bi erdê dawdişine û dibê:

– Ma hezkirin jî gotin e, ezbenî!... Ku ez pêxember bûyama min ê di hedîsên xwe de bigota ewk e... min ê bigota: “Buhušta rastkîno di binê lingên jina meriv de ye.” Ku ez serokê parlamentoyê bûyama, min ê bikira ku hemû parlementerên mêr bi serên jinên xwe tenê sonda welêt bixwarana. Belê... li vê dunyayê tişteki ku ez jê hez bikim, ew jî xatûna min e... mîna ruhê xwe... mîna ronîya çavê xwe ez ji wê hez dikim. Ji bo min ew ne tenê jin e. Na!... ew hertiştê min e... çavê min e, ruhê min e, guhê min e, hiş û aqilê min e...

Ji bo ku dostê min wê xatûna xwe neke hemû deverên laşê xwe, ez peyva wî dibirim û dibê:

– Jin çawa dibe hiş û aqilê meriv ez têna-gêhîjim.

Dostê min xwe li ser sandaliyê berhev dike û dibê:

– Haa!... tu ê bibêjî çawa? Guhdarî bike... sê çar rojan vî deriyê eywana me her ewk dikir... dikire çireçir... çir, çir, çir... dengêki naxoş bû lê hişê min di ber de ne diçû... a dîsa ev ruhika min rabû û ji min re got: «Rabe rûn têbide.» Te got, erê? Nîmûneyeke piçûk e lê dîsa jî ewk e... Ca bifikire meriv xwediyê jineke, xweşik, kubar, zana, jîr û mêrane bel!...

Bi tevgerê nezanê:

– Jin jin e, dibêjim, de îcar te ev mêrane ji kuderê derxist, ez têna-gêhîjim.

– Min ji derekê dernexistiye, ezbenî!... di vê mesela jinan de jî tişteke nakeve serê te

ku!... Mêrane dibêjim, ewk e... bi rastî jî jineke mêrane ye. Ev mêraniya wê, min bi çavên xwe jî dîtiye. Wê rojê-li ser mijara jin û mêr em bi yekî re ketin galegalê. Ez nizanîm bê çawa bû, lê ewk bû... min hew carekê dît ku xatûna min bi hêrs jê re: “De siktir be, ûlan!” got û tiliya xwe jî li mêrik bilind kir. Bi serê min û te mêrikê reben tew ne diwêrî bû dengê xwe jî bikira. Te got, erê? Tenê bi awakî nermokî zivirî ser xatûna min û gotê: “Tu nizanî peyvên xwe bikî!” Lê tu were ji min bipirse ka ew dizane ewk bike... peyvên xwe bike an ne. Belê, dizane û pir jî dizane. Ji xwe li ser vê zanebûna wê îlham hate min ku ez jî li ser mijara jinan ewk bikim... ez dest bi nivîşan bikim. Di nivîsa xwe ya pêşîn de dibêjim: “Gotina ku dibêje: şêr şêr e çi jin e çi mêr e, pir û pir rast e. Çewtiya vê gotinê tune ye û loma divê mêr jî bi mêraniya xwe bizani bin û feraqan bişon...” Ca bibêje ezbenî, ji nivîseke weha re wekî mêreki tu çi dibêjî? Ma ne rast e?

Li vir ez têdigêhîjim ku vî dostê min piştî zewaca xwe dest bi nivîsandinê jî kiriye û di ber xwe de:

– Rast e, dibêjim, ez bi xwe jî feraqan dişom.

– Erê, erê... lê ev nivîsa min ewk e... ne ji bo yekî wekî te ye. Ev rasterast ji bo wan serhişkên zewucî ye. Min nivîsiye ku ew jî li malên xwe feraqan bişon. Te got çi?...

Ez dîsa di şeyê dostê xwe de lédixim û bi zarekî nermokî:

– Rast e, dibêjim, divê ew jî bişon.

– Ma tu bawer dikî ku piştî vê nivîsa ha serhişkên me jî feraqan bişon?

Nizanim çima, lê di wê gavê de li hemberî vî dostê xwe ez serê xwe nerm dikim, dilê xwe nerm dikim, zimanê xwe nerm dikim û dibêim:

– Nizanim ku... ku ez bim... ku niviseke weha li ser min were nivisandin, ne tenê feraqên mala xwe, ez ê biçim feraqên cîranan jî biçom.

Bi van gotinên min re nexşên serbilindî û serketinê li ruyê dostê min diyar dibe û dibê:

– Hêvîdar im ew jî mîna te bifikirin. De ka tu were ez te bi xatûna xwe bidime nasikirinê.

Dostê min dest davêje şûşa min ya nîvçe û li pêşiya min ber bi masa xatûna xwe dimeşe. Li ser kêlekan, ber bi pêş û paş wusa ditewe ku meriv dibêje qeyê hemû jî ji ber giraniya wê şûşa di dest de ye. Ez di dilê xwe de: Şeraba îşevîn û bextiyariyê li serê dostê min xistiye, dibêjim û dibînim bê dostê min çawa bi dijarî xwe digêhîne ber wê masa gulover. Li wir li pêş masê bêyî daxwaza xwe du sê caran li vî aliyê û wî aliyê ditewe, destê xwe î vala ber bi xatûna xwe dirêj dike, dûre vedigere ser min û dibêje:

– Ev hurmeta ha, ruhika min e... ev ciwamêr û ciwanika din jî cîranên me ne. Ji malmezînan fransî ne. Dema ez û vî xatûna xwe... em ji gerê an jî ji bajêr tên, di pencerê re ewk dikin... di pencerê re silavê li me dikin û dibêjin, Monsieur et Madame N. arrivent.

A di wê gavê de ji devereke masên hawurdor bi dengêkî firqûzane re şûşeyek jî bilind dibe û dibêje:

– Noş, kekê N... Noş!

Kekê N. şûşa di destê xwe de, bi gotineke rastirîn, şûşa min bilind dike, devê wê dixê devê xwe, bilind dike û tavilê ji devê xwe derdixe. Bi bayekî bêwext re, tev kuxikeke nîvçe qumeke şeraba sor jî ji devê dostê min direve der û pijî ser wî, pijî hêleke wê masa gulover de dibe.

Ev rewşa dostê min ji ber wan çavên reş nafilite û ez dibînim bê bi awurekî çawa dostê min dadiwerivîne. Lê di rewşeke weha de awurên herî tûj jî bala dostê min nakêşîne. Û tew şûşa di destê xwe de jî danayne. Bi destê xwe î vala perçek destmala kaxezîn ji bêrika çakête xwe derdixe, pêşiyê di dev û pozê xwe re dide û dûre jî serê wê masa gulover paqij dike.

Heta ku dostê min, serê masê paqij dike û min jî bi wan dide naskirinê, ew çavên reş hîn jî bi wan awurtûjiyan e. Bi enirîn li dostê min diqîre û dibê:

– Te çi ew şûşa ha weke boça kerê xistiye destê xwe, ma tu şerm nakî? Te em rezîl kirin!

Ji bo ku xatûn ji ber van tevgerên dostê min zêde rezîl nebe, ez jî dikevime navînê û dibêim:

– Xem nake, xatûnxan, ji xwe şevên weha ji bo vexwarinê ne. Ku meriv vexwin jî...

– Ku meriv vexwin jî... ne pêwîst e ku meriv bi xwe de birî û xwe bihetikîne. Ev çend wext e ez pêde ketime ku xwe biguhe-rîne. Lê ji bo yên wekî we û wî xem nake.

Ji van gotinên xatûnê ez di ciyê xwe de sipûsar dibim. Nizanim ku ez ê wekî din çi bibêjim. Lê dostê min van gotinên xatûna

xwe li xwe nagire. Bi reneki alçenabane serî her hevokeke wê, mîna ku bibêje: ez bi qurbana wî zimanî, xwe ji navê û berjor ditewîne. Vê carê jî xatûn hêrsa xwe mezintir dike û jê re dibê:

– Weke ehmeqan xwe wusa li ba neke û di ciyê xwe de rûne! Te em hetikandin!

Di rûniştinê de mîna ku nû tiştêk têkeve bîra dostê min, destê xwe jî ber bi xatûna xwe dirêj dike û dibê:

– Ma ne min ê biçûya ewk bikira?... min ê...

Bi awakî ku xatûn tinazên xwe bi devê wî bike, mîna reqekê hustuyê xwe jî ber bi dostê min dirêj dike û dibê:

– Belê, serzilûtê min, te ê biçûya mîza xwe bikira û te ê şerab jî ji mêvanên me re bihaniya!...

Diyar e dostê min î serzilût nû hay ji valayiyekê dibe, wê şûşa di destê xwe de dibe tîne, mîna ku bibêje di bextiyariyên zewacê de xwejbîriyên weha jî dibin, berê xwe bi

min de dike, ruyê wî soromoro dibe, di bin çavan re li xatûna xwe dinêre û di ber xwe de:

– Li min ewk bike... xatûna min, li min bibore!... dibêje û dike ku dîsa ber bi barrê biçê.

Lê xatûna wî li wî nabore, bi hêseke mêrane lingên xwe li erdê dide, tiliya xwe jî lê bilind dike û:

– De siktir be ûlan!... dibêje, bi awurtûjî dest davêje çentê xwe û ber bi barrê diçe.

Dibe ku mîna Mirina Karmendê Çêxov di wê gavê de tiştêk di zikê dostê min de naqete, lê ez dibînim bê çawa xwezî di gewriya wî de dimîne, gwîne wî divemire, destê xwe davêje serê xwe î rût û li pey xatûna xwe dinêre. Xweş diyar dibe ku êdî ruyê dostê min nagire li malmezînen firansî jî binêre. Lê dengekî fransî tê bihîstin û dibê: Ne Monsieur N. lê Madame N. hêrs bû. ■



BERFİN

Cağaloğlu Yokuşu, Evren Han Kat: 3/55 34440
Cağaloğlu / İSTANBUL Tel: (0.212) 527 03 22

TOVREŞÎN IM

Arjen Arî

Tovê jiyane di pêşmalka min de
 Tovreşîn im li erdên beyar û kizirî
 Li axa xwe min ev çandibû
 Ji axa xwe min hilanî
 Tovreşîn im, tovê jiyane direşînim
 Loma wisa rûmirov im, beşîşîn im.

Ez pale me li palûteyên biratiyê
 Tasa ava min sipartî bayê çiyê
 Ji kaniyên mirovatiyê, ji avsarkên beriyê
 Dasa min nabire, diçîne xweştovê azadiyê
 Loma ez Laleş im, loma ez geş im
 Şîn dike li axan seranser tovê jiyê.

Xela be, cela be, aşût be şapat be
 Cêzên qûtê jiyê li nik min lod lod in
 Xelkê bizirê zexeliyê difirotin
 Vekirime sikrên Dîcle û Firat
 Sebîl, belaş diherikin mirovatiyê.

Bi çarlepkan dimeşiya şarezatî, dest damê,
 Di tirabêlka rêyên min de hînî tena bû,
 Anatoliya wê gavê temengeda bû
 Qewm dihevandim, min dahn dida wan
 Ezimandî-ne ezimandî
 Sifra min raxistî bû li ber mirovatiyê
 Rû nedabim êrîşkeran, keleşan, talankeran,
 Ev dest in xwediyên wî arê pîroz,
 Di siharên min de hilatine newroz.
 Tovreşîn im, tovê jiyane direşînim
 Di xetên Simmeran de tîm, diçînim azadiyê.

95 Amed

GENERAL ŞERÎF PAŞA

Lî Stockholmê (1898-1908)

Şerîf Paşa (1865-1944) yek ji wan şexsiyetên Kurd e, ku Şzû hatiye ji bîr kirin, ji aliyê din heta niha tiştên ku li ser Şerîf Paşa hatine nivîstn, çawa em dibînin gelek bi sî-norkirî ne . Jiyîna Şerîf Paşa, jiyîneke rengîn û jîndar e, bi rastî hêjayî lêkolînên fireh in. Ev şexsiyetê ku di çavkaniyan de wek "Mehmed Şerîf Paşa", "General Şerîf Paşa", "Saîd Paşazade Şerîf Paşa", "Meşhur Şerîf Paşa", "Beau Cberîf Pacha", "Şerîf Paşayê Kurd", "Sefîrê Stockholmê yê kevn" hatiye nav kirin, ji aliyê din wek efser, dîplomat, siyasetvan, nivîskar, rojnamevan, ronakbîr û temsîlkarê Kurdan hatiye nasîn, kesekî piralî û însiyatîfkar bûye.



Şerîf Paşa dema ji Stockholmê vedigere Parîsê, ji rojnamevanan re dide diyar kirin ku armanca wî ya here mezin li Misîrê li ser erdên xwe mijûliya çandiniyê ye. Şerîf Paşa, vê rengîniya kirina karên ji hev cuda, ji nû-çegîhanê rojname *Dagens Nyheter* re, bi kurtî waha îzah dike: "*Leşkerek dikare her tiştî bike*"⁽¹⁾. Bi baweriya min rengîniya jiyîna Şerîf Paşa di bin van gotinên navdar de veşartîye.

Di jiyîna Şerîf Paşa de çend periyodên bingehîn û giring hene, her periyodek bi serê xwe babeta lêkolînekê ye. Di vê lêkolîna xwe de emê tenê li ser salên Stockholmê yên Şerîf Paşa bisekinin. Periyodên giring yên jiyîna Şerîf paşa mirov dikare waha beş bike:

Periyoda I: Salên Stockholmê, muhalefeta li dijî Abdulhamîd (1899-1908).

Periyoda II: Salên Parîsê, muhalefeta li dijî Cemiyeta

Rohat Alakom

Îtîhat û Terakkîyê (1909-1914). *Periyoda III: Temsilkariya mafên Kurdan li Parîsê* (1918-1920).

Ev hersê periyodên ku ji tekoşîna siyasî pêk hatine, di jiyîna Şerîf Paşa de cîhekî giring digrin. Di vê lêkolîna xwe de, emê tenê çawa me li jor jî got li ser periyoda yekemîn bisekinin û derheqa jiyîna wî ya Stockholmê çend agahdarî û zaniyariyan pêşkêş bikin. Monografiya ku me li ser Şerîf Paşa amade kiriye, di nav demeke kurt de bi navê "Salên Bagerê yên Dîplomatekî Kurd - General Şerîf Paşa" wek pirtûk wê di nav weşanên APEC'ê de bê weşandin.

Eger "ansîklopediyên biyografîk" an jî xebatên "kî kî ye?" li ber destê mirovan tune bin, ji nûh ve nivîsîna serpêhatiya şexsiyeteke gelek dijwar dibe. Divê mirov here pey koka her babetê bikeve. Dema me xwest ku tenê derheqa jiyîna Şerîf Paşa ya Stockholmê xwedî zaniyarî û agahdarî bin, me dît ku karê nivîsîna biyografîke nûh çiqas dijwar e. Mirov pêwîst e ku li gelek deriyan bixe. Ji bo vê xebatê me li bajarê Uppsala û Stockholmê muraçaatî gelek dezgehên wek pirtûkxane, arşîvxane û muzeyan kir, him materiyalên li ser Şerîf Paşa, him jî yên ku Şerîf Paşa bi xwe amade kirine, di van dezgehên de bi baldarî ke mezin ve tînin parastin⁽²⁾. Her carekê em di rojname, kovar, pirtûk, name, arşîvên wêne û destnivîsan de rastî tiştêkî dihatin. Lê belê şekirina weşanên periyodîk yên van deh salan karekî hêsan nîn e, her qulubandîneke pêlên rojnameyan derîkî nûh ji me re vedikir û karên

me hêsantir dikir. Dema me hemû ev perçe û pirtîk gîhandine hev, portreya Şerîf Paşa ya nêzkaya berî sed salî li Stockholmê bi xwe derkete holê. Mimkun e ku ev portra Şerîf Paşa ewqas ne zelal be, lê belê ev xebata me wek destpêkekê dikare bê hesibîn, ez bawer dikim ku li ser vê babetê di pêşerojê de zaniyarî û agahdariyên nûh wê bibiştirkin, emê Şerîf Paşa baştir binasin.

SEFERA ŞERÎF PAŞA YA STOCKHOLMÊ

Şerîf Paşa wek sefirê Osmanî tam deh sal li Stockholmê-paytextê Swêdê maye (1898-1908). Şerîf Paşa 4 Adarê sala 1898'an de tê tayîn kirin, lê belê piştî çend mehan dest bi karê xwe dîke. Şerîf Paşa bi du sekreterên xwe ve tavayî - Saliş Beg û Muhtar Beg- roja 9.7.1898'an de bi trenê ve tê Stockholmê. Konsolosê Osmanî Simon Sachs diçe pêşîya Şerîf Paşa û wan wek mêvan diezimîne. Ji ber ku teze hatiye û mala wî ya nûh hin neqediyaye, ew û sekreterên xwe di otêleke navdar Grant Hotel'ê de cîwar dibin. Roj-tira din Sîmon Sachs mêvanên xwe li bajarê Stockholmê digerîne, çend cîhên navdar û dîrokî nîşanî wan dide. Şerîf Paşa di roja 11.7.1898'an de derdikeve hizûra qiralê Swêdî Oscar II û deftera xwe ya baweriyê teslîm dîke⁽³⁾.

Derheqa hatina Şerîf Paşa de nûçeyên pêşîn, di rojnamên bi tarîxa 12.8.1898'an de derdikevin. Hatina Şerîf Paşa li Stockholmê zu belav dibe û cara pêşîn çend porteyên wî jî, di çapemeniyê de cîh digrin. Rojname bi navê *Ny Illustrerad Tid-*

ning wek mîsal hatina Şerîf Paşa wek nûçe dide, ji aliyê din dide kîvşê ku Şerîf Paşa ji aliyê bav de yek ji wan malbatên here kevn û naskirî yên Kurdistanê ye⁽⁴⁾.

Şerîf Paşa deh sal li Stockholmê maye, tertim li taxa *Östermalmê*, taxeke bajêr ya sosyetê, dewlemend û dîplomatan jiyaye. Ji aliyê din ev taxa, bi avahî û xaniyên xwe yên xweşik ve hatiye nasîn. Şerîf Paşa di nav van deh salan de sê mal guhirandine. Çêkirina xaniyê wî yê pêşîn hema wê salê temam bûye, ji aliyê rojnamên wan salan ji ber xweşîkbûna xwe, ev xaniya wek *Qesrekê* hatiye nav kirin. Ev xaniyê ku li ser kuça bi navê *Kommendörgatan 32* hatiye çêkirin, heta niha jî maye û ji bedewiya xwe ya berî sed salî tu tiştek wunda nekiriye. Şerîf Paşa di vî xanî de qasî heşt salan maye. Paşê di xaniyekî ku li behrê dinêre, jiyaye. Ev xaniye ku li ser kuça bi navê *Strandvägen 35* dimîne, niha jî heye û ji aliyê Balyozxana Misirê de tê bi kar anîn. Şerîf Paşa ji ber sedemên ku em pê nizanin, ji vir jî bar dike û diçe kuça bi navê *Linnegatan 5* cîwar dibe. Ev xaniyê dawîn paşê tê hilweşandin, li şunê bi navê *Zurich-Huset* avahîke mayîn ya modern tê çêkirin.

Şerîf Paşa, hundirê her malekê angorî daxwaza dilê xwe ji nûh ve çêkiriye û wek qesrekê xemilandiye. Nûçegîhanekî Swêdî ku hundirê mala wî ya dawî geryaye, salona vê malê yek ji wan salonên xweşiktir yên Stockholmê dihesibîne⁽⁵⁾. Çend rojnamevanên Swêdî çûne mala Şerîf Paşa, ew ziyaret kirine, derheqa tanzîma hundurê mala wî de agahdariyên kurt



General Şerîf Paşa

pêşkêş dikin. Nûçegîhanê rojnama *Dagens Nyheter* diçe mala wî ya ku li ser kuça *Linnegatan 5*, xweşîkbûna mobîlyayên malê, bala wî dikşîne û qala wêneyên ku di mala Şerîf Paşa de dardakirî dike. Di nav van wêneyan de wênê Mehmed Alî Paşa jî heye. Ev Waliyê Misirê yê navdar çawa tê zanîn kalkê jina Şerîf Paşa ye. Demekê Şerîf Paşa vê wêneyê ji rojnamevan re nîşan dide, di bin lêvan ve dikene û dibêje ku: "*Hemû Ewrûpa li ber wî dilerizî!*"⁽⁶⁾. Nûçegîhanê rojnama *Svenska Dagbladet* jî dibêje ku, di oda xebatê ya Şerîf paşa de pirtûkxaneke gelek xweşik û mezin hebûye, ode ji serî heta binî bi pir-

tûkan ve tijî bûye⁽⁷⁾.

DÎPLOMATEKÎ POPULER

Dema em medya Swêdî ya salên 1898-1908'an raçav dikin, em dibînin ku du peyvên ku ji bo Şerîf Paşa zêtir hatine bi kar anîn, peyvên "sempatîk" û "populer" in. Piştî ku Şerîf Paşa li Stockholmê cîwar dibe, ji aliyê rûniştvanên Stockholmê de zû tê nas kirin. Ji alîkî de simbilên wî yên mezin, bejna bilind û çeleng, ji aliyê din kincên wî yên dekoratîv û fesê wî yê sor gelek bala rûniştvanên Swêdî dikêşîne.

Şerîf Paşa wextê xwe yê vala zêtir bi spor, nêçîr û xwendinê ve derbas kiriye. Ew, ji aliyê medyayê de wek "Parîsvanekî tîpîk" hatiye nasîn. Li dorberên sosyetik û dîplomatîk de bûye xweyê karîzmake mezin. Di nivîseke ku di sala 1899'an de çapbûyî de tê diyar kirin ku, di nav sefirên biyanî de tu kesî wek Şerîf Paşa baldarîke jîndar nekişandiye, li ser Şerîf Paşa zêde weşandina nivîsan wek nîşana vê popularîtê tê diyar kirin⁽⁸⁾. Nameke xwendevanan ya sade ku di sala 1903'an de hatiye nivîsîn jî nîşan dide ku Şerîf Paşa ji aliyê mirovên Stockholmê de gelek hatiye hez kirin⁽⁹⁾.

Şerîf Paşa dema dest bi karê xwe kiriye, ji bo pêştabirina pêwendiyên Osmanî û Swêdî gelek hewl daye. Piştî hatina Şerîf Paşa, bi taybetî di navbera herdu dewletan de pêwendiyên dîplomatîk û aborî her diçin xurt dibin. Şerîf Paşa bi gelek dezgeh û şahsiyetan re dide-distîne û pêwendiyên nûh pêk tîne, ji Wezîrê Karên Der-Eric Trolle, nivîskar Fredrik Ulrik

Wrangel, mabeynciyê qral Carl Carlson Bonde û Serokê Daira Postê E. von Kruusentjerna re şandina çend nameyan, pêştabirina van pêwendiyên nîşan dide⁽¹⁰⁾. Şerîf Paşa hemû nameyên xwe bi Frensî nivîsîne. Ji ber ku zimanê Frensî baş zanibûye û ji ber zêdebûna karên xwe, Şerîf Paşa firsend nedîtîye ku zimanê Swêdî fêr bibe, di hevpeyvîneke xwe de dide diyar kirin ku jina wî Emîne Xanim di warê hînbûna zimanê Swêdî de zêtir pêş ketiye.

Efserekî ku Şerîf Paşa ji nêzîk ve nas kiriye, Şerîf Paşa wek "dîplomatekî bi maharet" bi nav kiriye. Ev efsere bi navê W. Unander dide kivşê ku Şerîf Paşa pêwendiyên Osmanî û Swêdî jîndar kiriye. W. Unander di sala 1908'an bûye mêvanê Şerîf Paşa, di wê şevê mêvanên gelek ezîz yên mayîn jî hebûne, wek Wezîrê Karên Der -Eric Trolle...⁽¹¹⁾.

Şerîf Paşa dema li Stockholmê maye, gelek caran xelatên cure-cure wergirtine. Di sala 12.9.1899'an de hêjayî xelata bi navê "Svärdorden" (Nîşana Şûr) dibe û di sala 5.8.1908'an de nîşanake bi navê "Nordstjärnaorden" (Nîşana Stêrka Bakur) ji destê qral werdigre.

Hunermend û nivîskarê Swêdî yê mîzahê Albert Engström (1869-1940) du caran karikatûrên Şerîf Paşa çêkirine, yek ji wan di kovara xwe ya bi navê *Strix* de weşandiye, di herdu karikaturan de jî simbelên Şerîf Paşa dişa gur in, heta guhên wî hatine dirêj kirin⁽¹²⁾.

Di sala 1908'an de berî ku Şerîf Paşa dest ji karê xwe berde, Abdullah Paşa wek

mêvan tê Swêdê, armanca hatina wi ji qralê Swêdê re teslîmkirina xelata bi navê *Nîşan-i Imtiyaz* e. Hatina Abdullah Paşa li Stockholmê gelek deng dide. Şerîf Paşa vî mêvanê xwe çend rojan li Stockholmê digerine, di programa gera wan de dîtina cîhên turistik wek *Skansen, Nordiska Museet, Saltsjöbaden* û gelek cîhên mayîn jî hene⁽¹³⁾.

ŞERÎF PAŞA Û OSCAR II

Şerîf Paşa dema li Stockholmê dima, wan salan qralê Swêdê Oscar II (1829-1907) bû. Çawa em ji çavkaniyan fêr dibin ku di navbera Oscar II û Şerîf Paşa de dostanî û hevaltîke mezin peyda bûye. Şerîf Paşa qral Oscar II wek qral gelek ecibandîye û di bin bandûra wî de maye.

Şerîf Paşa dema tê Swêdê, payîza 1899'an li herêma Skåne manewrake leşkerî ya mezin çê dibe, bi hezaran leşker tevî vê manewrayê dibin. Şerîf Paşa jî wek mêvan tê ezimandin, bi kincên xwe yê leşkerî di vê manewrê de beşdar dibe û bala gelek beşdaran dikşîne⁽¹⁴⁾. Wê demê Oscar II jî tevî van manewran dibe. Ji bo hesabê Şerîf Paşa, li bal muhendisekî bi navê Bech pênc ode tînan cuda kirin⁽¹⁵⁾.

Dema Şerîf Paşa tevî van manewran dibe, ew û Oscar II derdikevin nêçîrê jî. Çawa em ji çavkaniyan fêr dibin mijûlîke mezin ya Şerîf Paşa jî nêçîrtî bûye. Ji aliyê din Şerîf Paşa endamê *Kluba Oscar II ya Nêçîrê* bûye⁽¹⁶⁾.

Şerîf Paşa tevî planên pêkanîna yekitiya Osmanî-Swêdî li dijî Urisetê bûye, di vê babetê de bi Oscar II re peyiviye û ji İs-

tenbolê re şeş telegraf şandiye. Gelek salan şunda ev yekitiya Osmanî û Swêdî bûye babeta lêkolîneke dirêj⁽¹⁷⁾.

Çawa çend çavkaniyan de cîh giriye, hunermendê Swêdî Axel Jungstedt (1859-1933), di sala 1900'an bi boyaxa rûn wênekî Şerîf Paşa çê dibe, Şerîf Paşa di vî wêneyî de bi Oscar II re tevayî tê xuyan, ev tablo di manewrakê de dema Şerîf Paşa û Oscar II bi hevra dipeyîvin, hevaltîke wan temsîl dibe⁽¹⁸⁾. Çend Swêdiyan ev tabloya bi çavên xwe di mala Şerîf Paşa dîtine⁽¹⁹⁾. Dema me ev lêkolîna li ser Şerîf Paşa amade dikir, me xwest ku fêr bin gelo ev tablo niha li kîderê ye, îmkân hebe wê bibînin. Piştî pirs û pirsîyariyan me dît ku ev tabloya derketiye "*seyranekê dirêj*", pêşiyê diçe Parîsê, Monte Carlo, paşê Kahîrê, careke din tê Stockholmê û di dawiyê de jî diçe Istenbolê - bajarê xortaniya Şerîf Paşa. Angorî dokumenteke ku di *Pirtûkxana Huner* de heye, ev tabloya piştî mirina Şerîf Paşa dikeve destê keça wî Şerîfe Xanimê. Keça Şerîf Paşa jî tabloyê di sala 1966'an de li Kahîrê difroşe balyozê Swêdî Adolf H. F. Croneborg. Adolf H. F. Croneborg (1900-1983) dema vegeerê vê tabloyê bi xwe re tîne Stockholmê, lê belê angorî îfafadeya kurê wî, diya wî ev tabloya berî mirina xwe diyarî muzeyêke Istenbolê kiriye, çawa em dibînin ku çiroka vê tabloya Şerîf Paşa dût û dirêj e. Mirov ji vê çavkaniyê jî derdixe ku keça wî ya mezin heta sala 1966'an jî jiyaye. Doxtorekî kurd -Selahattin Rastgeldî ku bi salan li Stockholmê maye, di sala 1966'an de diçe Kahîrê, dibe mêvanê Şe-



Karîkatorekî Şerîf Paşa ku di sala 1899'an de ji aliyê hunermendê swêdî Albert Engström ve hatiye çêkirin

rîfe Xanimê. Ew, wêneyekî xwe û bavê xwe jî diyarî Selahattîn Rastgeldî dike⁽²⁰⁾.

DÎTINÊN ŞERÎF PAŞA LI SER SWÊDÊ

Şerîf Paşa gelek caran li ser civata Swêdê, erf-eded, rabûn-runîştinên wan û zîhnîyeta Swêdiyan, bawerî û dîtînen xwe bi vekirî ji rojnamevanan re pêşkêş kiriye. Di rojname û kovarên Swêdî yê navdar de çend hevpeyvînen Şerîf Paşa hatine waşandin.

Şerîf Paşa dema li Parîsê bûye, berî ku

bê Stockholmê hevalan çavê wî û jina wî tirsandine wekî Swêd, wela-tekî sar e, hewayaya Swêdê gelek sert e. Lê belê dema Şerîf Paşa tê Stockholmê, ji rojnamevanekî re: "Me hewayaya Swêdê gelek baş dît" dibêje⁽²¹⁾.

Dezgeh, muessese û saziyên Swêdî gelek bala Şerîf Paşa dikşîne. Di cîhekî de dide kîvşê ku ew bi berpirsiyarên welatê xwe re ketiye pêwendiyên, ji wan re nivisiye wekî çend xort bêne vir, derheqê Swêdê de lêkolîn û îzgeriyên bikin. Şerîf Paşa diyar dike ku di nav gelek dewletan de, Swêd dewleta here îdeal e⁽²²⁾.

Şerîf Paşa gelek pesnê Swêdiyan dide, bi taybatî parastina şovaliyetiyaya wan ya kevn giring dibîne. Ji aliyê din pêwendiyên di navbera qral û mirovan de gelek bala Şerîf Paşa dikşîne. Şerîf Paşa gelek caran bûye şahîdê van pêwendiyên nerm û nerresmî⁽²³⁾. Dema Şerîf Paşa, rewşa welatê xwe, zordestiya Abdulhamîd

û vê rewşa Swêdê tîne ber çavan, dide pêşberî hev, bêguman dinya wî sedî sed serobino dibe, rastiyan çêtir dibîne. Di cîhekî de Şerîf Paşa dide diyar kirin ku mirovên Swêdî ji rexnekirina tiştên xwe re gelek vekirîne⁽²⁴⁾.

Şerîf Paşa car caran li ser Swêdê rexnên xwe jî gotine. Şerîf Paşa ji ber xwendina hin lîteratura nebaş, ihtîmal e ku karakterê netewî yê Swêdê di pêşerojê de bê guhartin⁽²⁵⁾. Angorî Şerîf Paşa, dema ew

çûye herêma
Skâne, li wir
rastî karektere-
kî netewî yê
paqij hatiye.
Nûçegîhanê
rojnama *Svens-
ka Dagbladet*
carekê ji Şerîf
Paşa dipirse:
"We, em Swêdî
gelek sar û resmî
nedîtine gelo?",
Şerîf Paşa wek
bersîv dibêje
ku, tiştê xemgî-
niyê ew e ku,
Swêdî dema ga-
zî mirovan di-
kin, bi nav û

nîşanan ve gazî dikin, tehrê gazîkirinê yê
Ewrûpî "Hûn" li bal wan tune ye⁽²⁶⁾.

JINA ŞERÎF PAŞA: EMÎNE XANIM

Çawa em ji çavkaniyê li Swêdî fêr dibin
Emîne Xanim jî qasî Şerîf Paşa populer
bûye, di gelek dokumentan de navê wê
derbas dibe. Çawa em ji raporên dîplo-
matîk fêr dibin, roja Şerîf Paşa hatiye
Stockholmê jina wî Emîne Xanim pê re
nehatiye, ew nexwaş bûye. Di nav rapo-
rên ku ji Îstenbilê hatine şandin, gelek cî-
han de derbas dibe ku, Emîne Xanim ge-
lek dewlemend e⁽²⁷⁾. Paşê çawa em fêr di-
bin ku ev dewlemediya Emîne Xanimê ji
mîrata bavê wê tê, li dorberê Çemê Nîlê
erdên fireh jê re mane.

CHÉRIF PASCHA.

Turkiets nye envoyé extraordinaire et ministre plénipo-
tentiaire vid svenska hofvet -- nagon sådan har där icke
visat sig, sedan prins Karadjia Pascha för många år sedan,
efter sitt giftermål med en dotter till grosshandlare L. O.
Smith, bosatte sig i Haag, där han också var ackrediterad —
hans excellens divisionsgeneralen *Chérif Pascha*, adjutant hos
sultanen, är son till den framstående turkiske statsmannen
Said Pascha, som i femton år var utrikesminister och som
för närvarande är president i statskonsejen, med rätt att del-
taga i öfverläggningarna i ministerrådet, till hvars högst
värderade och mest uppmärksamade medlemmar han räknas.

General Chérif Pascha, som genomgånit krigsakademien i
Saint-Cyr, har erhållit en fullständigt fransk uppfostran och
är mycket bekant i Paris, där han länge uppehållit sig såsom
militärattaché vid turkiska beskickningen — såsom sådan har
han äfven fungerat i Bryssel. Han är gift med en prinsessa
med egyptiskt blod i sina adrar, en dotterdotter till Mehe-
met-Ali, och kan på grund deraf göra anspråk på att af den
nåvarande khediven, Abbas II, tituleras kusin.

Chérif Pascha är ännu endast trettioårig och gammal. Han
betraktas såsom en af de mest eleganta och distingerade offi-
cerarna med generalsepuletter inom det kejsarliga turkiska
kavalleriet, är en ifrig sportsman, skicklig jägare och en full-
ständig parisare i hela sitt uppträdande — egenskaper, hvilka,
alla helst som han dessutom är en persona grata hos sul-
tanen, torde vara tillfyllest för att i hans hemland för honom
öppna en ovanligt glänsande karriär. Därtill skall helt visst
den omständigheten äfven komma att bidraga, att Said Paschas
familj tillhör en af de äldsta och förmåligaste ättarna i
Kurdistan (Mesopotamien).

Nivîsek II ser Şerîf Paşa (Ny Illustrerad Tidning, No 33,
1898.)

Jina Şerîf Paşa,
emîne Xanim keça
Xalîm Paşa ye, Xa-
lîm Paşa jî kurê
Walîyê Misirê yê
navdar Mehmed
Alî Paşa ye. Emîne
Xanim di sala di
sala 1868'an de li
Misirê hatiye dinê
û li Istenbolê me-
zin bûye. Di sala
1890'an bi Şerîf Pa-
şa re dizewice.

Ji vê zewacê sê
zarokên wan çêdi-
bin. Ji wan ya me-
zin Şerîfe di sala
1893'an i Istenbolê
tê dinê, keçên ma-

yîn Saîde û Cesa li Swêd li Stockholmê
têne dinê, ji wan Saîde ji ber sedemên ku
em pê nizanin li Stockholmê wefat dibe.
Ev bûyera ji bo malbata Şerîf Paşa dibe
xemgînîke mezin. Dema Şerîf Paşa ji
Stockholmê bar kiriye, keça mezin Şerîfe
16, keça piçûk Cesa 6 salî bûye.

Emîne Xanim jineke zane, giran û xwe-
dî şahsiyeteke mezin bûye. Çawa em ji
çavkaniyan fêr dibin, wê zimanên Fransî,
Îngîlîzî û Swêdî hem nivîskî, hem jî devkî
zanibûye. Emîne Xanim dema Swêdê
maye, salên xwe bi xwendinê û bi me-
zinkirina zarokên xwe ve derbas kiriye.
Hobiya wê ya here mezin xwendin bûye.
Ji jiyîna sosyete zêde hez nekiriye. Angorî
rojnamevanekî Swêdî, ji du aliyên Emîne

Xanimê yên mezin yek bedewiya wê ye, yek jî ji jiyîna sosyetê dûrbûna wê ye⁽²⁸⁾. Dema hatiye Swêdê ji bo ku nekeve devê rojnamevanan gelek bi zanetî gavên xwe avîtiye. Lê belê paşê dema sal derbas dibin, çawa em dibînin Emîne Xanim êdî tevî çend çalakî û aktîvîteyan dibe, sûretên wê di rojnaman de tîn weşandin. Di sala 1908'an dema qralê Swêdê 50.saliya xwe tijî dike, Emîne Xanim û Şerîf Paşa bi hevra tevî şahiyên dibin, di rojnaman de ji bo Emîne Xanimê peyva "charmant" ya ku tê maneya bedew û muhteşem hatiye bi kar anîn⁽²⁹⁾. Nûçegîhanê rojnama *Dagens Nyheter* dema mala Şerîf Paşa ziyaret dike, di çîhekî de tê gotin ku Emîne Xanimê bi servekirî hatiye oda Şerîf Paşa û mêvanên xwe silav kiriye, xêrhatina wan xwestiye⁽³⁰⁾.

Emîne Xanim gelek hewl daye wekî zimanê Swêdî fêr bibe, di dawiyê de ev zimana hem nivîskî, hem devkî fêr bûye. Fanny Petersson bi salan ji Emîne Xanimê re mamostetiya zimanê Swêdî kiriye, di nivîseke xwe de gelek pesnê Emîne xanimê dide. Dema Şerîf Paşa ji Swêdê bar dike, Fanny Petersson bi navê *Emîne Xanim* nivîseke dirêj li ser Emîne Xanimê di rojnama *Svenska Dagbladet* de dinivîse. Fanny Petersson di vê nivîsa xwe de dide diyar kirin ku Emîne Xanim ji aliyê zîmîn de jêhatî bûye⁽³¹⁾.

Çawa me li jor jî got Emîne Xanimê ji xwendinê gelek hez kiriye. Bi raybetî nivîskara Swêdî ya navdar Fredrika Bremer yek ji wan nivîskaran bûye ku Emîne Xanimê gelek ecibandiye, romana wê ya bi

navdar *Hertha* bala Emîne Xanimê dikşîne.

Ji aliyê din Emîne Xanim keseke dilsoz û alîkarîhez bûye, gelek caran hewl daye ku xwestiye alîkariya belengazan, neçar û xizanan bike. Timê li dijî bindestiya jinan derketiye, ji ber vê yekê li Stockholmê di vî warî de dikeve nav lêkolîneke mezin. Ann-Margret Holmgren ya ku ji bo mafê jinan yê hîlbijartinê timê tekoşîn daye, ji bo Şerîfe Xanimê dibe rêbereke mezin, gelek di bin bandûra wê de dimîne⁽³²⁾.

Emîne Xanim dema ji Stockholmê diçe Parîsê jî, dest ji vê tekoşîna xwe ya li dijî bindestiya jinan bernade. Ji ber vê yekê jî, di sala 1919'an de pêşneyera bûyîna serokatiya *Komela Pêşketina Jinên Kurd* qebûl kiriye⁽³³⁾.

HEVDUDÎTINEKE ANTÎ-ABDULHAMÎD U STOCKHOLMÊ

Şerîf Paşa dema wek sefirê Osmanî yê Stockholmê tê tayîn kirin, wê demê Sultan Abdulhamîd II li ser text e û bi despotîzma xwe ve tê nasîn. Şerîf Paşa piştî ku tê Stockholmê, di tevgerên wî de hêdî-hêdî guhartinên mezin tîn xuyan. Dema Şerîf Paşa li Swêdê cîwar dibe, rewşa siyasî ya Swêdê û ya Împaratoriya Osmanî dide ber hev cudatîke mezin dibîne, ev realîta li ser wî bandûreke mezin dihêle. Ew rewşa xirab li Împaratoriya Osmanî Şerîf Paşa gelek diêşîne.

Di van salan çawa tê zanîn li gelek welatên Ewrûpî Cemiyeta Îttîhat û Terakkî li dijî Abdulhamîd muhalefeteke siyasî

dajo. Çawa em ji çavkaniyan fêr dibin, Şerîf Paşa jî tevî vê muhalefetê dibe û alîkariya Cemiyeta Îttîhat û Terakkiyê dike. Heta sala 1908'an ev Cemiyeta wek rêxistineke pêşverû û lîberal tê nasîn, lê belê piştî Meşrutiyetê (1908) siyaseteke kevnepêrest dajo, bi temamî diguhire. Angorî çavkaniyan dema Şerîf Paşa tê Stockholmê, salekê şunda pêwendiyên xwe bi



Mala Şerîf Paşa ya dawî (Linnégatan 5)

Cemiyeta Îttîhat û Terakkiyê re serrast dike. Yek ji avakarên vê Cemiyetê Îshak Sukutî di sala 1899'an ji Cenevrê Tunali Hîlmî re namekê dinivîse, di vê namê de îfadeyekê çîh girtiye "...*Me vê mehê jî, ji Kurd alîkarî girtî*". Angorî lêkolînerê Tirk - Yalçın Küçük, ev kesa Şerîf Paşa ye⁽³⁴⁾. Ji bo ku bala muhbîrên Abdulhamîd nekêşîne, îfada "*Kurd*" ji bo Şerîf Paşa hatiye bi kar anîn. Şerîf Paşa di gelek çavkaniyan de bu xwe "*Şerîf Paşayê Kurd*" tê bi nav kirin. Şerîf Paşa dema diçe Parîsê jî hemû hêzên muhalîf re alîkarî û piştgirtîke mezin nişan dide.

Lêkolînerê Swêdî Prof. T.J. Arne di xebateke xwe de dide kîvşê ku di van salan de temsîlkarekî Îttîhat û Terakkiyê jî bo pêwendiyên û agahdariyê, bi dizîka tê Swêdê⁽³⁵⁾. Lê belê ev lêkolînerê Swêdî navê vî temsîlkarê Îttîhat û Terakkiyê nade. Di çavkanîke mayîn de em fêr dibin ku ev kes, pêşengekî vê Cemiyetê - Ahmed Rıza Beg e⁽³⁶⁾. Lêkolînerê Tirk yê mayîn Tarık Zafer Tunaya jî dide kîvşê ku dema Şerîf Paşa li Stockholmê sefirê Osmanî bûye, alîkariya grupên Ahmed Rıza û Prens Sabahattin kiriye⁽³⁷⁾. Piştî îlankirina Meşrutiyetê em çawa dibînin, vê carê Ah-

med Riza Beg li dijî Şerîf Paşa cîh digre.

Dema Ahmed Riza Beg tê Stockholme ku ji bo ku Şerîf Paşa bibîne, ev hevdudîtina bala sekreterê Şerîf Paşa, Muhtar Begê dikşîne. Muhtar Beg, vê hevdudîtina li dijî Abdulhamîd îhbarî Îstenbolê dike, êdî hemû pêwendiyên Şerîf Paşa li gel Cemiyeta İttihat û Terakkiyê eşkere dibin.

Piştî ku ev bûyera tê zanîn, îdara Abdulhamîd girtina Ahmed Riza Begê ji Şerîf Paşa daxwaz dike. Lê belê Şerîf Paşa vê yekê qebûl nake û dijî vî biyarî derdikeve. Di dawiyê da bûyera Amed Riza Begê, pêwendiyên Şerîf Paşa û Abdulhamîd xirab dike. Angorî çavkaniyan piştî demekê Şerîf Paşa tayînî balyozxana Madridê dibê, lê belê Şerîf Paşa vî karê nûh jî qebûl nake, di dawiyê de îstîfa xwe dide. Bi vî tehrî Şerîf Paşa, bi van kirinên xwe ve Ahmed Riza Begê ji tehlukeke mezin xelas dike. Piştî îlankirina Meşrutiyetê, pir mixabin Ahmed Riza Begê van qencyên Şerîf Paşa wê bîr bike û wê dijî Şerîf Paşa derkeve, planên kuştina wî bi cîh bîne.

Piştî bihistina vê bûyerê, pêwendiyên Şerîf Paşa û Îstenbolê bi temamî xirab dibin. Ji ber vê bûyerê, dema bavê wî Seîd Paşa di sala 1907'an wefat dike, Şerîf Paşa nikare here tevî şîna bavê xwe bibe, jê re destûr nayê dayîn⁽³⁸⁾.

Çawa me li jor jî got, xirabiya here mezin li Stocholme Muhtar Begê (sekreterê wî yê yekemîn) li Şerîf Paşa kiriye. Şerîf Paşa dema diçe Parîsê, li wir bi navê *Meşrutiyet* rojnamekê derdixê, Şerîf Paşa di vê rojnamê de hemû xirabî û nepakiyên

Muhtar Begê yê ku li Stockholme ew îhbarî Abdulhamîd kiriye, radixe meydana⁽³⁹⁾. Angorî çend nivîsên ku di Meşrutiyetê de çapbûyî, Muhtar Beg ji gelek cîhan re deydar bûye, tu wext nefikiriye deynên xwe bide. Derheqa vê yekê de, di arşîvên Swêdî de jî em rastî belgeyan tînin⁽⁴⁰⁾. Di wan periyodên ku Şerîf Paşa, ne li karê xwe bûye, Muhtar Begê xwestiye bi navê Şerîf Paşa gelek tiştan bêgumrîk ji sînora derbas bike, bîne Swêdê, di dawiyê de berpirsiyarên dewletê jî vê yekê agahdar dibin⁽⁴¹⁾. Navê wî tevî gelek bedkariyan bûye, angorî Şerîf Paşa, dema Muhtar Beg sekreterê wî bûye, bi jinan re munasebetên wî yê nebaş hebûne, li Stockholme "*pêkanîna haremê*" ve hatiye gunekar kirin. Hemû rezaletên Muhtar Begê paşê di rojname *Aftonbladet* de, bi navê "*Di Camîa Dîplomatîk de Skandal*" yek bi yek hatine eşkere kirin⁽⁴²⁾.

"HEVALCÊWÎKÎ" ŞERÎF PAŞA:

GUSTAF NORING

Salên ku Şerîf Paşa li Stockholme maye, bi navê Gustav Noring Swêdiyek li dijî Îdara Abdulhamîd û despotîzma wî şerek angorî xwe îlan kiriye. Gustaf Noring (1861-1937), ne tenê li Swêdê, welatên mayîn yê Ewropayê jî geriyaye, li dijî Abdulhamîd dest bi propagandê mezin kiriye. Di dawiyê de derbasî ser dîne Îslam bûye û navê *Alî Nurî* li xwe kiriye⁽⁴³⁾.

Bi konferans, bi weşîna kovar û pirtûkan, bi metodên mayîn xwestiye ku hemû xirabî û zordestiyên Abdulhamîd der-

xe meydanê. Paşê haya hukmeta Osmanî ji van kirinên Gustaf Noring dibe, dadi-geheke Îstenbolê qasî 101 sal ceza dide wî.

Gustaf Noring, di sala 1903'an de li Stockholmê bi navê *Bi Karîkaturan Abdulhamîd* pirûkekê jî diweşîne. Di vê pir-tûkê de gelek karîkatur, helbest û nivîsên ku Abdulhamîd rexne dikin, çîh girtine. Di pirtûkê de helbesteke bi navê *Şikayet-nama Abdulhamîd* heye ku têda navên Şerîf Paşa û jina wî Emîne Xanim jî der-bas dibe. Çawa di vê helbestê de xuya di-be, Abdulhamîd ji ber gilî-gazîn û muha-lefeta gel, ji xwe re cîhektî revê digere, Şerîf Paşa û Emîne Xanim tê bîra wî, dix-waze here Stockholmê. Bi kurtî Gustaf Norîng bi vê helbestê ve qirfê xwe li Ab-dulhamîd dike, neçariya wî nîşan dide⁽⁴⁴⁾.

Hem jiyîn, hem jî kirin û metodên xe-bata Gustaf Noring û Şerîf Paşa ji gelek aliyan de dişibînin hev, mirov dikare van herdu şahsiyetan wek *hevalcêwîyan* jî bi-hesibîne. Herdu jî bi du prensesên Afrîkî re dizewicin, jinên herduyan jî bi proble-ma jinan ve mijûl dibin. Dema mirov ji-yyîna Şerîf Paşa ya Parîsê tîne ber çavan, di jiyîna herduyan de gelek tiştên hevbeş he-ne. Hem Gustaf Noring, hem jî Şerîf Pa-şa li dijî zordestiyê derketine, bi riya we-şanan û medyayê tekoşîn dane. Di dawî-yê de herdu jî suçdar hatine dîtîne, hik-metê cezayên mezin dane wan.

Tiştê ku di jiyîna van herdu kesan de diguhire ew e ku, piştî Meşrutiyetê (1908) Gustaf Noring diçe Tirkîyê, li wir cîwar dibe û ji Şerîf Paşa re jî riya surgunê tê xuyan, li dijî Cemiyeta Îttîhat û Terakki-

yê li Parîsê dest bi tekoşîneke nûh dike.

Şerîf Paşa dema diçe Parîsê tevî şer û dew dibe, wek Gustaf Noring bi serê xwe ala tekoşînê bilind dike. Serpêhatiya Şerîf Paşa gelek caran vî *Viking'î* tîne bîra mirovan, mimkun e Şerîf Paşa di bin bandûra zihniyeta tekoşerîya Gustaf No-ring de jî maye.

ŞERÎF PAŞA JI STOCKHOLMÊ BAR DI-KE - 1908

Angorî rojnameyên Swêdî, Şerîf Paşa ro-ja 6.8.1908'an bi merasîmekê xatirê xwe ji qralê Swêdê Gustav V dixwaze, bi resmî dest ji karê xwe yê balyoztiya Osmanî ber dide. Şerîf Paşa roja din ji bo çend karên xwe diçe Parîsê. Angorî agahdariyên roj-naman zar-zêçên Şerîf Paşa li Stockhol-mê dimînin. Şerîf Paşa ji bo van mehên xwe yê dawîn li Stockholmê, taxa Salts-jöbadenê villakê kirê dike, bi zarokên xwe li wir dijî. Piştî vegera Parîsê bi temamî ji Stockholmê bar dike. Şerîf Paşa berî ku ji Stockholmê here, di hevpeyvîneke xwe de dide diyar kirin ku heta karên mala wî li Parîsê bikeve rê, demekê wê li bajarê Çe-koslovakîyê, Karlovy Vary (Karlsbad) bi-mîme, çawa tê zanîn ev bajara bi avgerm-kên xwe ve navdar e, kesên wek Goete, Marx, Schiller jî ev cîha ji xwe re kirine qonax⁽⁴⁵⁾. Şerîf Paşa kesekî wusan bûye ku hertim li xweşiya (tenduristî) xwe mêze kiriye, bi taybetî xwestiye ku ji dorberên bi toz timê dût bimîne, ew villa li Saltsjö-badenê ji ber vî sedemê kirê kiriye.

Şerîf Paşa berî ku ji Stockholmê bar bi-ke, ji rojnamevanên Swêdî re daye diyar

kirin ku ji vir şunda armanca wî ya here mezin li Misirê bi teknîkên modern ve bikarîna erdên wî yên fireh e, mijûlbûna çandîntî ye⁽⁴⁶⁾, Lê belê Şerîf Paşa dema diçe Parîsê her tişt diguhire, hemû planên wî yên pêşerojê serobino dibin. Sala 1908'an li Tirkîyê textê Abdulhamîd hildîweşe, Meşrutîyeta II tê îlan kirin, bayê azadî û serbestîyê tê. Ev bahara jî kurt da-jo.

Vê carê jî Partiya Îttîhat û Terakkî li Tirkîyê zordestîke ku ji ya Abdulhamîd ne kêmtir pêk tîne, welat dikeve bin destê cuntakaran. Şerîf Paşa ku bi salan ji bo xatîrê pêşeroja welêt alîkariya vê Cemiyetê kiribû, ji nav refên wan dût dikeve, li Parîsê bi hevalên xwe ve tevayî li dijî Îttîhat û Terakkîyê tekoşîneke sert û hişk dest pê dike. Rojnameke bi navê *Meşrutîyeyet* derdixê û partîke siyasî saz dike. Ev muhalefeta Şerîf Paşa ji sala 1909 heta 1914'an bênavbîrî berdewam dike. Alîkar û fedaiyên Îttîhat û Terakkîyê jî vala namînin. Ji bo şahsiyet û xebata Şerîf reş bikin, ji dest wan çî hatiye kirine. Timê êrîşî Şerîf Paşa kirine. Vê carê ji bo ku Şerîf Paşa ji ortê rakin, di sala 1914'an di nav Parîsê de dixazin Şerîf Paşa bikujin. Ew qatîlê bi navê Alî Cevat her çiqas berdestîyê Şerîf Paşa, Hakkî Îsmail di kuje û şoforê wî yê Fransî birîndar dike jî, qatîl bi xwe ji aliyê zavayê Şerîf Paşa Salîh Beg de tê kuştin⁽⁴⁷⁾.

ŞERÎF PAŞA STOCKHOLMÊ TU WEXT JI BÎR NAKE

Şerîf Paşa dema mala xwe ji Stockholmê

bar dike, gelek ber xwe dikeve, xemgîn dibe. Di jiyîna Şerîf Paşa de tiştêki neguhîriye hebe jî, ew jî evîna wî ya Stockholmê ye, ji rojnamevanekî re vê evîna xwe waha eçkere dike: "*Ez heyranê welatê we û paytextê we yê delal im*"⁽⁴⁸⁾. Şerîf Paşa dema ji Stockholmê bar dike, diçe Parîsê timê vî bajarê xweşik bîr tîne. Di nivîs, name û kartvîzîtên xwe de hertim nîşana "*Sefîrê kevî yê Tirkîyê li Stockholmê*" (Ancien Ministre de Turquie a Stockholm) bi kar anînye. Bi kurtî ev salên Stockholmê ji bo wî dibin saline nebîrkîrî.

Di rojnamekê de Şerîf Paşa Stockholmê wek "*Paytextê cîhanê yê herî xweşik*" bi nav kiriye, dema hela hê ji Stockholmê bar nekiriye, ji rojnamevanekî re dîtînen xwe yên li ser Swêdê waha tîne zimîn: "*Him ez, him jî prensesa jina min li Stockholmê gelekî rehet kir û em li vir bûne xwedî pir dostan. Dema ez li Parîsê cîwar bûm, ezê dostanetiya xwe ya ku di nav hevalên min yên li Parîsê rûdinên û dijîn, berdewam bikim. Û ew divê qebûl bikin ku mala min ji wan re timê vekiriye*". Paşê angorî vî rojnamevanî Şerîf Paşa bi devêki ken gotînen xwe waha berdewam kiriyê: "*Dema li Misirê germê dest pê kir, ji bo hênîkayê belkî rojekê ez bême vira*"⁽⁴⁹⁾.

Piştî van gotinan em pê nizanin ku Şerîf Paşa hatiye an nehatiye Swêdê. Lê belê dema Şerîf Paşa li Parîsê tam cîwar dibe, em dibînin ku Swêdiyan dem dem be jî Şerîf Paşa bi ziyaret, bi name û bi nivîs bîr anîne. Di sala 1911'an de hunermenekî Swêdî, Ivan Agueli ji Şerîf Paşa re sê nameyan ji Stockholmê bi rê dike, ji bo

derxistina kovarekê alîkariyê ji Şerîf Paşa dixwaze⁽⁵⁰⁾. Dema 1914'an de hevalbendên Îttîhat û Terakkiyê hewl dan ku Şerîf Paşa li Parîsê bikujin, rojnamevanên Swêdî diçin Şerîf Paşa ziyaret dikin⁽⁵¹⁾.

Piştî ku Şerîf Paşa ji Swêdê diçe Parîsê jî, çawa em dibînin navê wî dîsa hin dokûment û nivîsan de derbas dibe. Çen raporên diplomatîk ku ji Istenbolê hatine şandin nîşan didin ku, diplomatên Swêdî, piştî ku Şerîf Paşa ji Swêdê bar dike jî rewşa wî teqîb kirine û kirine rapor⁽⁵²⁾. Di nivîseke ku di sala 1919'an de di rojnama *Svenska Dagbladet* de cîh girtiye, tê de hatiye nivîsîn ku Şerîf Paşa di nav sefirên Osmanî de yê herî navdar e, niha li Parîsê dimîne û mafên Kurdistanê temsîl dike⁽⁵³⁾. Şerîf Paşa, çawa tê zanîn berî Peymana Sewrê bi navê Kurdan tevî muzakeran dibe, di wan salan de li Tirkiyê dijî Şerîf Paşa muhalefeteke mezin dest pê dike, çend "telgrafên protestoyê yên sexte" ji hin bajarên Kurdistanê li ser adrêsa Balyoxana Swêdê ya Istenbolê hatine şandin. Çawa tê xuyan ev telgrafan ne bi destê Kurdan, bi destê hêzên resmî û bi zanetî! hatine şandin⁽⁵⁴⁾. Bi kurtî Şerîf Paşa piştî ku ji Swêdê diçe Parîsê jî dem dem navê wî û çalakiyên wî di çavkaniyên Swêdî de derbas dibe. ■

ÇAVKANÎ:

1) Från Stockholms Corps Diplomatique, Dagens Nyheter 31.5.1908

2) Beşek hejmarên rojnama *Meşrutiyet* ya ku Şerîf Paşa piştî vegera Stockholmê li Parîsê derxistiye, niha hin pirtûkxaneyên Stockholmê de tên parastin. Hejmarên ku di pirtûkxana *Kungliga Biblioteket* de hene: 11, 13, 15, 18,

19, 20, 24, 25, 26, 28, 33, 34, 35. Ji hejmara 36'an heta hejmara 54'an jî, li bajarê Uppsala di pirtûkxana *Carolina Rediviva* de hene. Pirtûkeke ku Şerîf Paşa li Parîsê weşandiye (*Quelques Reflexions sur la Guerre turco-Balkanique, Paris, 1913*), di nav pirtûkên Arşîva Şer (Krigs Arkivet) de ye. Çend name û wêneyên Şerîf Paşa jî, di hin beşên nama û wêneyan yên sazgehên Swêdî de tên parastin. Çawa em ji çavkaniyan fêr dibin, wêneyên Şerîf Paşa yê pêşin jî aliyê wêncêşa Qraliyetê, Selma Jacobsson de hatine kişandin (binêre: *Turkiske envøjen General Cherif Pascha*, Illustrerad Hvad Nytt 23.3.1899). Wêneyên Şerîf Paşa ne tenê di muza û pirtûkxanan de tên parastin, wusan jî gelek wêne û karîkaturên wî, di rojname û kovarên Swêdî de hatine weşandin.

3) *Högtydlig Audiens*, Dagens Nyheter 12.7.1898.

4) *Cherif Pascha*, Ny Illustrerad Tidning, No: 33/1898.

5) *Hos General Cherif Pascha - En intervju med den populäre diplomaten*, Stockholms Dagbladet 23.5.1908.

6) *Från Stockholms Corps Diplomatique*, Dagens Nyheter 31.5.1908.

7) *Maktombyte på turkiska legationen*, Svenska Dagbladet 22.5.1908.

8) *Turkiske envøjen General Cherif Pascha*, Illustrerad Hvad Nytt 23.3.1899.

9) *General Cherif Pascha*, Hemmet-Läsning för ung och gammal, No:10/1903.

10) Çend nameyên Şerîf Paşa di pirtûkxana netewî ya Swêdî *Kungliga Biblioteket*, Pirtûkxana Univerisita Uppsalayê ya bi navê *Carolina Rediviva* û Arşîva Dewletê (Riks Arkivet) li Stockholmê de tên parastin.

11) W. Unander, *På Farofyllda Uppdrag i Österled*, Lund. 1947, rûp.132.

12) *Medmänniskor LXX I - Cherif Pascha*, Strix 13.7.1899.

13) *Sultanen Ambassad i Stockholm*, Dagens Nyheter 24.5.1908. *Turkiska Diplomater i Sverige*, Hvar 8 Dag 36/1908.

14) W. Unander, *På Farofyllda Uppdrag i Österled*, rûp.36-37.

15) *På grund av fälttjensövningarna*, Skånska Dagbladet 1.9.1899.

16) *Kungabesöket i Laholm*, Skånska Dagbladet 5.9.1899.

17) W.M. Carlgren, "Informationsstycken" från Abdul Hamids senare regeringsår, *Historisk Tidskrift* 1/1952.

18) W. Unander, *På Farofyllda Uppdrag i Österled*, rûp.37.

19) Från Stockholms Corps Diplomatique, Dagens

Nyheter 31,5,1908.

20) Förteckning över Porträtt målade av Axel Jungstedt, Konst Biblioteket, Stockholm.

21) Turkiske envoyen general Cherif Pascha, Illustrerad Hvad Nytt 23.3.1899.

22) Hos General Cherif Pascha, Stockholms Dagbladet 23.5.1908.

23) Turkiska envöjen General Cherif Pascha, Illustrerad Hvad Nytt 23.3.1899.

24) Illustrerad Hvad Nytt 23.3.1899.

25) Hos General Cherif Pascha, Stockholms Dagbladet 23.5.1908.

26) Binére: Eyni çavkanı.

27) Riks Arkivet. Rapporter från beskickningen i Konstantinopel, Grupp 16-20, 1895-1922.

28) Turkiske ministern i Stockholm, Varia-Illustrerad månads Skrift, No:4/1899.

29) Konungen 50'års dags firande, Dagens Nyheter 17.6.1908

30) Från Stockholms Corps Diplomatique, Dagens Nyheter 31.5.1908.

31) Fanny Petersson, Prinsessan Emine, Svenska Dagbladet 31.5.1908

32) Binére: Eyni çavkanı.

33) Zeki Sanhan, Kurtuluş Savaşı Günlüğü I, Ankara 1993, rúp.373.

34) Yaşın Küçük, Aydın Üzerine Tezler III, Istenbol, 1985, rúp.220.

35) T.J. Arne, Svenskarna och Österlandet, Stockholm, 1952, rúp.355.

36) Mehmed Selahaddin Bey, İttihat ve Terakki'nin Kuruluşu ve Osmanlı Devleti'nin Yıkılışı Hakkında Bildiklerim, Istenbol, 1989, rúp.125.

37) Tank Zafer Tunaya, Türkiye'de Siyasal Partiler II, Istenbol, 1984, rúp.220.

38) Avliden turkisk statsman, Svenska Dagbladet 30.10.1907

39) Un representant de la Turquie en Grece, Meşrutiyet 28/1912. L'assainissement necessaire, Meşrutiyet 34/1912. Un digne representant du Comité, Meşrutiyet November/1913.

40) Riks Arkivet. UD:s Arkiv, 1902'års Dossiersystem, Turkiet, vol.999.

41) Binére: Eyni arşiv.

42) En skandal i diplomatiska kâren, Aftonbladet 2.4.1912

43) Gunnar Jarring, Gustaf Noring - Alias Ali Nouri och hans Turkiska Karl XII Forskningar, Karolinska Förbundets Årsbok 1976, rúp. 7-18. Bibliofilen Ali Nouris tankar på upprättandet av ett turkiskt nationalbib-

liotek, Svenska Forskningsinstitutet i Istanbul - Meddelanden 7/1981, rúp. 26-40. Ali Nouri - Alias Gustaf Noring, en Viking i frack, Studie Kamraten 3/1982, rúp. 9-11.

44) Ali Nouri, Abdul-Hamid i Karikatyr, Stockholm, 1903.

45) Hos General Cherif Pascha, Stockholms Dagbladet 23.5.1908.

46) Binére: Eyni çavkanı.

47) Komplotten mot Cherif Pascha, Stockholms Tidningen 16,1,1914. Mannen som ville döda Cherif Pascha, Stockholms Tidningen 19.1.1914.

48) Vaktombyte på turkiska legationen, Svenska Dagbladet 22.5.1908

49) Binére: Eyni çavkanı.

50) Axel Gauffin, Ivan Agueli - Människan, Mystikern, Mälaren, del II, Stockholm, 1941, rúp.181-186.

51) Turkiet inför sin undergång? Cherif Pascha om det ungturkiska "mördarpartiets" politik, Stockholms Tidningen 19.1.1914

52) Rapora pêşîn ya bi terîxa 28.2.1910'an behsa çalakîyên Şerîf Paşa yê li Parîsê dike. Binére: Rapporter från besickningen i Konstantinopel, Grupp I, 1910-1911. Rapporte mayî ya bi terîxa 16.11.1910 'an derheqa Şerîf Paşa de biryardayîna dadigeheke Osmanî pêşkêş dike. Binére: Riks Arkivet. UD:s Arkiv, 1902'års Dossiersystem, Turkiet vol.998.

53) Turkiets Stockholmslegation indrages, Svenska Dagbladet 17.9.1919

54) Riks Arkivet. Rapporter från beskickningen i Konstantinopel, Grupp:16-20, 1895-1922. Ew telgrafên "sexté" yê ku Peymana Şerîf Paşa û Boghos Nubar Paşa protesto dikin û ji Balyozxana Swêdê re hatine şandin, ji van bajarên Kurdistanê hatine kişandin: Dêrik, Beşîrî, Sîverek, Silvan, Maden û Lice. Di vê arşivê de him orjînalên van telgrafan, him jî wergera wan ya Frensi hene.

Pirtûka Rohat Alakom ya li ser Şerîf Paşa di nêzik de bi tirkî derdikeve. Dikare ji vê navnîşanê were xwestin:

Rohat Alakom
Pîlvingeg. 17
128 35 Skarpnäck
Stockholm-Sweden

Yilmaz Güney (1937-1984)

Yek bi yek, qor bi qor, ber bi gulistanê ve, ber bi baxê Îrem ve çûn; di dilên wan de, bêxofiya dijmin, a xeterên jiyane û hêviyên salan, di paşlên wan de hêz û tecrubeyên berhemdar, di destên wan de gul û sosinên rengîn, di gel hêviyên mirovanti û jiyaneke têr û tijî, hîmdarên hebûn û jiyana gelê me, mêrxasên aşti û azadiyê, ji nav me birr bi birr koç kirin. Bi hêz û bi hêvî bûn, bi sebir û aramî bûn; ji bo azadî û rizgariyê, di kolanên reş û tarî de, di rewşên zor û bi xeter de, bê tirs derbas bûbûn. Di zilûmatên giran de, ji nivşên nuh re şewq, hêvî û berxwedanê; û her wiha bêxofî û tekoşinê diyarî kirin. Nivşên nuh bi evîn û dilsoziya wan, bi bawerî û tekoşîna wan agirê hêvî û berxwedanê, di riyên zor û pergalên nûjen de dan domandin; ew ji xwe re, ji hebûn û keftelefa gelê xwe re mînakên giranbuha, di riya azadî û rizgariyê de, rêberên payebilind hesabandin. Gelê Kurd, lehengiya wan piştî aljiyabûna wan jî, di berxwedan û serhildanên nuh de da domandin; ew nedan jibîrkin.

Çaxê mirov çavekî bavêje dîroka tekoşîna rizgariya neteweyê Kurd, dê mirov gelek lehengên hêja û birûmet bibîr bîne. Bi taybetî di vê sedsala dawî de, gelê Kurd li hember koledarî û zordestiyê, ji bo rizgarî û azadiya xwe, car bi car serî hildaye û ji nav van serhildan û berxwedanan gelek lehengên birûmet derketine. Ev leheng, ji gelê Kurd re bûne rêber û baweriya berxwedan, serhildan û rizgariyê; di dîroka tekoşîna gel de bûne numûneyên payebilind.

Ger mirov bixwaze van lehengên ku ji hêla tevahiya Kurdan ve baş tînin nasîn bi nav bike, dê mirov ji Şêx Seîdê



Mihemed Dehsîwar

Pîran, serokê serhildana yekemîn a sedsala 20-an dest pê bike. Seyîd Riza, Elîşêr û Nûrî Dêrsimî, Îhsan Nûrî û Yado, Qadî Mihemed û Mistefa Barzanî jî vê rêza lehengên Kurdan didin berdewamkirin. Ji bilî van jî gelek lehengên hêja û bi hezaran lehengên bênav hene ku ne em navên wan hemûyan dizanin û ne jî cihê ku ji me re hatiye veqetandin, têrî binavkirina wan dike. Lê em dikarin wan bi giştî bi nav bikin û vê watiniya hêja bispêrin dîrokê û dîrokzaneyan.

Ew welatperwerên li serê çiyê, li kolan û zaboqan, li gund û bajaran, di girtîxaneyên dewleta barbar û koledar de, di rojname û kovaran de ji bo guhartina civatê, ji bo rizgarî û azadiyê tekoşinê didin, lehengên me ne. Şehîdên me yên çaralîyê Kurdistanê ku di riya serxwebûn û azadiya neteweyê Kurd de serî dane, lehengên me ne. Tevî her tade û zordariyan, heps, lêdan û îşkenceyan jî, nivîskar, rojnamevan û kedkarên rojnamegerî û edebiyata kurdî, di riya şerê rizgarî û azadiyê de tekoşina xwe berdewam dikin. Ew lehengên me ne. Penaberên Kurd ên ku ji ber herçar dewletên koledar û barbar, dev ji welatê xwe û axa xwe, dev ji dêûbav û pismamên xwe, dost û hevalên xwe berdane û li çaralîyê cîhanê belav bûne, di bin şertên zor û dijwar de, ji welatê xwe û ji gelê xwe bidûrketî dijîn; ew lehengên me ne. Hunermendên Kurd, çi yên li hundir û çi jî yên li derva dijîn, xizmetê ji çand û kultura kurdî re dikin; jiyana gelê Kurd bi awaz û instrumentên xwe didin berdewamkirin. Ew lehengên me ne. Dê û bavên me, xwişk û birayên me ku ji bo me gelek tade û eziyet kişandine; ji hesreta keç û lawên

xwe, xwişk û birayên xwe nexweş û perîşan bûne. Di tekoşina gel de, hiş û aqil, sebir û semax ji xwe re kirine rêber; ew lehengên me ne. Gundî û karkerên me, xwendevan û karmendên me, alim û zanayên me, bi tevahiy gelê Kurd lehengê herî mezin e. Em bi vê minasebetê wan tevan bi bîr tînin.

Îcar sedemên ku min Yilmaz Güney ji nav van lehengan jî neqand ev in: Ya pêşîn ew e ku ji destpêkê ta niha li ser wî û jiyana wî, bi taybetî jî li ser kurdîtî û tirkîtiya wî gelek nîqaş çêbûne. Nemaze piştî ku Yilmaz xwe bi her awayî amadeyî tekoşina rizgariya gelê Kurd kir, hem dewleta kolonyalist hem jî ronakbîr(?) û rojnamevanên Tirk, êrîşên mezin birin ser wî û ew tawanbar kirin. Dostên wî yên çep ku heta niha li dora wî bûn, pê dipesin û bi hebûna wî nan dixwarin, li cem dewleta xwe cîh girtin û bûn dijminên wî. Di gotar û nivîsên xwe de, bextireştî û derewên bêesil xistin stûyê wî. Demokrat(?) û sosyalîstên Tirk, ew aforoz kirin. Êdî Yilmaz ne bi tenê di filîman de, lê di jiyana xwe de jî Kurd bû û eşkere daxwaza serxwebûna Kurdistanê dikir; "bölücü" bû! Dewleta Tirk bi hemû hêzên xwe ve, bi ronakbîr û nivîskarên xwe yên nijadperest ve, berê xwe da Yilmaz Güney.

Li ser van êrîşên dewletê û qelemşorên wê, tevgera Kurd çi kir? Li cem Yilmaz çiqas cîh girt? Di vî warî de wezîfeya xwe pêk anî yan na? Bersîva nijadperestên Tirk da yan na? Ev pirs hewcedarî nîqaşê ne û hêvî dikim ku rojek berî rojekê di vê babetê de nîqaşên berhemdar bêtin kirin.

Sedemê duyem jî ew bû ku li ser lehengên Kurd, kê-m-zêde nivîs û berhem hatine



Yilmaz Guney

amadekirin û di vî warî de tunebûna nivîsarên li ser jiyana Yilmaz, ên li ser bîr û baweriyên wî, kêmasiyeke mezin bû. Ji xwe bi kurdî hima bêje qet tiştek tune û bi tirkî jî bi çavên Kurdan li ser Yilmaz gelek kêmbahem hatine amadekirin. Eşkere ye ku ev kêmasiyeke mezin e û divê rojek berî rojekê ev valahî bê dagirtin.

Sedemê dawîn jî, jiyana Yilmaz Güney ji

min re pirr balkêş bû û hêjayî nivîsandinê dihat. Ew ne tenê leystikvanekî sînemayê bû, lê şair, çîrokvan, edebiyatvan, filîmçêker, siyasetvan û Kurdekî mirovperwer bû. Mirovekî pirr jîr û çeknas, berhemdar û bi tolerans, dostê dostê xwe, dijminê zordestî û sitemkariyê bû. Ji ber dîtîna û baweriyên xwe, ji ber berhem û xebata xwe, ji siya yekê jiyana xwe di zîndanên dewleta

barbar de, li nefiyê û penabertiyê derbas kir. Dewleta Tirk, jê pirr bi tirs bû, ji bo her nivîs û piraniya berhemên wî, mahkemeyên nuh li dar xist û ew dişand girtîxaneyan. Lewra jî min tekoşîn û berxwedana wî, berhemên wî û jiyana wî hêjayî bibîranînê dît.

Meriv dikare bi rihetî bibêje ku Yilmaz, *Robin Hood* hemdema me ye. Ew ji hêla gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn ve, baş tê naskirin û gelê me ji vî lehengê xwe yî dîrokî gelek hez dike. Pirraniya filmên wî, ji dîrok û jiyana neteweyê Kurd hatine amadekirin. Gelê Kurd di filmên wî de, belengazî û xizaniya xwe, bindestî û perîşaniya xwe didît. Gelê me her wiha bi van berhemên qehremanî û mêrxasî, li hember zordestî û koledariyê, berxwedan û serhildanê jî didît. Yilmaz bi "*Koçero*" û "*Dawido*", ne tenê li hember xwînmij û zordarên herêmî, her wiha li hember leşkerê dagirker jî hêvî û baweriyeke xurt dida gel. Bi "*Seyidxan*" û "*Lawê Kozan*" re, mohra xwe hem li dîroka sînemayê dixist û hem jî mesajên hêja dida gelê xwe.

Bi "*Hêvî*" re ne tenê perçeyek ji jiyana malbata xwe, lê jiyana bi milyonan Kurdên belengaz jî dianî rojevê. Ev film ne tenê li welêt, lê li çaraliyê cihanê jî bû bûyereke mezin, di jiyana û berhemên wî de çerxeke nuh vekir. Yilmaz tevî qedexekirin û pêşîlgirtina dewletê jî, li çaraliyê cihanê hat nasîn û gelek xelatên navneteweyî girt. "*Hêvî*", bi mehan li sînemayên Ewrûpayê, bi awayê "non-stop" hate temaşekirin û di nav deh filmên herî baş de, kete dora yekemîn.

"*Kerî*" (Şivan û Bêrivan), jiyana belenga-

zên Kurd, dijminatî û neyartiya nav eşîretên Kurd ku hê îro jî pirr aktuel e, dianî ber çavan. Ev film jî bi gelek xelatên giranbiha taceser bû û hostatiya Yilmaz îspat kir. "Heval" ne tenê rewşa Kurdan, lê rewşa gelê Tirk î belengaz jî dianî ber çavan; rewşa hevaltî, dostanî û durûtiya maldarên xwennas û tekoşîna li hember wan dianî ziman. "*Şik*" (Endîşe), rewşa Kurdên penaber li "Çukurova"yê, şerpezetî û belengaziya wan, tade û kevneperestiya hinek fikrên herêmî dianî ber çavan. Di amadekirina vî filmî de Yilmaz bi tiliya dewletê, hate komploya hakimekî faşîst û kete girtîxaneyê.

Di girtîxaneyê de, haziriya filmê "*Rê*" ku dê ev film di jiyana wî de guhartineke gelek mezin bikira, kir. Ev film, piştî ku li *Cannes*ê xelata yekemîn girt, navê Yilmaz li çaraliyê cihanê kete nav filmçêkerên herî bi nav û deng. Di vî filmî de jiyana girtiyên Kurd, reva wan a ji hepsê û bi çend rewşên cuda, jiyana gelê Kurd dihate ber çavan.

Dil dixwest ku Yilmaz berî filmê "*Dîwar*", filmê xwe yî herî giring ku wî bi xwe jî "projeya xwe yî herî giring" bi nav dikir, filmê dîroka Kurdistanê pêk biana. Helbet filmê "*Dîwar*" jî ne kêr û hindik bû û jiyana zarokên girtîxaneyê zarokan dianî ziman û giring bû. Lê belê ne film ji teref Ewrûpiyan ve hat famkirin û hat girtin, ne jî Yilmaz berî alîjyanbûna xwe, ji bo Kurdan ev berhema dîrokî pêk anî.

Weke ku tê zanîn, projeyeke Yilmaz li ser dîrok û perçebûn, jiyana û berxwedana gelê Kurd hebû û ji bo vî filmî haziriyên xwe dikir. Lê çî hefz û mixabin, jiyana wî têr

nekir û ew di temenekî gelek ciwan de, ji nav me qetiya.

Her wekî ku dê xwendevan di jêr de jî lê bifarqilin, jiyana Yilmaz bi xwe ya belengazî û xizaniyê, û her wiha ya berxwedan û serhildanê bû. Her çiqas wî perçeyên ji jiyana xwe, di gelek filîm û nivîsarên xwe de anîbe ziman jî, ne filîm û ne jî pirtûkên mezin têrî danasîna jiyana wî nakin. Lê em dê dîsa hewil bidin ku bi kurtayî, bi qasî ku çihê ji me re hatiye veqetandin, li ser jiyana wî û berhemên wî bisekin.

Yilmaz 11 sal berê di 9-ê Îlonê, sala 1984-an de li xerîbiyê, bi evîn û hesreta rizgariya welêt, li Parîsê ji nav me qetiya; alîjîyan bû. Bi munasebeta cenazeyê wî, bi dehhezaran Kurdên welatperwer û cure cure mirov ji gelên din beşdarî meşa cenazeyê wî bûn û xemgîniya xwe diyar kirin. Bi milyonan Kurd û mirovperwerên ji gelên din, bi alîjîyanbûna wî, li çokên xwe xistin û ketin xemgîniya Yilmazê mirovperwer. Niha 11 sal di ser alîjîyanbûna wî de derbas bûye; lê ew hîn jî zindî ye, di dilê gelê xwe de û dilê me de dijî.

Ger mirov 47 salên jiyana wî, ji bilî 11 salên girtîxaneyan û du salên eskeriyê bîne ber çav, mirov dikare jiyana Yilmaz, bi sê beşan ji hev veqetîne. Beşa yekem, zarokî û xortaniya wî ye ku dê ev li ser dîtî û baweriyên wî tesîreke mezin bike. Yilmaz ji malbateke belengaz û gelek xizan tê. Rewşa malbata wî, birçîbûn û bêîmkaniyên jiyaneke xweş, rewşa bi milyonan gundiyên feqîr û belengaz û nakokiyên civakî, hîn di zarokiya wî de, wî bi her awayî dixwe bin tesîra xwe. Ew hê di xortaniya xwe de hem tade û pîkolîyên li ser gundî û belengazan

dibîne û hem jî zordestiya li ser gelê Kurd ferq dike. Bi gotinên wî, ew di nav gundên tirkî de “du caran reşîk bûn; “reşîk bûn ji ber ku feqîr û belengaz bûn, cara duyem “reşîk “ bûn, ji ber ku Kurd bûn.”

Beşa duyem, destpêka nivîskarî û di gel wê jî destpêka hunermendiya wî ya sînemayê bû. Bê şik ev beş jî bi çend periyodan ji hev cuda ne. Weke numûne, destpêka filîmên şer û lêdanê ji bo ku ew xwe di nav “dewên” sînemaya Tirk de bide qebûlkirin; beşeke bi serê xwe ye. Wê heyamê di nav “dewên” sînemaya Tirk de xwe pêşkêşkirin îspatkirin, pîrsa herî giring bû û Yilmaz bi tenê bi îmkaniyên xwe û bi alîkariya çend dostên xwe, di sînemaya Tirk de got; “ez jî heme!”

Beşa sêyem, ji filîmê “*Hêvî*” dest pê dike û ev beş jî di nav xwe de bi çend periyodan ji hev diqete. Weke ku tê zanîn, piştî vî filîmî Yilmaz ne tenê li seranserê Turkiyeyê û Kurdistanê, lê li Ewrûpayê û çaraliyên cîhanê hat naskirin û ne tenê weke leystikvan, lê weke senarîst û rejîsor jî di nav yê herî bilind û naskirî de cîh veda. Her wiha Yilmaz di vê demê de piraniya filîmên xwe li ser civaka Kurd, zordariyên herêmî û yê dewleta Tirk amade kir û bi filîm û berhemên xwe, pîrsên mezin xiste serê gelên bindest.

Ev beş e ku Yilmaz filîmê “*Kerî*”, “*Êş*”, “*Lawje*”, “*Yên Bêhêvî*”, “*Heval*”, “*Bav*”, “*Endîye*” û cûrbecûr filîmên jiyana civakî ya Kurdan li pey hev pêk anî û sînemaya Tirk bi her awayî xiste bin hukim û tesîra xwe. Ev beş e ku dewleta kolonyalîst bi her awayî êrîşên mezin tîne ser Yilmaz û dixwaze wî bêtesîr û bêhukim bike, ji civaka wî û

gelê Kurd dûr bixîne. Lewra jî bi komplo-yan û bi "sûcên" komunizm û "bölücü"tiyê, ew dixin zîndanên tarî û berhemên wî qedexê dikin.

Lê Yılmaz di girtîxaneyan de jî vala nasekine, hetta ew di wir de xwe bêtir amadeyî berhem û filîmên nuh dike û berhemên çêtir hazir dike. Di zîndanên de, xwe ne tenê ji bo filîman diwestîne; lê her wiha çîrok, şîir û romanên jî dinivîsîne. Pirtûkên wî "Salpa", "Sanik", "Hücrem" û nivîsên wî yên bi navê "Selimiye Mektupları" û "Ogluma Hikayeler" di hepsê de amade bûne.

Wekî din jî sê projeyên mezin û giring hebûn di serê wî de. Projeya pêşîn rewşa girtiyên Kurd ên zîndanên û reva wan a ji girtîxaneyê bû. Ya din jî filîmekî li ser girtîxaneyên zarokan, tade û îşkenceyên ku li wan dihatin kirin bû. Ev herdu proje bi filîmên "Rê" û "Dîwar" hatin amade kirin. Ji xwe Yılmaz hê di hepsê de bû haziriya filîmê "Rê" kiribû û weke ku tê zanîn, ev filîm li Frensayê di festîvala Cannesê de xelata yekemîn girt. Lê projeya wî ya ku wî ew herî giring qebûl dikir, çênebû; nexweşiya wî dest nedayê û temenê wî têr nekir. Weke ku min di jor de jî diyar kir, ev proje dê rewşa Kurdên bindest, rewşa kolonyalîzmê û dîroka neteweyê Kurd bianîna ber çavan. Çi bêjim, felek weke careke din ji caran xayîn û bêbext derket; ew hîn di temenê xwe yî herî xweş û berhemdar de, ji nav me qetand.

Berî ku ez dest bi danasîna jiyana wî bikim, dixwazim li ser tiştekî Yılmaz ku bi ya min negatîf bû, bisekinim. Divê meriv qebûl bike û bibijê ku Yılmaz, bi salan ji aşê xelkê re av kişand, ne ji gelê xwe re. Eger bi

tevayî nîn be jî, di destpêkê de giraniya wî û dîtînen wî li hêla çepê tirkan bû.

Ev dibe ku ji dîtînen wî yê înternasyonalîzmê dihat, dibe ku ji der-dora wî ku giraniya wan çepîtiyê dikirin, dihat. Her wiha dibe ku ew jî weke piraniya şoreşgerên Kurd ku bi salan di nav hêzên çep ên Tirk de xîzmetê kirin û hîn jî gelek ji wan van karên xwe berdewam dikin, "mode" be. Lê divê meriv tiştekî din jî bibêje û qebûl bike ku Tevgera Kurd, Yılmaz Güney bi tenê hişt, xwe nêzî wî û xebata wî nekir û jê dûr ma û ew ji bîr kir. Bi taybetî jî hêzên "pro-Sovyet", ew bi "Maoyî"tiyê tawanbar kirin û ji ber dîtînen xwe yê hişk, di gelek cîhan de dijminatîya wî kirin.

Bêşik dibe ku vê yekê jî tesîrê li nêzîkbûyîna wî ya çepê Tirkan kiribe. Lê Yılmaz jî weke bi hezaran Kurdên wê demê, bi TÎP-ê (Partiya Karkerên Tirkiyeyê) re kar dikir û piştî ku ev Partî ji hev bela bû, wek rêxistinî nebû endamê tu rêxistinê. Piştî vê, navê wî ji ber alîkariya wî, ku piraniya Kurdan li dijî dewleta Tirk piştgiriya wan dikirin, bi Denîz Gezmîş û Mahîr Çayan re derket û Yılmaz jî li ser wan hat girtin.

Yılmaz jî weke gelek Kurdan di dawîya temenê xwe de, bi dîtînen xwe, nivîskarî û hunermendiya xwe û bi her awayî bû şoreşgerê Kurd. Ji bo kultur û çand, azadî û rizgariya neteweyê Kurd dest bi xebatê kir. Ji bo yekîtiya Kurdan hewil da. Lê çî mixabin jiyana wî ya weke şoreşgerê xwerû Kurd, demeke kurt ajot.

Malbata Wî

Diya wî Gulê, ji eşîreta Cibran, ji gundê Darebiyê bû. Ew bi xwe jî ji malbata Xalid

Begê Cibran bû. Darebî, gundekî Vartoyê ku dikeve nav çiyayên Bîngolê û deşta Şerfedînê. Di Şerê cîhanê yê Yekemîn de, Dewleta Osmaniyan li nik Elmanyayê cîh girtibû û bi Rusya re ketibû şer. Leşkerê Rus di destpêka 1916-an de kete Kurdistanê û tevaya Serhedê zefî kir û ta Kevirê Gavan, nêzî Bîngolê meşiya. Li hember van êrîşên leşkerê Rus, bi sedhezaran Kurdên belengaz dev ji ax û gundên xwe berdan û li çaraliyên Kurdistanê û Turkiyeyê bela bûn. Gundiyên Darebiyê jî mîna bi hezaran Kurdên din ji cîh û warên xwe terkeser bûn û piştî rêveçûna bi rojan, xwe avêtin himêza Diyabekirê. Lê Diyabekir jî, ji macirên Kurd tije bûbû û li wirê cîh nema bû. Gundiyên Darebiyê li wirê namînin û berê xwe didin Sêweregê û gundên wê. Yên ku cîh peyda dikin, li wan deran bicîh dibin, ên din jî ber bi Anatoliyayê berdewam dikin.

Diya Yilmaz, Gulê, li wir mezin dibe û bi mêrê xwe yê pêşî, Koço re dizewice. Bi serhildana Şêx Seîd re, kurê wê Mihemed tê dinyayê. Piştî wî lawekî wan î din ji çêdibe. Jiyana wan, jiyaneke xizantî û belegaziye ye; piştî sala xelayê, 1935-an ji ber birçîbûn û perîşaniyê dev ji gundê xwe berdidin û dîsa macir dibin. Ew bi meş xwe digihijînin Edeneyê û li gundê Yenîceyê bicîh dibin. Li vî gundî li ber destê axa dest bi kar dikin. Şertên zor, birçîtî û perîşantî, mêr û jinê ji hev dûr dixê; ew piştî demekê ji hev diqetin. Koço zarokên xwe hiltîne û vedigere gundê xwe.

Piştî ku mêrê wê vedigere gundê xwe, Gulê zilamekî bi navê Hemîd Putun dinase û ew bi hev re dizewicin. Hemîd bi xwe

jî ji Sêweregê ye û pismamê Koço ye. Gundê Hemîd, Desman û yê Koço Nigît, cînarên hev bûn. Zarokê Hemîd û Gulê yê pêşîn, di 1-Nîsanê, di sala 1937-an de tê dinyayê. Navê wî Yilmaz datînin. Yilmaz di nav şertên pîrr zor û xizan de, lê bi stran û destanên kurdî mezin dibe. Diya wî Gulê, ger wextê wê hebûna, serê Yilmaz datanî ser çoka xwe û bi dengê xwe yî zûz û xweş, jê re destanên *Mem û Zîn*, *Siyabend û Xecê*, *Zembîlfiroş* distita yan jî helbest û metelokên kurdî, çîrok û destanên mîna *Rostemê Zal* û *Mîrze Mihemed* digot.

Tevî xizantî û belengaziya xwe jî, dixwest kurê xwe bide xwendin da ku ev rezîltiya ku wan kişandibûn û hîn jî dikişandin, neyê serê wî; ji vê belengazî û şerpezetiyê rizgar bibe. Gulê ji malbateke esîlzade dihat, rewş û dîroka gelê Kurd, belengazî û bindestiya Kurdan baş dizanîbû. Pîrr jîr bû û hay ji wêjeya kurdî a klasîk hebû. Li gorî ku tê gotin û her wiha meriv di fîlm û berhemen wî de jî dibîne, tesîra çîrok, destan û gotinên diya wî, li ser Yilmaz tesîreke pîrr mezin kiriye û lewra jî Yilmaz van destan û çîrokên kurdî weke perçe-perçe, di gelek fîlmên xwe de pêşkêşî temaşevanan kiriye. Hetta Yilmaz di dema eskeriya xwe de jî li Mûşê li ser vî awayî lêkolînek kiribû û gelek destan, çîrok û metelokên Kurdî dabû berhev kiribû.

Bavê Yilmaz Hemîd, piştî ku bavê wî ji teref neyarê wan ve tê kuştin û diya wî ji mecbûrî bi kurapê wî re dizewice, li mal namîne û diçe cem bapîra xwe. Piştî ku ew jî dimire, diçe cem meta xwe û piştî mirina wê jî tenê dimîne. Tevî tenêbûn û birçîbûnê jî naçe ba diya xwe û zirbavê xwe. Ji bi-

rçîbûnê, rojekê dikeve diziya malekê û ji teref xwediyê malê ve tê girtin. Ne ji ber lêdanê, lê ji ber şerm û fediyê, 12 salî dev ji gundê xwe Desmanê berdide û bê ser û ber, dest bi meşê dike. Piştî gera nêzî mehekê, digîje Edeneyê û li kar digere. Li gundê Yenîceyê karekî şivantiya berxan dibîne û hima dest bi kar dike.

Hemîd li der-dora xwe mêrekî çê dihat qebûlkirin û xwediyê sozê xwe bû. Bê tirs bû û ji çekan jî gelek hez dikir. Tucarî bê çek nedigeriya; lewra jî jê re "Felek Hemîd" dihat gotin. "Felek" Hemîd mêr û camêr bû; lê ne axa wî ne jî mala wî hebû. Qet jî çênebû, timî xulamê ber destê axê yan jî çawîşê ser karkerên pembû bû. Qet pere yan jî mal ne kete destên wan; mîna bi hezaran xulamên, nano-ziko dixulîn. Lê tevî wê jî, kurê xwe Yilmaz da xwendin. "Em nebûn mirov, bira ew bibe" digot.

Zarokiya Yilmaz

Yilmaz di 1-ê Nîsana 1937-an de, li gundê Yenîceyê, di odeyê kevnê-axur de hat dinyayê. Dêûbavên wî jî, mîna bi sedan xulamên Mehmet Yalçın axa xizan bûn û bi nano-ziko kar dikirin. Ji bo zikên xwe ti-je bikin, pêwîst bû ku 15-20 seetan ji axê re kar bikirina. Dema pembû, pembû didan hev; piştî erd rakirinê jî tov datanîn û demên din jî li ber mala axê xulamî dikirin.

Yilmaz di vê birçîbûn û belengaziyê de, hêdî-hêdî, kê-m-şîr û kê-m-xwarin mezin dibê. Pirraniya zarokiya wî, li ber tava germ û birçî derbas dibê. Dêûbavên wî, ji tov kirin û eşfê, ji danehev û xîzmetê, pê re nedigî-hîştin ku li kurê xwe miqate bibin û wî bi dilê xwe xweyîkin. Li malê jî ne xwarin û

ne jî pêxwarin hebû ku bixwin da ku şîrê dê çêbe û ew jî bide Yilmazê piçûk.

Yilmaz di van şertên zor û giran de, roj bi roj mezin dibê û bejin diavêje. Çaxê du saliya xwe diqedîne, jê re xwişkê çêdibe; navê wê Leyla datînin. Yilmaz û xwişka xwe Leyla, di zarokiya xwe de pîr alîkariya hev dikin û ji hev gelek hez dikin; dibin hemderdên hev. Ev hezkirin û hemderdî, ta mirina Yilmaz jî berdeham dike.

Yilmaz hîn di pênc-şêş saliya xwe de dest bi kar dike, berxikên axê xweyî dike û bi vî teherî alîkariya malbata xwe dike. Ew hîn di vê demê de ferqa nav axa û xulam, bîndestî û xizaniya gundî û karkeran, serdestî û zengîniya axa û xwedîmilkan dibîne. Zarokên maldaran, şîr û şekir her tim li ber destan, destên xwe ne dixistin ava sar. Lê zarokên gundî û xulamên bêyî şîva şevan, tazî û bi nanê heşk mezin dibûn. Ev rewşa newekheviyê di zarokiya wî de, li ser Yilmaz tesîreke mezin dike.

Yilmaz zarokê bejindirêjî zirav û esmer bû, pîr livok û gelek jîr bû. Hê di zarokiya xwe de xwedî biryar bû; pîr bi gurûr bû û neheqiyê tehemul nedikir. Xortekî bi hurmet û bi merhamet bû, dilê kesî ne dihişt û mirovperwer bû. Lê ji tu kesî re jî, bi rihetî stûxwarî nedikir û pîr bi rik bû. Tevî vê jî ji alîkariyê hez dikir, û li hember neheqiyê şer dikir. Çaxê axa û maldaran neheqiyên li xulam û karkeran dikirin, berê xwe bêtirs dida wan û ew rexne dikir. Lewma jî herkesî jê hez dikir û rûmeta wî digirt. Hetta ev mêrxasiya wî ji hêla axê ve jî dihat teq-dîrkin û lewra jî navê wî danîbûn "Dîkê Yenîce"yê.

Bavê wî, ew heft salî şiyand dibistanê. Ji

ber ku li gundê wan dibistan tune bû, ew ji mecbûrî çû gundê "Kadiköy" ê ku ji gundê wan 12 km dûr bû. Li vî gundî dibistaneke sê salî hatibû vekirin û ji gelek gundên hawîrdor zarokên maldaran dihatin û li wir dixwendin. Axayê wî nedixwest ku Hemîd kurê xwe bide xwendin. Dê kurê xulamekî çî bikira ji xwendinê? Cîhê wî li cem bavê wî û li ber pez û berxikan bû. Ji xwe ne pereyên wî hebû ku kurê xwe bide xwendin û ne jî rewşa wan dest dida. Lê Hemîd jî xwedî biryar bû û ji ya xwe nehat xwarê; dê kurê wî bixwenda. Wî dizanibû bê Yilmaz çiqas jîr bû û lewra jî pêwîst bû ku ew bixwîne.

Yilmaz sê salan li ser hev di berf û seqemê de, di wê tava tûj û germ de, bê westan, her roj çar seet çû dibistanê û vegeya. Ji bilî riya dûr û xwendina dibistanê jî li gund kar dikir. Di havînên xwe de jî li ber pezê axê şivanî dikir. Lê axayê gund ji xwendina wî gelek aciz û nerihet bû. Çawa çêdibû ev Kurdê ber destê wî, feqîrekî bi pênc pere, kurê xwe dişand dibistana lawê axê. Lê Hemîd Putun kurê xwe tevî nerazîbûna axê jî şiyand dibistanê. Bira birçî û tazî bimana, lê bira Yilmazê wî bixwenda; bibûya mirov!

Di van salên xwendina Yilmaz de, bavê wî jineke ciwan tîne ser diya wî. Diya wî Gulê pirr aciz dibe, dev ji mêrê xwe ber di-de û diçe Edeneyê, li cem kurapê xwe bicîh dibe. Piştî ku Yilmaz sê salan dixwîne, bavê wî wî dişîne Edeneyê cem diya wî ku xwendina xwe berdewam bike. Yilmaz li vir hem dixwîne û hem jî kar dike. Pereyên ku diya wî ji cilûştinê û ji karên piçûk digire, têra wan nake û bavê wî jî nikare du malan xweyî bike.

Ji jina Hemîd Çawîş a nuh pênc zarok tînin dinyayê, lê herduyên pêşîn zû dimirin. Tevî ku jina wî ya nuh Sebîha ciwan û sipêhî bû jî, Hemîd weke ku ji Yilmazê lawê Gulê hez dike, ji tu zarokên xwe yê din hez nake. Yilmaz, evîn û gurûra wî, hesret û hebûna wî bû. Lê piştî bav jin anîbû ser diya wî, mal ji Yilmaz re bûbû dojedê. Her roj şer, her roj qirên û xeyd, jê re tu hizûr nehiştibû. Yilmaz van salên xwe, di jiyana xwe de rojên herî zor qebûl dike.

Yilmaz bi destpêka dibistana navîn, sînemayê dinase. Li Edeneyê cara yekem bi 25 qurûşan dikeve sînemayeke feqîran û filîmekî bi şer û qirên temaşe dike. Yilmazê piçûk bi temaşekirina vî filîmî dikeve bin tesîra sînemayê û ji wê rojê û vir ve, ji ber sînemayê naçe. Her çiqas pereyên wî tunebûn ku here hundirê sînemayê jî, timî li afîşên filîman mêze dike û difikire ka wê çawa here hundir û filîman bibîne.

Xortaniya Wî

Di destpêka salên 1950-î de, Yilmaz êdî xort tê hesabê. Li dibistanê dersên wî pirr baş diçûn û di van salên dibistanê de gelek pirtûkên têkel dixwend. Ev xwendina wî, ew ber bi edebiyatê ve hêl dike û ji roman û şîran re întereseyeke wî yî kûr dest pê dike. Hê di vê demê de *Tolstoy*, *Çehov*, *Dostoyevskî* û *Gogol* dixwîne û hêdî hêdî dest bi nivîsandina meqale û şîran dike; li ser edebiyatê bi hevalên xwe re dikeve nîqaşê.

Lê ji hêla din ve jî sînema di serê wî de şîn dibe, dikeve xwîna wî. Yilmaz di salên xwe yî xortaniyê de li ber sînemayê reklamvanê filîman ku di nav bajêr de reklama filîman dikir, dinase û dû re dikeve dewsa

wî. 14 salî dest bi makînîstiyê dike û her wiha çî karê vala jî hebe, dest diavêjê. Bi destpêka lîseyê re, li Edeneyê li ser hesabê "And Film" kar dike û pişt re derbasî "Şirketa Kemal Film" dibe.

Yılmaz di sînemayê de kar dikir û jiyana xwe bi vî awayî qezenc dikir, lê dilê wî hê jî li ser edebiyatê bû. Her wiha der-dora wî û hevalên wî jî bi giranî dilsozên edebiyatê bûn. Dilsoziya wan a edebiyatê, ew teşwîqî derxistina kovareke edebî kir. Li ser vê, bi alîkariya midûrê sînemayê jî wî û çend hevalên xwe dest bi weşana kovareke edebî ku navê wê "Doruk" bû, dikin. Lê ev kovar ji sedemên bêperetiyê, bi tenê çend hejmar derdiçe. Pişt re nivîsên wî û yên hevalên wî, di rojnameya "Bugün" de, di beşa kultur/senet de derdikevin.

Yılmaz di salên 53/54-an de 16-17 salî, di gelek babetan de nivîs û çîrokên civakî dinivîse. Çîrokên wî yên bi navê "Mirin Gazî Min Dike" û "Dawiya Bindestiyê Tune ye", di kovara "Yenî Ufuklar" de çap dibe. Wê salê, çîroka wî ya bi navê "Sê Nenasbarên Sîstemên Newekheviyê" di kovara "Oniç" de çap dibe û dibe sedemê girtina wî. Ev çîroka ku civakê û sîstema kedxwarî û zordestiyê rexne dikir, di jiyana wî de roleke taybetî dileyîze û rewşa wî bi her awayî diguhirîne. Dewlêra paşverû, ji bo vê çîrokê 18 mehan cezayê hepsê û şeş meh jî cezayê nefiyê da Yılmaz.

Ew di sala 1956-an de lîseyê diqedîne û li Enqereyê, li Fakulteya Huqûqê dest bi unîversîteyê dike. Dixwest bibe ebûqat. Bi vî awayî, hem dikaribû ebûqatî bikira û hem jî bi edebiyatê re mijûl bibûya. Lê betal û bêpere nikare xwendina xwe berdewam bi-

ke, lewra jî ji mecbûrî vedigere Edeneyê û karê xwe berdewam dike. Salek şûnde, di berîkê de 150 banqinot, bi sozê ku karê wî di cîh de bimîne, diçe Stenbolê.

Li virê zû dikeve nav civaka edebiyarvanan. Çîroka wî ya bi navê "Dahatîya Bêhêvî" di kovara "Pazar Postası" de derdikeve. Yılmaz êdî ne naşîdê edebiyatê bû, bûbû edebiyarvanekî giring û jêhezkirî. Salek piştî hatina Stenbolê, li Unîversîteya Stenbolê dest bi xwendina Fakulteya Ekonomiyê dike. Êdî meaşekî wî, cîhê razana wî hebû û dikaribû bi rehetî unîversîteyê bixwenda.

Yılmaz di sala 1958-an de dibe nivîskarê filîmên sînemayê. Wê hingê mîna karmendekî li şirketa "Dar Film" kar dikir. Filîmçêker Atif Yılmaz û nivîskar Yaşar Kemal, li ser pirtûka wî ya bi navê "Zarokên Vi Welatî" kar dikirin û haziriya nivîsa senaryoyê dikirin. Ew jî dikeve nav wan û dixwaze vê senaryoyê di ber çavan de derbas bike. Herdu zilam, bi heyret û hinek jî bêdil vê pêşneyarê qebûl dikin. Yılmaz senaryoyê sererast dike û şûnde dide Atif Yılmaz. Ew ji guhartin û sererastkirina wî gelek memnûn dimîne. Li ser îrada Yılmaz, Atif di vî filîmî de roleke piçûk dide wî û ew gelek tê ecibandin. Êdî navê wî jî li ser afîşê filîm heye; ne Yılmaz Putun, lê Yılmaz Güney. Yılmaz ji ber êrîşên dewletê, paşnavê xwe guhartibû.

Yılmaz bi filîmê "Alageyik" kete nav leystikvanên sînemayê. Çaxê Atif û Yılmaz bi alîkariya Yaşar Kemal haziriya vî filîmî dikin, Yılmaz dixwaze di filîm de weke serekleystikvan bileyze. Lê Atif bi tereddut e, di nav artîstên bi nav û deng ên mîna Ayhan Işık, Cüneyt Arkın, Göksel Arsoy, Ediz Hun

û *Fikret Hakan* de dayina roleke wisa giring bo yekî kêmtê tecrûbe, pîrr bi rîsk bû. Li gora *Ayhan Işık*, ew “dişîbiya zarokên Kurd ên ku di kuçeyan de tirimbêlan dişûstin, ji wî jî artist çê dibû?”

Yılmaz înad kir û bi alîkariya *Yaşar Kemal*, *Atif* îqna kir. Dê *Atif* di vê biryara xwe de poşman nebûya; Yılmaz di vî filîmî de, mîna stêrkeke nuh û bi şewq xwe da qebûlkirin û *Atif* jî bi filîmî çend xelatên giring girt. *Atif Yılmaz* piştî salekê, bi vî filîmî xelata filîmçêkerê herî serkeftî sitand. Hima piştî vî filîmî, “*Dema Titûnê*” bû filîmê Yılmaz yê duyemîn.

Dadgeha Tirk, di sala 1961-an de cezayê wî yê li ser nivîsa wî bi navê “*Sê Nenasbarên Sîstemên Newekheviyê*” dabûyê û Yılmaz di amadekirina filîmekî de, li Stenbolê ji teref polîsan ve hat girtin. Polîs wî dibin girtîxaneyê *Üsküdarê* û piştî nêzî du mehên jî ew dişînîn girtîxaneyê *Nevşehîrê*. Yılmaz berî sersala 1963-yan jî cezayê xwe diqedîne û diçe cihê surgina xwe, *Konyayê*.

Yılmaz li girtîxaneyê jî vala namîne, dest bi nivîsandina romana xwe ya pêşîn “*Boynu Bükük Öldüler*” (Ew Bi Stûxwarî Mirin) dike. Di romanê de, li ser rewşa xulamên axê û karkerên pembû disekinî, rewşa axê û têkiliyên wî yên bi xulamên re tîne zimên. *Xelîlê* romanê, bavê wî û *Emîne* jî diya wî ye. *Xelîl* xulam û berdestkê axayê *Zilîmdar* e û bi nano-ziko kar dike. Lê ew roj bi roj hişyar dibe, bi hişê xwe ve tê û ew bi xwe dibe xwedîbiryar. *Jiyana* wî diguhire, ew *Xelîlê* xulam û stûxwar, dest bi berxwedanê dike û fermanên axê pêk nayne. Yılmaz di romana xwe de, di şexsiyeta diya xwe de, *Emîne* dixêwe şeklê jineke Kurd.

Di hevpeyvîneke li ser vê romanê de Yılmaz wiha dibêje: “*Dîtin û baweriyên min, ji rewşa jiyane derketine. Di zarokiya xwe de me nizanibû ku em Kurd in; herkesî bi tirkî diaxift û min jî zimanê diya xwe nizanibû. Lê gelek pişt re, ez fêr bûm ku çi tade û eziyet le Kurdan tê kirin. Ji wê hingê û vir de, ez ji tevaya millet û eqalîyetan hez dikim û piştgeriya wan dikim.*”

Jiyana bindestî û belengaziyê, li ser wî gelek tesîr kiriye. Piştî mirina wî, di filîmekî dokument a li ser *Jiyana* wî de, li ser vî awayî bi dengê xwe wiha dibêje: “*Di zarokiya min de, du tiştan li ser min pîrr tesîr kirine ku ez wan jî bîr nakim. Ya yekem ku em Kurd bûn û tade û eziyetên ji ber wê li me dihate kirin; ya duyem jî xizaniya me û tesîrên wê ku li me dikirin. Ev herdu tişt, di tevaya jiyana min de, ez xistime bin tesîra xwe.*”

Yılmaz li ser wan tiştên ku ji bo hunermendiya wî tesîra li wî kiriye jî wiha dibêje: “*Ez hunermendiya xwe, deyndarê dê û bavê xwe me. Ji bo ku ez bixwînim, tevî birçîbûnê jî, çi pereyên wan hebûn, ji min re xerc dikirin. Herduyan jî stranên kurdî baş dizanibûn û bi her wesîleyê, di dawet û kêfxweşiyên de ji me re distiriyên. Diya min di şevên reş û dirêj ên zivistanê de, çîrok û destanên kurdî yên yek jî yekê xweştir digot û em tevî ciranên xwe, li ber wan mest dibûn. Min her tim dixwest ku van çîrok û destanan binivîsînim û ji xwe re hildim, lê çi mixabin ku min wê hingê nikaribû ev tişt bikira.*”

Romana wî, di dema “*Qral*”iya wî ya sînemayê de çap bû, lê baş nehat girtin. “*Qral*”ê sînemayê, Yılmaz Güney ew nivîsandibû, lê kêmtê kesên ku Yılmaz dixwest,

ji romanê û ji mesajên wê fêr dikirin. Piştî ku di sala 1972-yan de çapa duyem derket û xelata edebî ya *Orhan Kemal* girt, bi carekê kete nava romanên herî zêdexwendî. Dema romana wî vê xelatê digre, Yilmaz di girtîxaneyê Selîmiyeyê de bû.

"Qralê Kirêt" Yilmaz Güney

Yilmaz piştî ku ji bo cezayê nefiyê diçe Konyayê, li wir jineke bi navê *Can Ünal* dinase. *Can Ünal*, wê demê di pavyonekê de dengbêjî dikir. Yilmaz jî ji "komunîzm"ê hukim girtibû û kesî karekî baş nedidayê. Ji mecbûrî, li pavyonekê dest bi kar dike û herdu hev li vê pavyonê nas dikin.

Piştî ku cezayê Yilmaz tewa dibe, diçe Stenbolê û li wir bicîh dibe; pişt re jî Canê tîne cem xwe. Lê Canê ji xwe re rihet nasekine; ew dixwaze Yilmaz bi her awayî bi xwe ve girêde û ji rewşa hunermendiya wî fêde bigire. Di nava wan de nexweşiyeke mezin dest pê dike. Di nava van xire-ciran de qîza wan Elif tê dinyayê.

Yilmaz li Stenbolê dîsan dest bi xebata xwe dike û li ser hev filîman amade dike. Ew êdî "Qralê Kirêt" ê sinemayê ye. Vî navî jî, wî bi xwe li xwe daniye. Rojekê di nav sohbetê de, qala *Ayhan Işık* û bedewiya wî tê kirin; Yilmaz jî bi henek weha dibêje: "Eger ew *Qralê Bedew* ê sinemayê be, ez jî *Qralê Kirêt* ê sinemayê me!" Û piştî vê axaftinê navê wî dibe "Qralê Kirêt (ne bedew)".

Yilmaz di demeke kin de bi dehan filîmên nuh amade dike û gelek navdar dibe. Lê jiyana wî ya bi *Can Ünal* re, roj bi roj xirabtir dibe. Can tevî van şer û qirênan jî, rojekê berî rojekê dixwaze pê re bizewice; lê

Yilmaz xwe nade ber vê daxwazê. Di van xire-ciran de Yilmaz û *Nebahat Çehre* hev nas dikin û bi hev re dest bi jiyana dikin. Piştî hevjiyana wan eşkere dibe, zû zûka dizewicin. Lê Can Ünal jî ji hêleke ve dest bi plan û fesadiyan dike, ji hêla din ve jî qîza xwe li hember Yilmaz bikar tîne. Gelek caran nahêle ku Yilmaz keça xwe bibîne.

Yilmaz naxwaze navê wî bi awayekî nexweş û bi neheqiyê bela bibe û gelek jî ber xwe dikeve. Heta jê tê, dixwaze vê meseleyê bi sahilî bitefîne; lê Can zêde bi ser ve diçe û dixwaze wî rezil bike. Tevî vê jî Yilmaz zêde dengê xwe nake, lê qîza xwe jî bi awayekî jê distîne. Gelek pişt re, çaxê ku bi Fatoş re dizewice, Elifê tîne cem xwe û piştî ku derdikeve Ewrûpayê jî, keçik li pey bavê xwe diçe Parîsê.

Yilmaz di sala 1963-an de filîmê "*Herdu Ji Mêrxas Bûn*" dikşîne. Ev filîm, perçeyek ji jiyana wî ye û ji teref gel ve pîrr tê hez kirin. Ew bi vê yekê gelek kêfxweş dibe û ev şewq wî dixwe xebateke zor û giran. Bi vê şewq û kêfê, di sala 1965-an de tam 21 filîman dikşîne ku ev di dinyayê de dibe reko-reke mezin. Yilmaz di vê demê de, li sê-çar studyoyan kar dike; di sê-çar filîman de dileyize û piraniya wan jî ew bi tena serê xwe îdare dike. Her wiha Yilmaz nivîsên filîman jî bi xwe amade dike; ji xwe pîrraniya senaryoyan di serê wî de ne, tenê ew wan dizane û leystikvan û amadekarên filîman jî li gora senaryoya ku di serê Yilmaz bû de kar dikin. Pîrraniya filîmên wî, bêyî senaryoyên nivîsandî hatine kişandin.

Yilmaz di destpêkê de filîmên şer amade dike û di wan de dileyize; xwe bi van filîman, di nav gel de dide qebûl kirin. Lê li

hember nişandana filîmên wî astengiyên mezin derdikevin holê; filîmçêkerên Stenbolê ên dewlemend, filîmên wî li sînemayên bajêr nadin nişandan. Li ser vê Yılmaz dest bi filîmên civakî û gelêrî dike û filîmên civaka Kurd amade dike. "Qanûnên Sînoran", "Gurên Birçî" û "Seyîtxan" filîmên vê demê ne.

Yılmaz di filîmên xwe de kurdîtiya xwe, bi her awayî eşkere dikir. Ji bilî ku naverok li ser jiyana Kurdan bû, di gelek filîmên xwe de nav û gotinên kurdî bi kar dianî û gelek caran jî van bi gotinên mîna "serê min î Kurd ne qahirînin!" temam dikir. Filîmên mîna "Koçero", "Dawido", "Gurên Birçî", "Qanûnên Sînoran" û gelekên din, bi tevayî li ser jiyana gelê Kurd bûn.

Piştî ku filîmên wî li Kurdistanê û li derveyê Stenbolê pirr kar dikin û dikevin pêşiya tevaya filîman, sînemavanên Stenbolê bi xwe diçin li ber Yılmaz digerin da ku filîmên wî li Stenbolê bidin nişandan. Êdî riya Stenbolê jî li ber wî vebû bû; kar û xebata wî, sebir û semaxa wî, dewlemendên Stenbolê anîbû "îmanê".

Filîmê wî yê ku cara yekem xelatê digire, "Seyîtxan" e. Bi vî filîmî, di sala 1968-an de 17 xelatên herî giring digire û bi carekê sînemayê dixê bin kontrola xwe. Di 1972-

yan de bi filîmê "Hêvî" li Îtalyayê xelata mezin a taybetî ya juriyê digre û li Ewropayê jî tê nasîn. Piştî vê, hema her filîmê wî, tevî ku dewletê ew qedexa jî dikirin, çend xelatên giring digirt. Pirraniya filîmên wî ên ku piştî "Hêvî" derketin, tevî ku dewletê ew qedexa jî dikirin, bi xelatên herî giring hatin raceserkin.

Piştî "Hêvî", êdî filîmên wî bi temamî li ser rewşa Kurdan û li ser civakê û nakokiyên wê bûn. "Êş" (Acı), "Lauje" (Ağıt), "Yên Bêhêvî" (Umutsuzlar), "Baba", "Koboy Alî", "Rojekê Bivê-nevê" (Bir Gün Mutlaka) çend filîmên vê demê ne.

Lê Yılmaz berhemên xwe yê herî hêja di girtîxaneyê de amade kiriye. Di wir de bêtir dikarîbû bifikire û wextê wî jî bêtir bû. "Heval", "Kerî", "Rê" û "Dîwar", ku Yılmaz bi van filîman ne tenê di çapa Kurdistanê û Turkiyeyê de, lê li Ewropayê û li çaraliyên cîhanê jî hate naskirin û qebûl kirin, di girtîxaneyê de hatine amade kirin. Weke ku tê zanîn filîmê "Rê" li Cannesê xelata yekemîn girt û Yılmaz di çapa cîhanê de kete nav filîmçêkerên herî mezin.

Dûmahik û beşê dawî di hejmeta bê de.

DIXWAZIM AXAFTINÊ BÎNIM SER GÜNEY...*



**Baran
Fundermann**

Xelkên Tirkîyeyê û Bakûrê Kurdistanê û hunermend, şoreşgêr û rewşenbîrên ku ji bersinga van xelkan derketine, hema di hemû demên dîrokê de bi lez berziyane suxreya burjuwazî. Burjuwazî ji heyamê herî bihurî heta yê herî pêş, ji tevgerên civakî yên giştî ders girtine û ew weke taktîk ji bo mafên xwe daxistine jiyane. Qaşo “rewşenbîr, şoreşger, hunermend...” li kû be xwe rûpêşê heyranîya wî kiriye di nava demê de zêdetir rîziyaye û di nêv sazûmanê jî de heliyane. Xasma kurd, zêdetir bi pêş ve çûne; welatên mêtîngêh ên ku ji wan re tîpên “pêşîktî” afirandine begem kirine û bûne dûvik. Ji rizîtiyê jî wêdetir bihurîne û xwe di navê de wenda kirine. Kurdên girêdayê bi bihadariya hemgelî ve jî ku xwe nîşan dane, di tewrên berxwedanê de serkeftî nebûne.

Her kes bi hêsanî dikare bêje ku ew kurd “Şoreşger yan rewşenbîrên tirk, ereb û faris in.” Bi biratiya olî, markîsî, şoreşgerî... Lê Kurdekî negotîne ku “Ez rewşenbîr û şoreşgerê kurd im. Tu çî bî, ez jî weke kurd ew im.” Ji gotîna “Nijadperest, anti” vekîşiyane û ji dinyaya wendabûnê zêdetir dakerîne wendabûnê. Bi rewşenbîrên xwe, şoreşgerên xwe û welatê xwe, heta bipêşvetir ve jî çûne, bi ezîtiya xwe ve, xwe dane destan. Hemû tiştên ku kirine, li xaneyê ereb, faris û tirkîyan hatine nivîsandin; bi bihatiyeke sexte dest danîne ser jiyana, huner û welatê wan, heta çanda xwe jî.

Li vir gotîna “bihatiya sexte” feydê bo şiyarkirina kesên ku dibêjin “ez hatim girtin” dibînim; ez dîtina kes an hinekên ku dane ser rîyeke xirab rexne nakim. Bi tersê wê,

ez yên ku bi dîtina xwe derketine rê û bi navê wê dîtînê jî ku çiroviro dikin rexne dikim. Gotina min ji wan kesan re ye ku ew di neynika pratîkê de li xwe nanerin, lê di teoriyê de xwe dadmend dihesibînin.

Di esasê xwe de, bê ku peyv dirêj bibe, dixwazim peyvê bînime ser Yılmaz Güney. Di Yazdehemîn salvegera mirina wî de, bi nivîsekê dixwazim ku şoreşgerekî hunermend bi bîr bînim. Ji welatê xwe dûr, derketina ji bersinga birçîfî, tuncî û dehfdana bi hordîtînê ve, bi hewldaneke tersê wan, ji ber ku wisan ji rêzê ve nayê gotin, bi rêgihîştina bikaranîna berpirsariya babetê ve bêrev bû. Lê ne ku kirina Güney weke bite (pût), erê bi dîtina weke hebûna wî û derxistina dersan ji livaka wî, û pêşkêşkirina ji bo nîşên nû re.

Gava em li Güney dinerin, ewî ne ku tenê hunermend, an jî ne ku weke şoreşgerekî, ew raman û projeyên wî yên ji bo demepêşê û her diçû jî ku şexsiyeta xwe ya netewî derdixiste pêş, wisan divê bête dîtina mîna yekî ku derxistibû jî. Ji ber ku ew rewşenbîrekî kurd bû û proje û xebatên wî gihabûne rastiyeke jî ku wê Şoreşa Kurdistanê bibûya rastiyeke dînamîk ji bo Şoreşa Tirkîyê.

Ji bo rêgihandina Yılmaz Güney zêdetir, divê ku pêşî û ji nêz ve jiyana wî bête zanîn. Ka ew di dinyayeke çewan de mezin bûye?

Yılmaz Güney di 1937'an de li Edenê, hatiye dinyayê û lawê malbateke xizan a kurd bû. Güneyê ku şeş salan ji jiyê xwe yê rastî piçûktir hatiye nivîsandin, tarîxa jidayîkbûyîna wî ya rast 1931 e. Navê wî yê rast jî, Yılmaz Pütün bû. Kî dizane ku jimara wan

zarokên kurdan ên ku di mişextiyê de bi Güney re çêbûne derdikevin çiqasî! Helbet wê rojekê dîrok wan binivîse! Malbata Güney li Çukurovaya bêserûber di zeviyên pembû û baxçeyên narenciyan de nanozîko şixuliye. Jiyana wî di wê germeşewata Îçel û Çukurovayê de dest bi xwenasîne kiriye. Îro kesên ku ji Edenê diçin Mêrsînê, gava di Yenîceya qeza Edenê re dibihurin, bi heyecan dibêjin ku "Güney li vir mezin bûye!" Deverên ku Güney lê mezin bûye, ew dever in ku di berthema navdar a bi navê "Mihemedê Zirav" [Ince Memet] de ku Yaşar Kemal nivîsiye dibihurin bi xwe ne. Li Çukurovayê û Anavarzayê germa doze-hî, ax û toz, sitirî, mar-çiyên û ew axayên qehrî dijîn...

Çukurova bi gundiyên Kurd ên mişextî ve hatiye dagirtin. Ji wan re "Gundên Kurdan" dibêjin. Kurd eger kurdîtiya xwe jibîr bikin jî, Çukurovayî bi wan nadine jibîrkirin; ji wan re "kurd" û "tu kurd î!" dibêjin. Li wan deveran "Felah" jî hene. Bi erebî mana "felah" cotarî ye. Lê her çî be gava ku felah an jî kurd tê gotin, merivên wan deran bi cudayî li wan dinerin; xasma li kurdan... Piştî yorûk, cengene û mirovên jî gelên din.

Çukurova tam jî mozayîka xelkan e. Ji bo Çukurovayê pir tişt têne gotin, lê jê re "Gundê tirkan ê herê mezin" jî tê gotin.

Deşta Çukurovayê heta tu bixwazî pahn û fireh e û mîna bajarekî bêrêkûpêk berfirê bûye. Ew kavlên ji çimento ku her aliye wê vegirtine, germê dixine rewşeke germtirîn.

Çukurovayî gava li çiyarêzên Torosî dinerin dinepixin, lê naçin wir. Naçe, ji ber

ku destdayîna wan tune. Ji ber hindê li serçimkên sipî yê çiyê temaşe dîke û radiwestin. Toros diltepîneke xweş didine edneyî, mîrsînî û kurdan. Kurdan dikişîne xwe, wan digirin û dibine welatê xwe, Torosan.

Mîrsîn û xasma jî Edene di îndustrialîzmê de, berê û niha jî navendeke kar û karkeran e. Herêma girêdayê bi çandina pembû ve û menşûr e, mînaye karxaneyeke çilagi (tekstîl) a merixwur. Ew karxane berî 80 mînbû bîra dînemîtan... Yilmaz Güney di wê cografyayê de, ji welatê xwe dûr û li mişextiyê mezin bûye.

Meriv di navdeda ku tê de mezin dibe, li gor hêwirandina wir bîçima digire. Çewa di her kesî de dibe, di Güneyî de jî tesîra şertên jiyânê bi tîza [dûrtî] xwe çêbûye. Mezinbûna li ser axa Çukurovayê, beza Güneyî ji bo nanê xwe bi her karî ve, ta dawiyê jî hiç ew ji bîr nedikirin. Xasma faktora Güneyî, wî ji hin kesên petiyayî cihê dikir. Ew cihêti, giyana şoreşgertî bû. Di şûna ku wî situyê xwe ji şertan re xwar bikira, her dilpikî ku rêastiyê bide pêşiya wan. Wî di tevayîya wê kurtejiyanê de û di oxira bawerîya xwe de, her û her berxwedan dikir.

"XWÎNGERM"

Diya Yilmaz Güney ji Mûşê, bavê wî ji Swêreka Rihayê bû û ji şûnwarê xwe ji ber doza xwîne reviyabû. Hewesa Güneyî ji bo çekan, di nava heft biran de herî li pêş bû. Ew hewesa çek, piştî di wan filîmên ku çêdikirin de jî pir dihatê dîtin û ji aliyekî ve jî di binê zanînê de "ez-xwe" direqisand. Di temenê zaroktiyê de berpirsariya salên

qefla bîstî bo Güney hatiye dayîn. Bihurandina malbateke kurd a pîrkes li beyabanê, -xasma ku reh Gundî be- karekî zehmet bû. Firodina çorekan, boyaxkirina solan, wek kirina karê beqçitiyê, ta salên dibisranê dema zaroktiyê ku li kuçê bihuriye, yek jî bi tîpa xortantiya Rihayê ve ku di xweratiya Edenê de gihabûne hevûdu, hatina di jiyaneke bi rastî de "nûciwan"ek bû. Ev nûciwanê gelparêz, tîpekiya xwe di filîmên salên sînemayê yê pêşî de jî nîşan dida.

Yilmaz Güneyê ku di serê salên 1950'î de bi sînemayê re hevnas bûye, di 1951'ê de çendî ku bûye makînest jî, hewqasî jê re ne hêsan bû. Di navbera sînema û şirketên filîman de birin û anîna filîman (cûreyek hemaltî), bi makîneyên derdemî ve wisan bêdeng li gundan leyztandina filîman, teşrîdarîti û reklamîti destpêka riyên ku wî biribûne sînemayê tene hesabandin.

Hewesê mezin a Güney ji leyztikvaniya sînemê û xwendinê re hebû. Di salên 1952'an de di kovareke edebî ya rojnameyekê de, li ser Gundî, karkirên pembû û şopên jiyana xwe gelek ceribandî nivîsîne. Êdî Güney dest bi gavavêtina siyaseta û wêjeyê jî kir û her ku çû, şexsiyeta wî dest bi bîçimbûnê ve meşiya. Di salên 1978-79'an de wî ew nivîsên xwe ku di kovara Güney de weşandine, behsa Kurdîstaneke hevgerî ya serbixwe jî kiriyê. Wî di nivîsên xwe de weha gotiyê: "*Riya şoreşa Tirkîyê jî di Kurdistanê re dibihure. Em rizgarkirina Kurdistanê hişil-mişil bi şoreşa Tirkîyê ve gêrêndin. Berevajî wê, motora berfirebûnê dibe ku Kurdistan be. Ewçax ku xweavêtinê hebe bi Tirkîyê ve, çûna serxwebûnê û sosyalîstiyê ye.*" Wî guman dikir ku dê rizgariya kurd û

Kurdistanê dengeya Rojhilata Navîn serobin bike û rêzerê li şoreşan jî veke.

SALÊN SÎNEMAYÊ

Yilmaz Güney di 1956'an de dest bi Fakulteya Dadetiyê (Huqûq) kiriye. Di eynî demê ku ji kovara edebî ya bi navê "Sêzdeh"ê re nivîsîbû, xasma ji ber nivîsa xwe ya bi sernavê "Sê Nenasên Hemkûfî" [Ûç bilîmîyenli denkle] ango ku "Propagandeya komûnîstiyê kiriye" bi 7 sal û nivê girtîgeh û du sal û nivê jî mişext hate tawanbarkirin. Lê piştê tawanê wî bi sal û nivêkê girtîgeh û şeş mehan jî mişext hatine guhartin. Güney di 1958'an de li ser pêşniyazêke sînemayê ku çûye Stenbolê, di dilqên "dublörîk, figuranîk" û hwd. weke "lêxistin-şikandin"ê de cih girtiye. Gava bi Atif Yilmaz re hevnas bûye û bûne dost, qabiliyeta wî êdî nîşan daye ku dê ew bala bibe. Ew filîmê ku tê de serdilqî [Başrol] kiriye, bi navê filîmê "Sorask"ê [Alageyik] bû. Güneyê ku senaryoya "Reşevîna Karacaoglan"î nivîsiye û tê de jî leyztîye, rastiyeke ku gelek aliyên wî daye nîşandan. Ev destjêhatinî, bi her astengan ve wî dehf û nîşan daye.

"GIRTÎGEHTÎ PÎŞEYKE ZOR E"

Yilmaz Güney bêgav mabû ku di 1959'an de Fakulteya Dadetiyê bihêle, di 1961'ê de gava filîmê "Belaya Şêrîn" dikişand, hate girtin û 18 mehên xwe di girtîgeha Newşehîrê de bihurandin. Bi jiyana girtîgehê û rewşa wê re, zemanê xwe tev bi nivîsandinê nixrdar dikir. Romana xwe ya bi navê "Sî-tûxwar Mirin" ku otobiyografiya malbata xwe dianî zimên, li wir nivîsiye. Güney, wê

girtîgeha ku lê dima, bi dibistanê bedêl kir û hevalên xwe yê qawîşê digihand, rêgi-handina çîneyatî û tenikîtiya jiyânê bi wan dida zanîn. Piştî ku di wê dema mişextiyê de bi Can Ünalî re hevnas bû û ku demekê bi hev re man, piştê keçeke bi navê Elîfê ji wan re çêbû.

Di 1963'an de gava tawanê mişextiyê kurtabûye û dîsa jî ku vejeriyaye sînemê, navê wî bi "komûnîst"iyê derket û her kes bi hesab nêz dibû. Wî jî dema xwe bi nivîsandina senaryo û çîrokan dibihurand, herweha ew şixulî ku ramanên xwe binivîsîne. Filîmên wî ji aliyê xelkên dêmanî ve pir dihatine ecibandin û rekora daketîne şikandin.

Güney di serdilqên filîmên sînemayê de bi jiyaneke tershevî û şerkinê ve gelek filîm kişandine. Gelên ku di nava tuneyî û perîşaniyê de dijiyan, xwe di kêşana tîpên wî de didîtin û ew yek ji xwe dipejirandin.

Rastî jî ev bû ku Güney ji nava xelkê hatibû û yek ji xelkê bû.

HESP-JIN-ÇEK...

Yilmaz Güney di navbera salên 60-70'yê de, zêdetirê 20 filîm çêkirine. Hema bêje ew filîm tevek yê wî bi xwe ne. Di wê navê de filîmên wî yê bi navê "Zagona Tixûban, Riya Qizilirmaqê, Hesp-Jin-Çek, Qiralê Sik, Kurê Qozanî, İnoyê Zirav" di dilê xelkên tevayîya Tirkîyê û Kurdistanê de text vegirtine. Êdî li her deverê behsa "Qiralê Sik" dihatê kirin û afîşine bejne bejn dihatine daleqandin. Wî, ew hemû naverokekên ku bi kar anîne, ji bersinga civatê diqetiyên û bangî dilê xelkê dikirin. Tersîtiyên di navbera wî û xwediyên şirketên filînan de, bûn sedemê ku di dawîya salên 60'î de

şirketeke xwe damezirîne û rê li serbixwetiya wî veke. Di wê demê de wî filîmê “*Seyîd Xan*”, “*Gurên Birçî*” û “*Nûriyê Pîr*” çêkirin.

Güneyê ku qaçaxê leşkeriyê bû, bi lengelûkî gava ew birin leşkeriyê, filîmê “*Osmanê Piyade*” û “*Mirovekî Sik*” bûn berê wê demê.

Di 1970'yî de Güney bi malxweya xwe ya dawîn Fatoşê (Jale Fafma Süleymangil) re zewicî û kurek ji wan re çêbû.

Filîmê “*Hêvî*” gava di 1970'yî de çêkir, tîna hejînektiya siyasî ya wê demê dikişand. Ew filîm bo gelek xelatan seza hate dîtîn û di nava afirandinên serekî yê sînemayê de cihê xwe girt û di dinyayê de bû xwediye heqderiyêke navdar. Filîmê “*Îbret*”, “*Sibehê Roja Dawîn e*”, “*Tahl*”, “*Pêxwas*” û “*Bav*” jî, li pey hevdu kudandin.

Çewa ku me li pêş jî gotiye, xasmetmendiya Güney, ev bû ku wî rind dizanibû dê çewan bangî xelkê bikira. Di heyamê xwe de, tenê ew sînemahostayek bû ku bi navendiyekê gazî dida xelkê Tirkîyê û Kurdistanê. Di filîmên xwe de çendî ku zelal nedihate dîtîn jî, lê tê de hinek kurdî, hinek tirkî, laz, çerkez û şopa gelek neteweyan hebû. Êşa xelkê, xemgînî, daxwazên wan digirtin û bi hostayî ew bi kar dianîn. Di salên 70'ê de, bi tîna bayê siyasî re, rizîtiya sazûmanê herwekî danîbe binê mercekekê û penî dikir. Ji bo vê yekê xelk bi rêzanî jê re pêrgberîtî dikir, lê hin derûdor jê nerihet dibûn.

Güney di salên girtîgehê de vala nedisekinî, rewşa “hundirû” vegerandibû gihandina şoreşgertiyê. Dilbestiya xelkê dinyayê, li pêşberî wî zêdetir dibû. Sedem li kû bûna, êdî ew dibû efsaneyek. Bestetîtiyêke zê-

de ji pirtûkên wî yê ku di girtîxanê de nivîsandibûn re çêbûbû û xelat werdigirtin. Yek ji wan jî di 72'an de ku xelata Orhan Kemal girt, “*Xelata Stuxwar*”ê bû. Di 1974an de Güney ji “*Lêborîna Hinekî*” feyde girt û derket derve, dest bi çêkirina filîmê “*Heval*” û “*Jar*”ê kir. Ev herdu filîm, ji aliyekî ve yê dema gihajtina wî ya herî baş bûn. Gava li Edenê dest bi kêşana filîmê “*Endîşe*”yê kir, di dema kêşanê de dadmendek pê re nîqaş kiriye, li ser lêxistina dadmendî 19 sal tawanê girtîgehê dane Güney, bi derbekê jiyana wî guherî û careke din vegeyriya girtîgehê.

Güney gava di girtîgehê de bû, filîmê “*Endîşe*”yê ji aliyê Şerîf Gören û Erkan Yücel ve hate temamkirin. Ew filîm jî ji bo gelek xelatan seza hate dîtîn. Hema ew bila di girtîgehê de bûya! Bêrawestîna roman û çîrok dinivîsîn û dibû sedemê çêkirina filîman.

Güney mirovekî wisan bû ku gewdê wî di hindurû de bû, lê ramanên wî li derve bûn. Wî di wê demê de kovara *Güney* ji bo weşanê da hazirkirin (1978) û tê de dîtina xwe ya siyasî weşand.

Amaca Güney ev bû ku ew bibe mirovekî ramanî. Lê hêj gava di hindurû de bû, ew ji ber nivîsa xwe ya “*Li ser faşîstiyê*”, bi heft sal û nivê girtîgeh û du sal û nivê jî mişext hate tawanbarkirin. Ji ber hin nivîsên din jî tawan girtibûn. Li kû be, tawanê wî gihabû dora 40 salî.

REŞATIYA KAZIMA DUWANZDEHÊ ÎLONÊ Û REV

Ew reşatiya Duwazdehê Êlûnê mîna agirê dojhê dakete ser welêt. Filîm û pirtûkên

Güney hemû hatin qedexekirin û tawanê wî derkete ta bi roo salan. Her ku çû lêşsa-xiya Güney jî xirab dibû û bi alîkariya hevalên xwe di reva ji girtîgehê de serkeftî bû. Güney ji hina û şûnde êdî pîşeya xwe ya şoreşgerî li derveyî welêt da meşandin û gelşên xelkên bindest ên dinyê dipêkanî. Çewa di filmê "Rê" û "Kerî" de jî tê dîtîn, her ku çû ew şixulî ku şexsiyeta kurdîstiyê werbigire û wan projeyên di serê xwe jî daxîne jiyane.

Yılmaz Güney ne yekî ji rêzê bû, yekî wisan bû ku bi çîneyî ve aliyê wî yê siyastî giran dardiket. Wî tersîtiyên sazûmana bê serûber didîtin û ji bo felatê jî xwe ji şerî venedikişand. Ya herî girîng ew bû ku bi îdentîteta Kurdî ve beste bûbû, ew bi têgihîştîneke şoreşgerî derdixiste pêş, ji bo çareserkirina gelşên deverê jî dimeşiya. Bi rastiya ku kurd neteweyekî cuda ye derketibû rê û ji bo hebûna mafê damezirandina dewleteke serbixwe jî di gelek nivîsên xwe de dianî zimên. Lê çî heyf, piştî 1980'yî gava riya çûna ber bi dewleteke nûjen ve vebû, wî ew meze negirt û çavên xwe ji jiyane girtin. Ji bo Kurd û gelên dinyê ku bihadariyeke mezin bû, bi gelek pêşnumayan ve ji nava me koç kir.

Güney di wî heyamî de gava çavên xwe ji jiyane girtin, hinek derdorên ku mana kaşkirina wî ber bi aliyê rastê û çepê ve nedizandin û jê feyde dîtîn, ji bo xwe alîgir dicivandin. Ew tenê bi vê yekê jî neman, hîn bi pêşvetir ve çûn û xwestin ku wî ji sazûnana faşîst re entegre bikin. Hem jî şoreşger, qaşo bi navê şoreşgeriyê!

Di Yazdemîn salvegera dilovaniya wî de ku em wî bi bîr tînin, peyva ku ji wan re tê

gotin, fehmkirina Güney û riya parastina wî, bi navê şoreşê, bi navê şoreşgeriyê û hem jî bi navê enternasyonalîstiyê û bi rastiya ku Kurdistan bombe dibe û tê talankirin... Divê ew li kêleka neteweyê kurd cihê xwe bigirin û berxwedan bikin. Yan jî ku hewqasî pîrozbahiyên kurdan têne talankirin, kirina evçend şemate çî ye?

Di demekê de Nihat Behramê ku dostekî Yılmaz Güneyî yê nêz bû, lê bi salan şûnde em li virên wan nivîsên wî yên ha li kû be ku gihabûne radeyeke wisan êdî jê re sixêfan dikir, nagirine jidiliyê. Eger Nihat Behram ji bo qezenckirina şanê navê xwe be, yan ji bo dîtina feydê ji hinan be, ku ketibe rewşeke wisan ta ku heqaretê li miriyekî bike, sedem bila tê de bê lêgerandin. Tiştên ku jê têne xwestin ev in ku di demçûyê de ne nêzîkayê li gihaneka sawiya sixêfan e, derxistina dersan e ji şaşiyên wî yên bihurî. ■

Not:

Baran Fundermann ev nivîsa xwe bi tirkî ji me re şandibû. Me jî ji bo xwendevanên Nûdemê wergerande kurdî.

* Armanca nivîskar bi "Güney" ya sernavê "Başûr e".

40 SALIYA RADYOYA KURDÎ YA DENGÊ YERÎVANÊ



Wezîrê Eşo

Piştî mirina Stalîn qedexa li ser ziman û kultura kurdî, ku ji sala 1937'an hetanî destpêka salên 50'î berde-wam dikir, ji ortê hate rakirin. Li Ermenîstanê ocaxên kultura kurdî yên wê dewranê qedexekirî careke din hatin vekirin û yên nû hatin saz kirin. Di nav wan de beşa axaftina kurdî li radyoya Yerîvanê (paytextê Ermenîstanê) dest pê kir. Ev yeka han di destpêka sala 1955'an de qewimî. Di destpêkê de zimanê axaftina kurdî li radyoya Yerîvanê 15 deqîqe bûn. Piştra ew zeman hate dirêjkirin û di dawiya salên 50'î de gihîşte saet û nîvekê. Ev yeka bi biryara partiya komunîst ya Sovyetê qewimî. Bi vê fikrê, partiye dixwest ku bi riya propogandayê hem kurdên li Sovyetê hem jî yên li Kurdistanê bike dostê sosyalîzmê û Sovyetê. Lê dewleta Sovyetê destûr nedida ku xebatkârên radyoyê di radyoyê de li dijî problemên hundurîn yên welatên serdestên kurdan bipeyivin. Yanî dewletê nedihîşt ku di radyoyê de behsa Kurdistaneke azad û serbixwe bibe. Lê carna Sovyetê ji bo fêda xwe û ji bo reqabeta bi hin dewletên din re, wan dixwestin ku di radyoyê de behsa kurdan û welatê wan bête kirin. Heta di ser de jî wê piştgiriya têkoşîna kurdan ya ji bo azadiyê dikir. Di destpêka salên 60'î de dewleta Sovyetê êşkere piştgiriya têkoşîna kurdên Iraqê kir, ji ber ku navbera wê û Iraqê xerab bûbû. Wê demê dewleta Sovyetê bi me kurdên Sovyetê jî dest bi kampanyayê li dijî Bexdayê kir, bi riya radyo û nivîsandinê, em kurdên Sovyetê ji karker û gundiyan bigire heta bi rewşenbîran tevî kampanyaya li dijî Bexdayê bûn. Moskvayê bi êşkereyî gelê kurd mîna

gelekî qehreman û têkoşer îlan kir û xwest vê yekê bi Bexdayê jî bide qebûlîkirin. Lê mixabin, di nîveka salên 70'ê de Yekîtiya Sovyetê dest ji piştgiriya hindava têkoşîna kurdan kişand û herweha êdî hew destûr da ku di radyoya dengê Yerîvanê de li ser kurdan zêde tişt bête gotin û di şûna wê de bi her awayî dest bi propogandaya dewleta Sovyetê hate kirin. Me bi xwe nikarîbû bi gotina wan nekira û em nikarîbûn li dijî biryareke weha jî derketana. Lê bi sînore be jî, me programên li ser kultur û edebiyata kurdan çêdikirin.

Piraniya weşanên me bi temayên siyasî bûn. Her roj, weke qanûnê, weşanên me bi deng û basên navneteweyî yên nû destpê dibûn. Piştra deng û basên di derheqa jiyana Ermenîstanê de, ya ermenîyan, kurdan û gelên cumhûriyetên mayîn de. Ji wê şûnda şirovekirina bi tema rojê dihate weşandinê, ya di derheqa qewmandineke navnetewî da, di derheqa fîbrîka, kolxoz, pale û cotkarê destemet da, di derheqa çêlekdoşeka baş da. Me pesnê wan mirovên ku bi karkirina xwe ya helal û cefakêş hebûna dewleta Sovyetê zêde dikirin, dida. Carna jî ew qise di derheqa rewşenbîrekî kurd da bûn, dersdar, muhendîz, dixtor, nivîskar, zanîyar û ên dinê.

Di nava programa heftekê da rojekê jî weşanên lîteratûrî cih digirt. Nivîskarên kurd dihatin radyoyê û berhemên xwe bi xwe dixwendin. Me li radyoyê propogandaya pêşketina lêteratur û kultura kurdan ya li Ermenîstanê dikir, em di derheqa nivîskar û kurdzanên bi nav û deng diaxivîn. Xasma salên dawî me nimûne ji lîteratûra kurdî ya klasîk di radyoyê de dixwendin.

Gava dest bi weşanên kurdî bûn di fonda radyoyê da tu stranên kurdan tunebû. Di-viyabû ew nû bihatina dengnivîsarê û bona wê yekê stranbêj û sazbandên kurd teklîfî radyoyê kirin û stran û lêlanên wan ser ge-îtanê nivîsîn. Di vî warî de keda *Casimê Celîl* mezin e. Piştî wî zemanekê dirêj Xelîl Mûradov bû serok û berpisyarê redaksiyona axaftina kurdî û wî fonda stranên kurdî pir dewlemend kir. Bi saya radyoyê pir stranên kurdî, xasma yê folklorî ji wenda-bûnê xelas bûn, çimkî niha stranbêj û saz-bandên kurd yê hosta û zane hema hema nemane. Bi xêra radyoyê, îro deng û seda van stranbêjên hêja ji gelê me ra wek milkê kultura wî ya zengîn û bilind maye. *Şeroyê Biro, Efîyê Esed, Reşîdê Baso, Memê Kurdo, Hîşîq Nazûk, Memoîyê Silo, Şiblîyê Çaçan, Egîdê Têcir, Sehîdê Şemedîn, Karapêtê Xaço, Aramê Tîgran, Xemo* û ên din. Dengê me-îya, fiq û zurna hostên wisa mezin ser ge-îtanê hatîye. Dengnivîsar, çawa *Şamilê Be-ko* û *Egîtê Cîmo*. Lê çiqas stranên kurdî, ên xweş û şîrîn bi bilûr, meîya û zurna *Taharê Emer, Xelîlê Evdile* bûne milkê gelê me yê heta hetayî. Xasma salên dawî me pir stran û lêlanên kurdî ji welatên derva bi cûrê ka-sêtan stendin û fonda me bi dengê *Mehe-med Arif Cizrawî, Hesên Arif Cizrawî, Şi-van Perwer*, stran û leyelanên koma Berxwe-dan dewlemend bû. Çovek, sînore bihîstina weşanê kurdî ji Yerîvanê pir fire ye; hemû cumhûriyetên Yekîtiya Kevnesovyetê, welatên rojhelata nêzik û navîn dikevin navbera wî sinorî. Me zanîbû ku dengê me digîhîje hemû kurdan û vê yekê em şa û ruhbar dikirin. Hema ji roja pêşin dengê spîkerê kurd, stranbêj û sazbandê bi teri-

bandina sînoren dewletê, ser çîya û banîyan, gelî-gebûzara çû kete her gund û bajarêkî kurdan, guhê her kurdekî yê bi şênaiya yanê jî li zomên zozanên bilind, li konên reş û çadîrên zemanê niha. Em guhbihîstî dibûn, ku dema destpêbûna weşanên kurdî li Ermenîstanê hemû kurdan dev ji karên xwe berdidan û bi hezkirin û hesret guhdariya weşana kurdî dikirin. Ev di demeke wilo de bû, ku li bakurê Kurdistanê zimanê kurdî qedexe bû, hildana navê kurdî qedexe bû. Loma bala piraniya kurdan li ser radyoya kurdî bû. Ji ber ku di radyoyê de, digel stran û kilamên kurdî, li ser kultur û adetên kurdan, rabûn û rûniştina wan, kul û derdê wan jî program çêdibûn.

Radyoyê hîsên neteweyî di nav-ruh û sewdên kurdan da hişyar kirin. Ne bi tenê kurdên Sovyetê, herweha tesîreke wê ya pir erîni li kurdên Kurdistanê jî dibû. Berî weşana radyoyê, li gelek cih û deverên Sovyetê kurd li ber windabûnê bûn, bîr baweriyên wan yên di derheqa kurd û kurdayetiyê de sist bûn. Piraniya wan haj kultur û dîroka xwe tunebûn, nizanîbûn ku Kurdistan heye û li wir bi milyonan xwişk û birayên wan dijîn. Hinek kurdan jî, xasma yên êzîdî ber mirina xwe hatibûn raê, bi windabûna xwe razî bûbûn. Wan gorî filosofiya xwe ya mirinê wana çî digot "Xwedê yarî, qedera me da wisa nivîsiye: em gotî bê qiral, bê text û tac bin, xwe-xudanê me her tenê Şems e". Lê çaxê bi saya radyoyê pê hesiyar ku êzîdî jî kurd in û gelê wan sî milyon e hêja ruh bi wan ve hat û terka wê filosofiya mirinê kirin. Radyoyê bi saya propogandakirina kurd û Kurdistanê, bîr û baweriyên neteweyî yên kurdên Sovyetê

hişyar kirin, lê kurdên Sovyetê, xasma rewşenbîrên wan jî kurd û Kurdistan hişyar kirin. Rasttir e ku em bibêjin, rola radyoyê di vî warî de pir bû, ji ber ku bi tenê radyoyê ev kar pêk neanî. Radyoya Yêrîvanê, bi propogandakirina pêşketina kultura kurdên Ermenîstanê, Kurdzaniya Sovyetistanê, dîroka gelê kurd, bîr û bawer, hesîneke wan nava kurdên Kurdistanê da pêş da anî. Em hene, em xwediyê kultura zengîn û dîroka zemandirêj in û vê yekê cîhanê da nas dikin, her tenê li Tirkiyeyê me çawa gel hesab nakin û bi ser de jî ziman û kultura me qedexe dikin. Dengê radyoya Yêrîvanê xwîna neteweyî di damarên kurdan de da gerandin. Radyoya Yêrîvanê wisa jî roleke mezin di hişyarkirina kurdên diasporê de leyist. Bi bihîstina axaftina kurdî, bi bihîstina stranên kurdî kurdan derd û kulên xwe ji bîr dikirin.

Zemanekî dirêj tenê radyoya Yêrîvanê deng û basên di derheqa kurdên başûr de digihand kurdên bakur. Bi gotineke din radyoyê şûna pirtûk, rojname û kovarên ku qedexe bûn jî dadigirt. Di demeke ku pêla asîmîlasyonê herî xurt bû de, hebûna radyoya Yêrîvanê, li hemberî vê pêla asîmîlasyonê serîhildanek bû. Ji ber ku piraniya kurdan wê demê nexwendî bûn, an jî yên ku xwende bûn, xwendina wan bi tirkî û bi zimanên mayin bûn, hebûna radyoya kurdî îmkanekî gelekî baş bû. Di radyoya dengê Yêrîvanê de van rewşenbîrên kurd kar kirine: *Mikaêlê Reşîd, Fêrikê Ūsiv, Şikoê Hesên, Qaçaxê Mirad, Ordîxanê Celîl, Emerîkê Serdar, Ahmedê Gogê, Mirazê Evdo, Hamoyê Rizgo, Cemîla Celîl, Sîma Sêmend, Bariyê Mehmûd, Memê Lîlaz, Têrnû-*

rê Xelîl, Îşcanê Eslan û ên din. Herweha em spîkerên mîna *Nûrê Polatovaê, Eznîva Reşîd, Sêvaza Evdo, Gulîzera Casim, Lûsiya Huseyin*. Divê em xasma *Keremê Seyad*, ku dengê wî ji her kurdî re nas e, bi bîr bînin. Ronakbîrên kurd ku bi axaftin û bi berhemên xwe radyo xemilandine ev in: *Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Nadoê Xudo, Mîroê Esed, Semend Sîyabendov, Şeroîye Mihoî, Sebîdê Îbo, Sîmoîyê Şemo û Celîlê Celîl*. Ez bi xwe jî xwe pir bextiyar dibînim ku ji roja vebûna radyoyê, yanî di çil salên weşana radyoyê de, min jî tê de xizmet kiriye. Ez xwe bextewar hesab dikim ku ev dîroka beşa axaftina kurdî ji bo min dîroka zindî ye û ew jî perçeyek ji dîroka kurdî ye.

Di xilasîyê de ez 40 saliya radyoya dengê Yerivanê bi hemû xebatkarên wê yê kevin û nû re pîroz dikim û herweha ez bi milyonan guhdarên wê jî pîroz dikim. ■

LI WÊ DERÊ

Li wê derê,
tenê deng û sewta dilê tariyê dihat,

Li wê derê,
avên behran kelekên xwe ramûstin
û ji hev xatir xwastin,

Li wê derê,
ezmanê reş xwe tazî kir; rût û repal...

Li wê derê,
ezmanê reş li xwe kir; ewrên sor û zer...

Li wê derê,
can û jiyan di bihuştê de hatin fetisandin,

Li wê derê,
xewn û xeyal di çavên ku
wek rengê erdê de şewitîn,
hên ku negihîştin ronahiya tavê...


Li wê derê,
duh
li Hîroşîmayê û Ausşwitzê.

Li wê derê,
îro
li Helepçeyê

Û sibê,
kî dizane li ku?

Seydoyê Kûso

F ÎLOZOFÊ DESTHILATÊ



Şerefhan Cizîrî

Dîroka felsefê û ramanweriyê renga reng e. Pîrr caran mirov dikare li hemberî vê keskesora ramanî bê çare bimîne. Pîrsiyar roj bi roj zêde dibin û civat jî têkilhev dibin. Rastî çîye û çewtî çîye? Sînorê zanebûn û cehaletê li kûderê ji hev vediqetin? Mirov wê çawa karibin genim, ceh û zîwanê ji hev veqetînin?

Carna pîrskirin destpêka alametên başiyê ne. Bersiva pîrsan pîrr caran di dîroka felsefê û ramanweriyê de heye. Heye û weke şeraba salan jî tahm girtiye. Lê mixabin pîraniya caran haya mirovan ji vê yekê tûneye. Bi taybetî civat û entellektûelên Kurdan, bi sedsalan ketine nav zexeliyeke kûr û dûr. Ewê dawîya vê zexeliya salan û xewa şêrîn kengî bê? Ez nizamim. Lê ez tişteki baş dizanim, divê entellektuelên Kurdan bi hemû awayî li fêrbûn û zanebûnê vegerin. Hatta ku entellektuelên Kurdan kultur, ilm û felsefê baş fêrnebin, ewê nikaribin xizmetên baş ji xelkê xwe re pêkêş bikin. Divê Kurd sifra welatê xwe ya zanyariyê û kulturê bi destê xwe raxînin!

Di dîroka felsefê û ramanwerî de cih û dema filozofê mezin Thomas Hobbes zêde girîng e. Thomas Hobbes di navbera salên (1588 - 1679) da jiyaye. Di xebata xwe ya ilmî de ew di bin tesîra Galîle û Kepler de maye. Thomas Hobbes di dîtina xwe ya felsefî de ampîrist e, lê dîsa jî entereza wî li hember ilmê matemetîkê pîrr xurt e. Di qirnê 1500 û 1600'î de filozof û ilmdarê navdar ku fikirandina matemetîkî û rasyonalizma ilmî diparastin, pîrr dûrî metodên ampîrîk bûn. Matemetîk û rasyonalizma ilmî karê aqil bû û ampîrîzm jî bi tecrûbe û praktîka mirovan ve gi-

rêdayî bû. Thomas Hobbes daxwaz dikir ku rasyonālîzma ilmî û felsefa ampîrîzmê bi hevdu ve girê bide. Di pîrraniya xebare xwe de Hobbes, gotina rasyonālîstî, matematîkî û geometrî bi felsefeyek cîvatî ve dihûnand. Di wî warî de pirtûka Hobbes ya bi nav û deng "Leviathan"e (1651).

Thomas Hobbes di zimanê klasîk de xwedî zaniyariyeke pîrr fireh bû. Di çardeh (14) saliya xwe de Hobbes dest bi wergerê kiribû û paşê jî wî Homeros werdigerand zimanê îngilîzî. Li universîta Oxfordê wî mantiqê skolastîk û felsefa Aristoteles dixwend. Di dîtinên xwe yê polîtîk de ew Monarşîst bû. Thomas Hobbes bi xurtî behsa zerar û tehlûkeyên demokrasî ji bona civatê dikir. Li gora dîtina wî demokrasiyê civat pûç dikirin. Lê di enyî wextî de Hobbes filozofekî materyalîst e û di pirsên felsefî de ew helwestekî radîkal digre. Di dîroka felsefê, kultur û ilm de, mirov dikare pîrraniya cara li vê nakokiyê rast bê. Helwestê felsefî û edebî yê radîkal otomatîkman tu cara nabin encamê helwestên polîtîk yê radîkal. Ma felsefa Hegel jî ne weha bû? Em dikarin vî mantiqî berdeham bikin û weha bibêjin; helwestên polîtîk yê radîkal jî tu caran tenê bi serê xwe nikarin bibin encamê ku mirov felsefe û edebiyateke radîkal û baş biparêze.

Hemû felsefa Thomas Hobbes li ser pîrrgirêka desthilat û bê desthilatbûna mirovan ava dibe. Dema ku mirov di qonaxa xwezayê de dijîn, wê gavê bê desthilatî hakim e. Di qonaxa xwezayê de ne mîr û ne jî şah hebûn. Dewlet, ji xwe jî binî de tunebû. Mirovê ku di qonaxa xwezayê de dijîyan,

ji hevdu neditirsîyan. Ji ber vê yekê hewcedarî bi dewletê tunebû. Tîrsa mirovan ji şer û nemanê bû û ev jî bû encamê ku mirov desthilatekê avabikin. Li gora felsefa Hobbes ev desthilat ewê mal û canê xelkê bihimanda. Di qonaxa xwezayê de hemû kesan dikarîbûn bi hevdu re şer bikin. Kes û hêzên ku bikarîbana navcîtî bikirana tunebûn. Ji ber van encaman jî mirovan li hevdu kirin, bi hev re peyman çêkirin û bi vî awayî jî dewlet ava kirin.

Li gora vê felsefa jorîn mirovan ji ber encamên tîrsê, egoîzmê, ez ezîtiyê û daxwaziya desthilatê li hevdu kirine. Li gora vê felsefê mirov bi giştî xweparêz û egoîst in. Hobbes dibêje ku mirov ji ber tîrsa kuştinê li hevdu dikin. Encamên nakokiyên di navbera mirovan de bi giştî bîngêhên xwe ji psikolojiyê çewt digre; bi hevdu re qayîş kişandin, namûs û şeref parastin, bi xwe ne bahwerkirin dibin encamê ku mirov bi hevdu re şer bikin. Mirovê ku dixwaze tiştekî qezenc bike, êrîşî mirovê din dike. Mirovê ku bi xwe bahwer neke, hewcedarê xweparastinê ye. Mirovê ku daye dû şeref û namûsê li dengê xwe digere, ûhw. Pîrraniya caran ev praktîka han dibe encamê ku mirov zorê li hemberî hevdu bi kar bînin...

Felsefa ku Hobbes li vir behs dike, di dîroka felsefê û dîroka ramanî de, di bin navê "felsefa peymanê" de tê naskirin. Îngilîzekî din yê bi nav û deng John Locke û li aliyê din Jean Jack Rossueau jî ev felsefa peymanê diparastin. Rossueau bi navê "Contract social" ango "peymanên sosyal" pirtûk jî çap kiribû. Bi kurtî ev felsefa han vê yekê dipa-



Thomas Hobbes

rêze; bi peymanî civatî re mirovan heqqê desthilatiya xwe dewrî dewletê, şah an jî xweserekî (egemen) kirine.

Mirov raste rasta nikare ji felsefa Hobbes hereket bike û navekî baş lê bike. Ma gelo Hobbes bi derd û kul e, sînik e (Cyniker) an jî îronîk e (qerfok e)? Bahweriya xwe bi mirovan nayine? Hobbes bi xwe ne di wê bahweriyê de ye. Ew bahwer dike ku rastîya civatî û psikolojiya mirovan weha ye. Li gora Hobbes mirov egoist in û ev jî rastîyeke dîrokî ye.

Lê bi bahweriya min mirov tu cara nika-re felsefa Hobbes ji civata Ewropayî ya ku di qirnê 1500 û 1600 hebû îzole bike. Di vê demê de mutlaqiyeteke pirr xurt li Ewropa heye. Hobbes dixwaze ku ji aliyê îdeolojî

de vê mutlaqiyeta polîtîk meşrû bike. Dîtin û felsefa wî bersiva rewşa polîtîk û ekonomiya Ewropa dide. Civat û Felsefe ji hevdu nikarin bêne cihêkirin. Çînên serdest yê İngilistanê teorî û îdeolojiya Hobbes bi kar tanîn. Dîtinên Hobbes li ser dewlet û desthilatê dikevin nava tevgerê daneke civatî. Wexta ku Hobbes Şahîtiya İngîlîztanê diparêze, ew yeka ne bûyereke tesadûfî ye.

Hobbes bi qederê bahwer dike û detemînîst e. Ji xwe felsefa wî jî li ser vê yekê ava dibe. Lê di teoriya li ser zanebûnê de Hobbes materyalist e. Li gora wî zanebûna mirovan ne ji ba Xwedê te. Zanebûn ji tecrûbê tê. Ma ku ne weha ba, ewê çima mirovan peyman bi hevdu re çêkirina?

Dîtinên Hobbes yê li ser mirovan qet

naşibin dîtînên Platon û Aristoteles. Dîtînên Hobbes ji xwe tu caran naşibin yê Încîl û Fileha jî. Platon û Aristoteles behsa hewcedariyên cîvatî dikirin, lê belê Hobbes behsa psikoloji û tirsê dike. Platon û Aristoteles di avakirina dewletê û beşkirina kar de, behsa hewcedariyên sosyal dikirin. Ji bona mînak mirov dikare bêje ku parêzgerê dewletê li ba Platon, ji bona dewletê baş bikin, dikarin xwe feda bikin. Parêzgerê dewletê nikaribûn berjewendiyên şexsî an jî qezenca şexsî biparêzin. Lê piraniya felsefa Hobbes li ser hîmê tirsê û berjewendiyên şexsî ava dibe. Li gora Hobbes tevgera şexsan binhegê xwe ji egoîzmê digire. Encamê ku mirovan dixin hereketê, encama xweparazîtinê û tirsê ye.

Li gora Aristoteles mirov heywanê sosyal in. Hobbes bi xwe li dijî vê yekê jî radiweste. Ji ber ku li gora Hobbes, heywan nikarin ji bona şeref û namûsê bi hevdu re qayîşê bikişînin. Heywan dîsa nikarin ferqê bixin navbera berjewendiyên giştî û yên şexsî. Heywan ji aqil jî mehrûm in. Ji ber vê yekê jî ew nikarin tiştan kategorîze bikin. Heywan, ji hunera peyvê jî bêparbûn, ew nikarinbûn heqaretê li hevalbendê xwe bikin. Di dawiya dawî de alîkarî û hevgirtina heywanan tişteki xwezayî bû, lê belê alîkarî û hevgirtina mirovan jî bi riya peymanan pêkdihat.

Ferqeke mezin di navbera dîtînên Hobbes û îdeolojiya Filehtiyê de jî heye. Li ba Filehtiya ku xwîn û koka xwe ji Hz. Îsa digre, mirovanti û şîrikanti heye, lê li ba Hobbes egoîzm û materyalîzm hakim e. Dîtina filehtiyê li ser mirovan dîtineke ma-

newî ye, lê belê Hobbes xwedî dîtineke mekanîk e. Di filehtiyê de armancên manewî hene û tevgera mirovan jî li gora van armancan dimeşe.

Di dema ku Thomas Hobbes dijiya, ramanên hakim di civatê de dîtînên Platon û Aristoteles, an jî dîtînên filehtiyê bûn. Di jiyana polîtîk û ilmî de ev herdu xettên ramanî hegemonya xwe li ser hemû xalên civatê danibûn. Felsefa Thomas Hobbes bi van her du xettên ramanî re dikete nakokeyê.

Baş e, mirov dikare dîtînên Hobbes çawa şirovebike?

Li ser dîtînên Hobbes yê teorîya polîtîkayê pirr tişt hatine nivîsandin. Civata ku Hobbes behs dike ne civata antîk an jî civata feodal e. Hebe hebe ev civat, civateke kapîtalîstî ya qels e. Danûstandinên bazarê li vê civatê baş pêş neketine. Di sedsala 1500 û 1600'î de li Ewropa Şahên mutlaqiyetî hakimî civatê bûn. Yekî ji van Şahên xwe-cibandî digot ku, "dewlet ez im!"

Dîtin û felsefa Hobbes li ser tirsê demokrasîyê û parastina Şahên mutlaqiyetî ava dibe. Ji pirr aliyên de dîtînên Hobbes û Makyavellî dişibin hevdu. Armanc, parastina desthilata polîtîk e. Makyavellî dixwaze vê yekê bi fen û fûtan bi cih bîne û Hobbes jî behsa tirsê û anarşiyê dike. Dîtînên her du ramanweran, di pirr aliyên de bûne merral ji bona dewlet, Şah û dîktatoriya polîtîk. Di van dîtînan de durûtiya polîtîk bûye pîvana bingehîn.

Ma di warê polîtîkayê de durûtiya polîtîk, îro jî ne problemeke pirr girîng e? ■

MİROV

Can Gülşenoğlu

Min mirov nas kirin
 dest bi desta
 çav li çava
 lêv li lêva
 lê bi kîlometreyan
 ji hevdû dûr

Û min mirov naskirin
 her yek li alîkî dinê
 yekî bikira pise pis
 yê din bibîhîsta...

Hêziran - 1989 Istanbul

PIRSÊN BI WEXT...

Ez li zemanekî bi bext
 Li pey pirsên bê bersiv
 Û bi wext ketime...
 Va pirsan
 yan wê min bikin
 Şairekî xwedî text
 yan jî mecnûnekî
 bi teqet...

12.06.1995 Frankfurt

RASTHATIN

Ji ber ku wê koma Qazê biçûya bajarê wê yê zarokiyê, Jew xemgîn bû. Rast e wê ji zû ve dixwest here wî bajarî, lê carê tiştek dibû asteng, karekî bi lez çêdibû û çûyîna wê her car bi şûn da diket. Him jî du dilî bû: Em bêjin rabû, çû, lê wê here mala kê, bal kê? Wê çawa weke turist here bajarê zarotiya xwe, li mêvanxanê bimîne? Ev fikir di serê wê de bi cîh nedibûn.

Û niha, bi hogirên xwe, artîstên koma sîrkê re teyayî diçe wî bajarî.

...Berbangê wê bigihîjne cîh. Qazê demeke dirêj ketibû nav nivîna, lê xewa wê nedihat. Mitalan tebatî nedidayê, xwe kêlek, kêlek weldigerand, lê tu çare nedibû, xeman dest jê nedikişand. Lema jî ji bo hogirên xwe hişiyar neke, dîsan kincên xwe avêtine ser xwe, derkete sivdera tirênê û li ber paca vagonê rûnişt.

Derve hîveron bû. Dar, xanî, av, çiya û banî di ber pacê re derbas dibûn û bîranînên zarotiya wê vediresandin.

...Qazê bav nedît. Ew şeş mehî bû, gava bav çû şer û hew êdî vegeriya. Piştî çend salan dê nexweş ket û mir. Mirina dê timê di bîra Qazê da bû. Çend rojan, êvaran, gava Qazê dikete nav cîh, wekî razê, jinika cînar dihat û li kêleka wê rûdinişt. Lê Qazê ne dixwest razê, hema wisa zare-zara wê bû gazî diya xwe dikir. Jinikê berê dixwest wê aşt bike, lê paşê bi xwe jî tap ne dikir û heta dereng bi Qazê re digiriyan.

Di dû dê re Apo kete bîra wê, mêrekî deve-devî şêst, şêst û pênc salî, ku lingekî wî seqet bû. Apo hewşa wan gêzî dikir. Rojên Apo gişk mîna hev bûn; wî berê bi gê-



Tosinê Reşîd

ziya xwe ya dirêj hewş gişk paqij dikir, paşê destên xwe dişûştin, bi destmaleke mezin, ku timê di beriya wî de bû, ziha dikirin û diçû, li bin dara çinarê rûdinist. Qazê hingê bi xwe nêzikî wî dibû. Wî şûsekî vala ji beriya xwe, ya mezin, derdixist û Qazê dişande avê. Heta wê av dianî, Apo nanê taştiya xwe, yê di nav destmaleke qerqas de pêçayî, vedikir û herduyan bi hev re taştê dixwarin. Di dû taştê re Apo şikirbûna xwe ji Xwedê dianî, wekî wê rojê jî risqê wî dayê.

Her roj awa bû.

Rojekê jî sîrk hatibû bajarê wan. Çend zarokên cînanan çûbûn, dîtibûn û ji sibê heta êvarê di derheqa wê de digotin. Qazê çavên xwe mezin vekiribûn û guh dida wan. Wê jî dixwest here sîrkê, wê jî dixwest wan şêr û pilingan, hesp û meymûnan, wan jinên difirin, bi çavên xwe bibîne. Wê êdî di xewnên şevan de jî sîrk didît. Rojekê jî tap nekir û ji xatiya xwe dirav xwestin. Xatî hêrs ne bû, wê bi teherekî bi gazin gotê:

– Ê, lawo, ka me têr xweriye, wekî îcar herine sîrkê.

Qazê di quncekeke malê de qincilî û giriya.

– Tuyê hişbî, yanê ez ê rabim,– mêrê xatiyê, ku teze ji kar hatibû û di ser şivê de bû, bi ser wê de hêrs bû. Rast e wî tu caran destên xwe hilnedabû ser Qazê, lê Qazê didît ew çawan li jin û zarên xwe dixê û gelekî ji wî ditirsiya. Lewma jî bilind giriya, bû îske-îsk û hêstir kişiyane hundur.

Avayê sîrkê li taxa wan bû û roja dinê Qazê çû ber derê xaniyê sîrkê û xwest bi merivên mayîn re bikeve hundur, lê nehiştin. Wê bi her teherî dixwest tişteki bike, bikeve hundur, lê ji wê re li hev nedihat, dema dinihêrî bilêta wê tune, ew bi şûn de vedigerandin. Ew ê hê demeke dirêj li wira bima, eger ew jin û mêrên çavsût nebûna. Ew hinekî ji dêrî dûr bi jinekê re dipeyvî, gava jinika koke berdêrî, ku li bilêta dinihêre, carekê jî Qazê tev da û bi ser de qîjiya:

– Min ji te ra negot ji vira here, tu careke din jî nêzik bibî, ez ê lingê te bişkênim.

Bû kûrîniya Qazê û li ber dêrî qincilî. Mêrikê çavsût tişteki ji hogira xwe ra got, nêzikî Qazê bû, bi destmala xwe hêstrên wê paqij kirin û jê pirsî:

–Tu dixwezî herî sîrkê?

– Erê, ez gelekî dixwazim,– dîsa kela Qazê rabû.

– De wekî usane negirî, li vir raweste, em ê niha bi hev re herin.

Xêlekê bi şûn de wî bi hogira xwe, ya çavsût va bi destê Qazê girtin û birne hundur. Jinika koke ber dêrî çavên xwe li Qazê cinû kirin, lê tişt negot. Çavên Qazê, yê hê jî bi hêstiran va tijî, diçûrisîn.

Piştî ketine serayê, wan Qazê li kêleka jinekê dane rûniştandin, temiya wê dane jinikê û bi xwe çûn.

Sîrk destpê bû. Çi ecêv bêji, wekî Qazê nedîtîn; hirçên govend girtibûn, şêrê di nav xeleka agir re baz dida, kûçkên bi ewtîn distiran. Çavên Qazê ji şabûna diçûrisîn, wê destên xwe usa li hev dixistin, ku xêlkên li dor û bera wê rûniştibûn gişka lê dinihêrîn.

Lê ji nişkê ve ew jin û mêrên Qazê bi xwe re anîbûn, derketine ser dikê. Kincên xwe guhastibûn, kincên sivike, birqok li xwe kiribûn. Qazê ew nas kirin. Wan carekê, duda temene dan ber serayê, paşê bi nêrdewana şîrîtê ji ban dardakirî va bi lez hilkişayan. Gava gihîştine bin arîkê xwe bi darekî ji arîkê ve dardakirî girtin û nêrdewana şîrît berdan.

Bêhna Qazê çikiya bû, ditirsiya ew bikevin. Bêyî hemdê xwe rabi-bû şipiya û bi çavên mezin vekirî li wan dinihêrî. Lê xema wan nîn bû. Mêrik carna hogira xwe hevraz davît, wê di nav hewê da çend cara fitle didan û dîsan bi ser destên wî de diket. Di dû re bi lingekî rabû ser serê wî, paşê destekî xwe da ser serê wî û li ser destekê rawestiya û gelek ecêvên mayîn.

Gava ew hatin xwar, ji şabûna hêstir ketine çavên Qazê.

Jinika ku Qazê li kêlekê dabûn rûniştandin jê pirsî, ka ji bo çi bi tenê hatiye, bi dê û bavên xwe re nehatiye? Qazê ji wê ra got, ku dê û bavên wê tunene, ew li bal xatiya xwe dimîne.

Ew mêr û jina çavsût, ku Qazê bi xwe ra anîbûn û qasekê pêş li ser arênayê bûn, hatin. Jinka li rex Qazê bi zimanekî nenas ji wan re tiştê got. Çavsûta, ku gavekê pêş mîna kevotka di nav hewê da perwaz dida, destê xwe di stuyê Qazê re bir û jê pirsî:

– Hi, xweş bû?

Qazê hewas, hijmerkar li wê dinihêrî, wê bawar nedikir, wekî ew artîsta, ku di sîrkê de tiştên usan dikirin, dikare kema usan tiştan ji wê pirs bike, destê xwe di stuyê wê ra bibe. Bextewariya Qazê bê ser-robin bû. Wê xwe bi serbilindî bi milê jinikê ve guvaşt û bi erênî serê xwe hejand.

– Tu jî dixwezî bibî artîsta sîrkê?– Jinik ji wê ra beşirî.

– Ez nikarim.– Qazê hêdîka got.

– Min jî berê nikaribû, paşê ez hîn bûm, tu jî dikarî hîn bibî.–Jinik usa bi wê re dipeyivî qey bêjî hevalên hev yê çend salan bûn û wê yekê kêfa Qazê tanî. Paşê wê destê Qazê berda û demeke dirêj bi mêrikê hogirê xwe re bi dengê nizim dipeyivîn. Jinika kêleka Qazê bi destê wê girt û hinekî ji wan dûr bir. Ew hinekî peşmorde bibû, metel mayî guhên wê li ser wan jin û mêran bû... Wan jî tê bêjî gotina xwe kirine yek û ber bi wan hatin. Jinikê bi beşer Qazê hemêz kir û gotê:

– Em herin mala xatiya te?

– Em herin, Qazê bi carekê ve destê wê kişand. Wê texmîn kir zarê cînara wê çawan dilhavêjiya xwe bi wê bînin, gava bibînin van artîstîtan çawan bi destê wê girtine û têne mala wan.

– Jin û mêrê çavsût ji xatiya Qazê ra gotin, wekî zarê wan tunene û dixwezîna Qazê bi xwe ra bibin û bikine keça xwe. Xatiyê berê nexwest, hêstir ketne çawan, lê paşê Qazê hemêz kir, bû kûre–kûra wê girîya û got:

– De bibin, qet nebe wê ji vê tunebûn û zelûliyê xilas bibe.

...Paşê Moskva, mala nû, dibistana sîrkê...

Û niha, Qaza li van kolana sêwî, çawa wek artîsteke bi nav û deng vedigeriya bajarê zarotîya xwe.

...Sera kimkimî bû. Qazê ji pişt perdê mêze dikir, dixwest dêmên nas bibîne, lê kes nekete bîra wê. Dora wê hat. Gava navê wê gotin, ji destlihevixistinê girmîn ji serayê hat. Bajarî bi hemwelatîya xwe şa dibûn. Dilê wê zû–zû avêt, hêstir ketine çawan; “usane bajarê zarotiyê ew ji bîra nekiriye”.

Karkeran daholeke mezin anîn danîne arênayê. Qazê bi rêvaçûna sivik ji pişt perdê derket. Dîsa bû girmîniya çepikan. Qazê serbilind, bi dêmê vekirî, bi beşereke xweş derkete ser arênayê. Xeml û xêza kurmanciyê lê bû. Xizêma pozê pîjîn, bazinê zîvî bi kevirên hêşîn qaşkirî, xirxal û moriyên reng–rengî rewşa nuhbûka didanê. Ew hêdfika nêzikî daholê bû, qasekê li ber rawestîya, carekê jî ber serayê temene da paşê bazda ser daholê û...”Cîrîd” lêda. Bi reqasa xwe.

Bi hezara merivan bi teqla lingên wê destên xwe li hev dixistin. Sera bibû orkêstreke ji hezar sazbandî û wek xwestina dîrîjor “Cîrîd” lêdida. Dîrîjor Qazê bû. Qazê li ser daholê direqisî û bi reqasa xwe awazekî batîni dihinart. Ew jî awazekî çawan! Bibû agir, alav, reqasa wê gihîştibû hostatîke usan, wekî hogirên wê, yê salên dirêj ew li ser

arênayê didîtin, şaş û metel mabûn. Çi ku Qazê îro dikir, tişteki ne-
bînayî bû.

Qazê ji hisreta bajarê zarotiya xwe, ya melûl, direqisî.

Dema reqasa wê qediya, dîsa bû girmîniya çepikan, hemû
mirovên li serayê rabûn ser piyan. Qazê di xwîdanê de bibû av. Wê
li ber serayê ser hev temene dida û dixwest xwe gavekê zû bigihîne
pişt perdê, qet nebe xwîdana xwe paqij bike. Lê sera zendegirtî dest
ji wê nedikişand, destên kulîlka bûn, di ser wê de dibarîn. Qazê hey
li vî alî, hey li wî alî difitilî, temene dida, serê xwe xwar dikir. Lê ew
ber bi kîjan alî dizivirî, çepikên wî alî zêdetir dibûn.

Sera gişk şipiya bû. Qazê destê kulîlka di dêst da kulîlk yeko-yeko
diavîtne serayê. Ji nişkê ve çavên wê cêrga sisiya ket. Mêrekî rîspî di
ciyê xwe da rûniştibû û destên xwe li hev nedixistin. Destmalek di
dêst de bû û zû-zû destmal ber bi çavên xwe dibir, hêstrên xwe paqij
dikirin.

Baqê simêlên palikiye çîle qerqaş ber pozê beranî bûn. Qerçomekê
kûrdême wî, yê qemer sor kiribûn û di nav wan qerçomekan de co-
tek çavên bi hêstiran tijî diçûrisîn.

Qazê ew simêl nas kirin, ew poz û çav nas kirin û dewsa here pişt
perdê, peyayî serayê bû û ber bi kalo ve lezand.

– Apo!

– Lawo!

Wê xwe avête pêstra kalê, bû kûrîniya wê, giriya. Bi xwe jî nizani-
bû ji bo çi digirî. Kalê bi destên xwe, yên jar, serê wê hemêz kiribû
û porê wê tîmar dikir.

Paşê destmala çîle, qerqaş ji beriya xwe derxist û hêstirên wê paqij
kirin.

Kesên nû derketibûn ser arênayê, mêrekî qamçî girtibû destê xwe
û bi hukmê wî du şêran di nav xeleka agir re baz didan. Lê kesî li
arênayê nedinihêrî. ■

JINA KURD Û BARÊ GIRAN...

Xelîl Duhokî

Nezîre Ehmed (Deyka Dalya) di sala 1955-an de, li havîngeha Sersîngê ji dayik bûye. Heta bi navinciyê xwendiyê. Her ji sala 1978-an û vir de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di festîvalên edebî de jî xwendine, lê hêştî çî dîwan çap nekirine. Niha jî li Kurdistanê başûr e.

Dijminî berdewam rê li ziman û çanda kurdî girtiye û nehêlaye pêş bikeve. Lewra nivîskarên delîve nedidîtin ku rola xwe ya girîng bilîzin. Gelê kurd li benda rojeka nû bû ku, perdên tariyê ramale û bigehe azadiyê. Belê; xewn bûne rastî, millet bi serhildanê rabû û hêzên faşîzmê ra-reqandin. Lê Nezîre Ehmed bi axîn dibêje:

– Berî serhildanê, delîva belavkirinê ne pirr bû. Nivîskarên li bin perdên sembola ve xem û derdên gelê xwe dikirine helbest û berhemên din. Dijminî rê girtibûn, nemaze li ber jina kurd. Piştî serhildanê jî, nivîskarên me di sala yekê de, roleke mezîn lîstin û têhna xwe şikandin, lê



Nezîre Ehmed

mixabin ew hêvî û armancên wî bi cî nehatin û giriftariyên siyasî, civakî û aborî li Kurdistanê, dergêhên pêşketinê dîsan girtin!

Piştî salên bindestî û sîtema dijminî,

Kurdistana başûr rizgar bû. Ronahiyê xwe havête hemî aliyên şewitî û wêrankirî. Li tevaya welatî şahî û govend hatine girêdan. Lê ev xweşî binax bû, çinku şerê birakujiyê birîn kûr kirin. Nezîre bi dilekê şikestî dibêje:

– Em hemî dizanin ku şerê birakujiyê, ne di berjewendiya gelê me de ye. Çinku eger ev delîve ji destê me çû, êdî vegera wê zehmet e. Lewra divê gişt nivîskar helwêsta rast û dirust wergerin û berhemên xwe nekine xizmeta çî partîyan. Her wesa ya fere ku destnîşana kêmasiya bikin û li dijî binivîsin.

Jin nîva civatê ye û ew civata rê nede jinê û nehêle rola xwe bilîze, ew pêşnakeve û nagehe bajarvanîyê. Belê; di nav civata kurdî ya paşketî de, giriftariyên jina kurd gelek in. Helbestvan Nezîre Ehmed li ser vê meselê jî dipeyive:

– Dibêjin ku jin nîva civatê ye, lê mixabin hêsta qeyd û zincîrên di dest û lingên jina kurd de, nehatine şikandin. Ji ber milletê kurd yê di bin barê eşêrtiyê ve, rewuşt û adetên kevin rê li pêşketina wê digirin. Ez dibêjim ku her çend jina kurd pêwîstî bi alîkariya zelamî jî heye, lê ew pêşnakeve, heta ku ew bi xwe berevanîyê ji xwe neke û astenga neşkêne.

Nezîre Ehmed, di nav rêzên Yekîtiya Afretên Kurdistanê de xebatê dike. Helbestvaneka serketîye û bi doza gelê xwe ve girêdayî ye. Bi rastî jî barê jina kurd giran e. Ew dayik e, karker û şoreşger e.

DILÊ BÊZAR

Ew hozana bi xûna dilê xo

Min bo te vehandî

Ew tevnê

Bi hizr û bîra min raçandî

Hizar çîrok ji eşqa te

Kirine pirtûk

Min çap kirin

Belav kirin

Viyana te di dilê min da

Hêdî hêdî zer dibît û diçirmisît

Bi gotinê te yê wêkî tîra tijî jehir

Min dikujîtin

Evîna te di dilê min da mişext dibît

Hozanê min di destên te da êxsîr dibin

Ew tevnê min raçandî

Tevinpîrka tevnê xo li ser raçandî

Ew çîrokê min nivêsin

Xêrkê mala xo di nav dana

Di ser hindê ra

Dilê minê birîndar e.

Dinalîtin. Digêrîtin...

Nezîre Ehmed

TIRSA MIRINÊ Û KEÇA MUXTÊR

Bêyhanî Şahîn

Ma hun dizanin, di dinya zarokekî piçûk da ew demên xweş û yên ne xweş çawa derbaz dibin? Naa! Bi navê pirtûka Yezdanê mezin, kesê ku wê bikaribe bersiveke “erê” bide jî, heger bi min be ew ê ne ewqes bi nixdar be. Di jiyana merivahtiyê da demên ku zarokan li ser daxwaz û kirinên we biryar girtine yan ji xwedî biryargirtinê bûne, tiştê ku em rastê bêne, nîne. Di vî warî da terora mezinên me yên ku li van gulekên xweşik û şîrnok hatine kirin, bila Yezdanê mezin li wan mezinan yek bi yek bipirse. Bexş ji Xwedayê min ê dilovan, lê hema ev lêdanên, bê mafiyên ku li van çiçekên pêşerojên me yên reben hatine kirin û hê jî têne kirin, keritî him jî zirkiritî nîne jî çi ye? Di cîhana kulîlkên me yên paqij da, ma qey hun dizanin ji bo insanîyetê çi fikirên mezin û bilind, wek fişengên di lûleya tîfingê da yek bi yek dihejmêre, derbaz dibin.

Çaxekê ez jî wek her zarokekî, zarokekî piçûk, xweşik, şîrnok û ji bilî van jî gelek bi hereket bûm. Her çiyes ez di dema za-

roktiya xwe da wiha bûm jî, diyariya ku her zarok li gorî xwe xwediyê rewşên wisa û hin yên din ên taybetî ye.

Bi rastî nizamim kîjan sal bû û ez hê çend salî bûm, min gelek bi xembar li jiyane te-maşê dikir. Dibe ku ew sala ji derketina zivistana sala 1973'an yan jî sala 1974'an be. Li gorî van tarîxan divê ez di çar yan jî pê-nc saliya xwe da bûm. Belkî jî wê niha hinek kes rabin henekên xwe bi min bikin û bêjin: “Dev ji van gotinên xwe yên mezin berde” yan jî wê bibêjin “ewqes bilind nefikire.” Heger ji min bawer nakin, ma hun ji Yezdanê mezin jî bawer nakin? Ji Xwedê bitirsin! Kerem kin, ji Yezdanê min ê ezîz, mirovhez û mirovparêz bipirsin. Bê guman li hemberî van kirinên we yên bêrê wê Dilovanê Mezin bi hêrsa xwe ya mezin tofaneke wiha li we bixîne ku Xwedê neke, ji ber vê tofana bi heq, wê kesên bê gune jî ji canê xwe bibin. Kesên ku bi min dikenin, ji kerema xwe re bila carekê li dîrokê binêrin. Çi gotiyê mezinan, “jiyana derbasbûyî neynika rojên tèn e.” Gotinên ku kalikên

me gotine, ma qey derew in? Kesên ku ji dîrokê bêhay in, ma ew ê çawa maneya van gotinan fêhm bikin? Ew ê ji ku bizanibin, di van gotinan da, di nav her peyvekê da çend sed û çend hezar sal radizên?

Gava ez hatime dinê, hê nû merivahiyê peyk firandiye hîvê. Ji vê hêlê va jî, sala ku ez ji dayik çêbûme pir bi qîmet e. Ma çend kesên wiha seglawî henin ku, di vê sala hêja da zayibin? Ji derî çend miliyonan mixabin ku tu kes, serda jî di nav vê salê da di meha Gulan'ê da, di vê mehê da jî di roja yekemîn da, yanî roja karker û xelkên bindest da hatibe dinê. Ji ber vê yekê, ez xwe her tim, mîna kesekî bi siûd û serda jî wekî kesekî pir bi mezin dihesibînim. Niha wê hin kes bêjin, hesibandin tiştê e, lê bûyîn tiştêki din e. Herkes ji bo xwe hin tiştên nixdar û serda jî mîna te yê pîrozwer ji tunehiyê, ji nebûyînê diafirîne û demên xwe pê xweş dike.

Ez, merivê ku ji piçûktiya xwe da bi xwediyê ramanên wilo mezin im, ma qey bi gotinên wiha ne li şûnê, xwe biêşînim? Xwedayê dilovan meke! Ma ku min kir, ew ê ji ku ramanên biranînên zaroktiya min bi min va girêdayî bimînim? Li gorî min divê her zarokekî piçûk, di salên xwe yê mezin da, divê xwediyê ramanên qiciktiya xwe bibe. Bi gotineke din, diviyabû her merivekî mezin xwediyê fikrên xwe yê zaroktiyê biba. Jixwe, heger nebe jî wê bibe wek merivê herî derewîn li ser rûyê vê erdê.

Xwendevanên min ên ezîz û xwedî qîmet, birînên min pir kûr in. Ax, ax! Xwezî ez niha zarok bûma. Wê çaxê tadeyên ku me di dibistanên dijmanan da dixwar, bel-

kî jî nehatiye serê mirîşka qelandî. Ew çi jiyana bû bavoo! Ez niha naxwazim, bi bîranînên jî be, carek din li vir bînim bîra xwe. Ew çi kabûs bûn! Ez ê dev ji van bednaviyên berdîm. Çiku Yezdanê min ê ezîz wê rojekê li wan bipirse. Heger ji bîr bike jî ez ê bînim bîrê, dîsan nebû ez ê ji neviyên xwe ra wek daxwaziya min ya herî dawîn û peşîn vê tolê bihêlim.

Em dîsa vergerin destpêka zivistana sala 1973'an. Baş nayê bîra min, dibe ku wextê ber nîvro bibûya. Herder spî bû. Roj jî li ser berfa spî wilo dibiriqî ku, min bi zorî li hawfê dor temaşe dikir. Hewa jî pir germ bûbû. Tu kes li derdorê xuya nedibûn. Ez li ser riya pêş deriyê me li ser nigan, bi rewşêke bêhereket sekinîbûm. Mala me di navbenda du taxan da bû. Û li pêşiya mala me jî çemek ber bi jêr ve diherikî. Wê gavê, yanî gava ez li ser nigan li ber derî bûm, min bi xwe bi xwe ra, di mêjiyê xwe da ew ramanên mezin derbas dikir: "Çaxa ez mezin bibim; ez ê çawan di pêşerojê de jiyana xwe derbas bikim; ma ez ê ji vî gundî derkevim"; û ya herî dawîn û tîrşehêztir ya ku di mêjî û dilê her zarokekî û merivekî mezin da jî derbas dibe, "wê rojek bê ez ê bimirim", bû. Gelo dilê min ji vî alî va niha ji wê xelas bûye? Naa, naa birayên min ên bi şeref, ez bi serê gorîna kalikên xwe sond dixwim ku, hê jî ew kurma bi geşî, bi rikî wek cenewar di hundirê min da dijî. Tîrsa min ew e ku, ew ê dijminê her tiştê min, li dijî min, wê bi serkeve. Kijan camêrî ev şera ji wê qetandiyê, qezenc kiriye? Bi min, heger em vê pîrsê ji xwe nepîrsin, wê baştir û xweştir be. Li vê cîhanê hin tişt henin ku

meriv nikane bi zanîne lê bi zanîna bê zanîn dikare têk bibe. Ji binxistinê zêdetir, di rastiyê da xwe dixapîne. Heger em li ser qanûnên xwezaiyê nefikirin, bi ya min ew ê çêtir be. Kesê ku di nav dîrokê da li hemberî vê kambaxê serkeftinî bûye, min nedîye. Bi qasî ku ez dizanim, berî pênc hezar salan li ser erdê Mezopotamyayê, bi navê Gilgamêş xortek derketiye û xwestiye ku vê yarkujê bi xurtaniya xwe têk bibe. Bi alîkariyên Nûhê Kurd, giyayê dermanê mirinê di bin zeryayê da bi dest dixin. Siûd pir kambax e. Mirin ji wê jî kambaxtir e. Ew marê ku giyayê dermanê mirinê ji Gilgamêş didize û diçe, bêsiûdiya herî mezin e ji bo me ademzadan. Lê dîsan jî em bi hêviya “wê rojek bê ademzad vî şerî qezenc bike” bibêjin û demên xwe wek merivekî serxweş bibuhurin. Jixwe, tiştê ku em ji derî vê bikin, ji me ra nemaye.

Erê, li ber dêrî, ez di nav rewşeke wiha da bûm. Û ew fikirana... Êdî ez ketibûm nav ramanên bêbinî û bêdawî. Divê meriv carekê nekeve nav rewşeke wiha, êdî nikane jê xelas bibe. Ev rewşa, ji wê çaxê min fehm kiriye. Paşê, gava ez mezin bûm, min ew ramana di pirtûkên psîkologan da dît; baş rêgihîştim ku ew (mirin) pirseke, tirseke her însanî ye, heywanî ye, yanî giştî ye.

Bi vê tirsê bednav, gelek însan henin ku, bi salên dûr û dirêj bi hev ra dijîn. Ji alî dilovanîyê va tiştê ku wekî wê bê wijdan e, di xwezahiya vê valahiya da, ne mumkun e. Di mêjiyê gelek mirovan da wek dijminê herî yekemîn, şev û roj, her tim di emirdirêjiya wan da mîna brayê herî nêzîktir, silavê lê dide. Yanî gava meriv wê bîr dike,

sayku bednavê jê haydar bûye, derdikeve pêşiya me û bi hurmeteke pîroz “ez li vir im” dibêje. Axx, axx! Min çawa daxwaz dikir ku jê ra bêjim “ji çiyê min ra ku tu li vir î, bednav!” Ji min bawer bikin ku min nikaribû ev gotin jê ra bigota, ji ber tirsê ku wê hêrs bibe û di nav demeke kin da canê min ji min bistîne. Hê jî ew tirsê di hundirê min da, belkî jî, ji berê jî xurtir bi min va geş dibe. Bi rastî geştir jî dibe. Bila kes nekeve nav şikan, EZ Ê BI MIRINA XWE WÊ KAMBAXÊ LI BINXÎNIM.

*

Ji derî mirinê, dîsa demên min ên pir xweş jî wek ya her zarokêkî, pêkdihatî. Gava ez niha wan demên ku li gorî dilê min bûn, difikirim, bi vekirî behocokî dibim. Ma çima nebim ku? Camêrê ku wê çavnebariyê bi zaroktiya xwe meke, bi min be hê ji dayik çênebûye. Yê ku wê meke jî, kî dizane, ew ê pehlewaneke çawa mezin be. Ji bo vê pehlewantiya mezin, ez dibêjim ku, min hê jî dora xwe derbas nekiriye. Kes nizane, ku ez çawa ji Yezdanê mezin û dilovan daxwaz dikim ku min ji vê mehrûm neke, bêpar nehêle.

Çawa ku li her gundî muxter heye, li gundê me jî muxtarek hebû. Merivekî qelew, rûsar û nefesnexweş bû. Xwedê rehma xwe li wî bike, paşê ji ber nefsnexweşiya xwe çû ser dilovaniya xwe. Dîsa jî em lêborînên xwe jê daxwaz dikin, ji ber fikrên me yên ne baş yên di derbarê wî da.

Wê demê li gundê me gelek zar û keçikên piçûk hebûn. Me pîrî caran bi hev ra dilîst. Ma kî dikane bêje listikên zaroktiyê

ne bi tam in? Me bi hev ra pîrî caran bi veşartokê dilîst. Dîsa doxtortiya me jî, heger ne şaş bim, hebû. Lê mixabin ku ev lîstika doxtoriyê heta ku em ji gund koçbar ne bûbûn, hê baş nedihate zanîn. Belkî jî, hê wê demê em baş tene digêhiştin, ku lîstikeke wiha pîrozwer, seglawî, xweşik û şîrînok çêbikin. Ez wê wek nîrxeke pir bi mezin dihejmêrim, ku ez bi xwe ji wê bêpar mame. Bila Xwedê bêsiûdiyeke wiha dojehî neyîne serê tu zarokan. Ez her tim ji bo vê yekê ji Yezdanê min ê mezin ra diayên xwe dikim.

Rojek ji rojan em lawik û keçikên gundê me li taxa jorîn li hev civiyan û me dest bi lîstika pîrozwer, yanî veşartokê kir. Kîjan zarok dikare bêje ku, ez jê hez nakim. Her çiqas ez niha hewl didim xwe ku, ka kî wê demê sobedar bû, bînim bîra xwe, mixabin ku dîsan jî tu deng û awaz jê tune. Dibe ku ewqas ne giring jî be. Di nav gundan da, ji bo veşartok, ciyên ku herî baş in, ma ne axur û gom in? Ev rastiyeke dîroka veşartoka gundan e, wekî gundê me. Belê, hevalê-a sobedar gava çavên xwe girt û dest bi hejmartinê kir, êdî em kur û keç yek bi yek û bi taybetî jî cot bi cot li derûdor belav bûn. Li cem ciyê ku me bi veşartokê dilîst, dîsa çend heb axur û gom jî hebûn. Axx, Axx! Ma kî dikane girîngiya wan axur û goman, û serda jî bi taybetî di nav wan axur û goman da afirên ku ji bo zarok û keçikan maneyên ewqas pîrozwer, bilind, xweşik û zayende didin, bîne zimên? Na, naa! Bila kes ji bo bersîva vê namzetiyê meke. Ev bersîveke wisa pîrozwer e ku, bi ya herî kêr ji bo cîhana jiyana zarokan ew wilo ye; kesê ku wê bikaribe bibersivîne hê ji dayik ne-

afiriyaye.

Ew afirandin ji bo min jî xwediyê ramanên wiha bilind bûn. Çima nebe ku? Gava ez û keçika muxtarê gundê me û hin kur û keçikên din bezîn ketin axurê cîranê muxtarê me, êdî dema xweşik a cejna me destpêkir. Mala muxtêr li jorê êxur bû. Hê hevalê-a sobedar dihejmart. Êdî em bi cih bûbûn. Bila qet ew cih bûna me neqetiba.

Her lawikekî keçikek girtibû cem xwe; yan jî em dikanin bêjin her keçikekê lawikek bi xwe ra girtibû. Ez jî bi keça muxtarê gundê me va bûm û bi hev ra derbazî êxur bûn. Paşê, ji bo ku em xwe nedin xuyandin, em bi hev ra ketin, her çiqas ez ketin bêjim jî, hun bêjin em bi bejn û bala xwe dirêjî êxur bûn. Ew çi dirêjî bû yadê, tu kes nikare têbigihêje, ku ew çi xweşiyê be şîrove bû. Erê, pêşda keça muxtêr dirêjî êfir bû, li ser devûrûyê xwe. Paşê jî ez... Pênûsa ku peyva hîsên min ên wê çaxê bîne zimên li ser vî erdî hê jî peyda nebûye. Ew çi dirêjî bû Yezdanê min ê eziz, ew çi xweşiyê bedew bû. Êdî ez jî hêdî bi hêdî li ser keçika muxtarê gundê me dirêj bûm, ramedîm... Ew çi ramedîn bû...

Li ser keça muxtêr fîstaneke bi rengîn û çîçek hebû. Di nav wî fîstanî da jî beden û govdeya keçika muxtarê me hebû. Belkî jî ji ber vê yekê ye ku gava ez li ser yekê fîstaneke dibînim bi heziyeke bê şîrove şaş û matmayî lê temaşê dikim. Çavên min ji wê nikanin xwe biqetînin. Ew xuya min a sosret ne sûtê min e, lê sûtê fîstanê keçika muxtarê gundê me ye. Ez vî sûtê pîrozwer ji wê demê da bi qebûl im.

Dema ku em di nav êfir da bi hev ra, di

nav çosiyêke wiha da bûn, tu kes li derûdor nedihate xuyakirin. Heger ez ne şaş bim, divê dem paş nivro bûbûya. Hewa jî gelek germ bû. Dibe ku xelkê gund wê çaxê li zeviyên û ligel naxir û pezan bin. Wekî her gundekî, gundê me jî demên havînê ji bo karên zivistanê bi şev û roj dixebitiya û amedekariyên xwe dikir. Car caran me jî ji wê karê bê oxir payê xwe digirt. Di çalkên xwe yên ewqas piçûk da; siûdckc kambax ku li ser eniya zarokên Kurdan hatiye nivîsandin, me jî di nav xizmetên rojane da kar û barên xwe dikir. Ew destikên qicik, rûyên qilêr, ew rewşa ji zaroktiyê dûr, çî tesîrên xirab dianî serê me bedewên piçûk. Li gorî qanûna jiyana xelkê gund, hin caran me tiştên wiha qedexe jî dikirin. Ma ger kirinên bêqanûn jî nebûna, wê jiyane çî mane ji bo me bida? Bi saya wan kirinên ne bi qanûn, me dikarîbû hêrsa xwe vala

bikira, hedura xwe bianiyana.

Erê, li cem me zarokan tiştên ku bi bêqanûn dihatin kirin, ji bo salekê dibûn dermanê canê me. Car caran, her ku firsend dikete destê me, me ew bêqanûniyana çendcar jî dubare dikirin. Em dikanin bêjin, ji ber vê yekê bû ku, zivistan dijminê me hemûyan bû. Zivistanan me nedikarîbû lîstikên xwe yên pîrozwer ducar bikira. Lê xweşiya havînê xwediyê ciyekî taybetî bû. Ji bilî axur û goman, dîsa di nav daristan, çalan û mexan da jî me dikanîbû lîstikên xwe çêbikira. Bi saya demên havînê yên rind û xweş bû ku, me zivistan bi hêviya havîna tê, derbaz dikir. Ma qey hêvî nabe? Wê dîsan havîn bê. Em ê dîsan bi vêşartokê bilîzin. Em ê dîsan di afirên gom û axutan da bi ser hev dirêj bibin. Em ê bi nezaniyêke bi zanîn dîsan hevûdu hembêz û hez bikin. ■

Gelî aboneyên dilovan!

Va ye me sala 95'an jî dagirt. Bi vê hejmarê Nûdem çar saliya xwe dadigire û ber bi sala xwe ya pêncan gavan davêje. Mîna ku me di hejmarên berê de jî dabû xuyakirin, ku her abonetiyeke Nûdemê ji bo jiyandîna wê gavek e, hêviyek e, baweriyek e. Bi vê hejmarê re em karta abonetiye jî ji we aboneyên dilovan re dişînin. Ev karta han ji bo abonetiya 1996'an e. Em hêvîdar in, hûn ê tavilê abonetiya xwe bişînin û hevaleki/hevaleke xwe ku hûn jê hez dikin, ji bo diyariya sersalê bikin aboneyê Nûdemê.

Ji bîr nekin, Nûdem ya we jî!

HEVPEYVÎN BI GÎNA JACOBÎ RE

Hesenê Qazî

Hunermenda Swêdî Gîna Jacobî bi stranên bi zimanê kurdî dilê kurdan ber bi xwe ve kişandiye.

Hesenê Qazî: Gîna, digel ku demeke kurtî di ser kaseta te û hereweha di ser kilîpên te yên vîdeoyê re derbas bûye, lê di nava kurdan de dengê baş daye. Tu vê deskefîte çawan dibînî?

Gîna Jakobî: Ger muzîk û stranên min dilê kurdan xweş kiriye û kêfa wan aniye, dilxweşî û kêfa wan jî min dilşa dike.

Ez bawer im di aliyê nixandinê de ferqeke mezin di navbera guhdarên kurd û swêdî de heye. Ev kar jî min re palpişteker e ku divê hunermend xwe bi sînoran ve girê ne-de. Digel ku ez maneyên gotinên kurdî bi



Hesenê Qazî bi Gîna Jacobî re

tevayî fêhm nakim jî, lê bi min wilo tê ku maneya gotinên kurdî gelekî jî yên swêdî

bi hêztir in.

– *Bi qasî ku min di rojnameyan de li ser karyera te ya muzîkê xwendiyê, te bi muzîka klasîk dest pê kiriye. Motîva sereke çi bû ku te berê xwe da muzîka pop û rockê?*

– Malbata min, bîrên wan wisa bû ku gerek ez li ser xwendin û hînbûna muzîka klasîk berdeyam bim, lê di hemû jiyana xwe de min di ruh û canê xwe de muzîkeke din dibihîst û ji ber ku ew ne di jînê de bû, diviyabû min bi xwe ew biafiranda. Di mê-jî û ruhê min de melodiyên wisa hebûn ku dixwastin rûyê jiyane bibînin.

Tenê di van salên dawiyê de (ji sê salan û vir ve) ez pê hesiyame ku di muzîka min de hêzeke veşartî heye ku dikare mirovên ku hestên wan û ruhên wan bi hêz e, bihejîne û tesîrê li wan bike.

– *Cara yekem tu kengî derket sehnê û program pêşkêş kir?*

– Cara yekem gava ez derketim ser sehnê, ez pênc salî bûm. Hingî li bajarê Sundsvallê ji bo zarokan musabeqeyek çêbûbû. Diya min û pîrka min ev yeka han firsendeke mezin dîtî, da ez di musabeqeyê de bi ser bikevim. Lê gava ew tê bîra min, ez ji her deqîqeyê wê jî bêzar im.

– *Tu, tu carî di dilê xwe de poşman bûyî ku te berê xwe daye muzîkê?*

– Çi pîrseke bêmane! Ev eynî mîna pîrseke ku tu ji min bipirsî “Gelo ez poşman im ku bask û lingên min hene”. Muzîk beşek ji laşê min e. Xuya ye ku ez mecbûr nemînin, ez lingê xwe nabirim!

– *Tu ji kîjan rengî hez dikî?*

– Ji rengê reş. Rengên din şexsiyetên mirovan vedîşêrin. Lê rengê reş alîkariya mirovan dike ku mirov bi balkişandinên xwe

bawer be. Bi rengê reş mirov li pêş şertên jiyane li holê ye. Jin di rengê reş de naziktir in.

– *Tu çi pêwendiyê di navbera reng û melodî de dibîni?*

– Hê ji dema zaroktiya xwe de, gava min li piyanoyê dixist, min bi tenê ton nedibihîst, herweha min di nav her tonekê de rengê jî didît û min ew reng bi hev ve girê didan. Ji min re ecêb e ku kesên der û dora min nikarin van rengan bibînin!

Di muzîkê de, ya sereke ji min re ton e, ne lîrik û peyvên stranê ne. Li ba min ew ku melodî riya xwe derbasî ruhên mirovan dike û wan ber bi xwe ve dikişîne. Gava ez muzîkê dinivîsînim ez vê ji xwe re dinivîsînim. Pîr caran dibe ku gotinên stranên min reşbîn bin, behsa tişt û rûdanên neyînî bikin, lê melodiyên min pêçewaneyên peyvên in, ev yeka han dîsan min digihîne jiyane. Melodî, ji ruhê min re terapî ye.

– *Piştî temamkirina projeya xwe ya kurdî, tu niha jî li ser albûma xwe ya swêdî dixebitî. Piçêkî behsa wê bike!*

– Min ev kar temam kiriye, wê CD'ya min di meha oktobrê de derkeve. Di wê de yanzdeh stran hene. Herweha wê vîdeoyek jî derkeve bazarê. Min bi xwe li ser her aliyên vê kar kiriye. Ev cara yekem ku albûma min li ser navê şîrketeka ku ez jî şîrikê wê me, derdikeve. Naverokên lîrîkan min bi xwe tecrube kirine û ev jî ji min re terapiyek e. Berê ez bi boçûnên sermezînan muzîkê re pir diwestiyam. Wan mîna goryeyek kêrhatî li muzîka min dinêrin, ku mirov piştî dikanê biavêje û firê bide. Wê yekê enerjiyê mezin ji afirandina min ya muzîkê distand. Wan dixwastin ez li gora

dilê wan muzîka xwe çêbikim. He-
ra niha kesek di vê
de bi ser neketiye.
Ji ber vê yekê,
min biryar da ku
ez ê albûma xwe li
vir, li Sundsvallê
çêbikim. Ev çi ji
aliyê wextê kar ki-
rinê, çi muzîkva-
nên min, çi ji ali-
yê aborî ve, çi jî ji
aliyê jiyana û mal-
batî ve azadiyeke
nû dide min.

Berê ez mecbûr
dimam ku di salê
de pênc caran bi-
çim Stockholmê.
Lê niha ne wilo
ye, hîseke xweş e,
ku mirov piştî kar
biçe malê û razê.

– *Te di projaya
xwe ya kurdî de,
bi sê şeweyan stran-
nên kurdî gotine,
kîjan jî wan jî te
re hêsantir bû?*

– Bi şeweya ku
min strana “Fadi-
kê” got, jî min re hêsantir bû.

– *Gava min di meha novembra 94’an de
ji bo “Kanî TV” hevpeyvînek bi te re çêkiri-
bû û jî te pirsî bû bê kurdîya te çawa ye, te
gotibû kurdîya min tune ye. niha çi kurdîya
te heye?*



– Niha şeweyên kurdî jî min re têklekin
ji çîlek, krem û şeker.

– *Spas ji bo ku te wextê xwe ji me re vege-
tand.*

– Ez jî spasî te dikim û ji kovara Nûde-
mê re serketinê dixwazim. ■

GULÎSTAN



Gulîstan

Nûdem: Gelo em dikarin hinekî Gulîstana nê nas bikin? Gulîstan kî ye, ji ku ye, niha li ku dijî?

Gulîstan: Zehmet e ku mirov behsa xwe bike, lê ez ê dîsa jî hewl bidim ku hinekî xwe bidim naskirin. Ez li gundekî di navbera Wêranşar û Siwêregê de hatime dinayê. Ez heta şeş saliya xwe li wî gundî jiya

me. Paşê me mal bar kir Wêranşar. Li wir jî em deh salan man. Piştî wê jî ez hatime Ewrûpa. Yanî ez di şanzdeh saliya xwe de derketim Ewrûpa û ew roj ev roj e ez li Ewrûpayê dijîm. Niha jî mala me li Swêdê ye, ez li bajarê Uppsalayê bi kurê xwe Serxwebûn re dijîm.

– Tu di şanzdeh saliya xwe de derketî derveyî welêt û her di şanzdeh saliya xwe de jî bi hunermend Şivan re zewicî. Berî ku tu derkevi derveyî welêt me tu dengê te nebihîstibû, me bêtir dengê te bi derketina te ya derveyî welêt re bihîst. Gelo hunermendiya te bi derketina te ya derveyî welêt re dest pê

kir, an berê jî têkiliya te bi muzîkê re hebû?

– Mîna tê zanîn huner li Kurdistanê ne zêde populer bû. Bi taybetî hunera muzîkê li gelek deverên Kurdistanê tiştêkî neyînî dikate dîtî û hunermend jî kesên di civatê de endamê sinifa dudan an sisiyan bûn. Bi gotineke din, ne malmezî û esilzade bûn, lê belê qereçî bûn, mitirb bûn. Di civatek

weha girtî de geşbûna hunerê jî ne ewçend hêsan e. Ez jî ji malbateke şêx têm, ku xwe-diyê gelek mirîdan bûn. Di malbata me de bi erbanê qesîde û methiyeyên dînî dihatin gotin û diya min jî yek ji wan kesan bû an yek ji wan jinan bû ku bi dengê xweş qesîde û methiye digotin. Gotina diya min tesîrek li ser min jî hişt. Min jî car caran bi wê re, an jî bi tenê qesîde û methiye digotin û dengê min dihat e cibandin. Lê belê ev nayê wê maneyê ku min ji muzîkê fêhm dikir, an jî ez bi zanebûn li ser hunera muzîkê hûr dibûm. Biçûktiya min di der û doreke weha de derbas bû.

– *Te got kesên ku bi hunera muzîkê mijûl dibûn biçûk dikatin dîtîn, heta cihêkî şerm bû. Gelo ev ji bo jin û mêran eynî bû?*

– Ji xwe di civata kurdan ya kevin de, ji bilî hin tesadufên weke *Eyşe Şan* û *Meyremxanê*, huner ji jinan re şermek bû. Ger ji mêrên bi huneta muzîkê re mijûl dibûn re, mitirb an jî qereçî bihata gotin, ji jinan re gelek tiştên din dihatin gotin û gelek neheqî li wan dihatin kirin. Ji jineke esilzade û eşîr re ne hêsan bû ku bi hunera muzîkê daketa. Wek mînak, li herêma me çend jin hebûn ku di civatan de û di odayên gundan de distiran, lê belê kesê ew nas nedikirin, eşîreke wan ya xuyayî tune bû, ew bê-esil dihatin dîtîn.

– *Baş e, te got ku di mala we de muzîka dînî dihat e gotin û guhdarî kirin...*

– Ne bi tenê muzîka dînî, mesele diya min pir li *Eyşe Şanê* jî guhdarî dikir. Tê bîra min sêlika wê kirî bû û lê guhdarî dikir.

– *Lê belê te bi xwe çavên xwe bi muzîkeke dînî vekiriye. Yanî li mala we, di malmata we ya şêx de qesîde û methiye dihatin gotin û tu jî bi wan gihayî. Lê mirov qet vê tesîrê di*

destpêka hunermendiya te de nabîne. Ji muzîka dînî wêdetir, tu bi muzîkeke şoresgerî, serîhildanî û ya protestoyê derketî. Ji bo çî te hewcedariya muzîkeke bi vî babetî dît?

– Rast e, destpêka min ya muzîkê bi celebê ku te anî ziman, dest pê kir. Û diviya bû jî wilo bûya. Ji ber ku dema me, dema tevger û berxwedaneke xurt bû, diviya min jî mîna hunermendekê cihê xwe di wê berxwedanê de bigirta, ne bi tenê cihê xwe bigirta, herweha diviya bû min bi muzîka xwe jî di refê pêşî de cih bigirta. Wekî din jî protestoyeke civaka kevnar bû û di şûna wê de avakirina civakeke nû û bê sinif û berberî bû.

– *Wek me got, mîna muzîkê cara pêşî te li Ewrûpayê dest pê kir. Tu dikarî ji me re behs bikî, gelo tu cara pêşî kengî derketî ser sehneyê û derketina ser sehneyê ji bo te hîseke çawan bû?*

– Gava ez derketim Ewrûpayê, hejmara jinên stranbêj gelekî hindik bû, piraniya wan mêr bûn. Li Ewrûpayê hin xebatên grûp û partiyên kurdan yê kulturî û hunerî jî hebûn. Wan dixwestin bi riya hunerê jî xelkê şiyar bikin û vê yeka han jî destûr dida ku hunermend bi riyên çêkirina şevên kulturî derkevin ser sehneyan û bi stranên xwe hem temaşevanan bicoşînin, hem jî wan bêtir ber bi xebata siyasî ve bi-kişînin. Tu ya rastî bixwazî, hunermendiya min ne tiştêkî plankirî bû, bi tesadufî bû. Ji xwe xwendin û zanebûneke min ya li ser muzîkê jî tunebû. Lê cara pêşî gava ez li Almanyayê derketim ser sehneyê, stranên min bala temaşevan û guhdaran kişand, wan ji min re pir li çepikan xistin û çepikên wan hîsin hunermendiyê dane min. Her çiqas ez nebêjim piştî derketina wê şe-

vê bû destpêka hunermendiya min jî, dîsan ez bawer im ew bû tesadufek ku min di hunera muzîkê de xebata xwe berdewam kir. Tiştêkî din jî heye ku divê ez ji bîr nekim, ew jî alîkarî, piştgirî û teşwîqa nas û dostên nêzkî min bûn. Ez bawer im bêtir wan ez ajotim ser muzîkê. Ji bo berdewamkirina karekî piştgirî pir muhîm e.

– *Bi a te hez kirina kurdan ji muzîkê re çawa ye? Yanî nîşê îro, ji bo ku muzîka îro reuşa wan tîne ziman jê hez dikin, an jî bi rastî ji bo ku muzîkeke baş tête çêkirin jê hez dikin? Gelo têgihîstîneke muzîkî, çi ji aliyê hunermendên kurd ve, çi jî ji aliyê guhdar û muzîkhezên kurd ve heye?*

– Gava mirov çavekî davêje kultura kurdan, ji ber ku kurdan firsenda nivîsandina bi kurdî nedîtine û ji jiyana nivîskî bi dûr mane, wan her tim hisên xwe, kulên xwe, elemên xwe, kêf û şahiyên xwe bi riya muzîkê û stranan anîne ziman. Ez dixwazim di vir de mînakekê bidim, bi taybetî di şînên kurdan de, yanî gava ku hinek dimirin, jineke ku xisûsî li ser yê mirî distirê û stranên çêdike heye. Şerek ku di navbera eşîran de çêdibe, li ser egîdî û şervaniya şerkeran tê gotin, li ser mîrxasiyê tê gotin, li ser tirsonekiyê tê gotin, li ser hezkirin û evînê tê gotin. Bi kurtî di her şahî û şînên kurdan de stran heye.

Lê ji ber ku bazara kurdan ya muzîkê tune bû û civata kurdan civateke girtî bû, îmkanên pêşdexistina muzîkê jî bi şînor bûn. Ev muzîka gundî lokalîk dima û şansê wê yê ku li seranserî Kurdistanê belav bibe kêm bû. Ji ber ku wê çaxê ne radyo hebû, ne televizyon hebûn; ger hebûna jî deriyên wan ji kurdan re girtî bûn, îmkanên kurdan ku bikaribin xwe di wan de bînin zi-

man tune bûn. Lê digel vê jî, bi awayekî klasîk mirov dikare bibêje ku hunereke xurt di nava kurdan de hebû. Ew ne bi tenê stranbêj bûn, herweha listikvanên tiyatroyê jî bûn.

– *Te got ku di stranên kurdî yê klasîk de mijara evînê jî cihêkî digire. Lê belê berdewamiya evînê mirov di stranên kurdî yên klasîk de pir pêrgî stranên erotîk jî tê. Dibe ku mirov vê pîrsê ji hunermendekî mîr bike, ew bi celebêkî din bibersivîne. Gelo ji bo çi ewqas erotîzm, ewqas gotinên vekirî di stranên kurdî yên gelêrî de hene? Yanî hejmara vê celeb muzîkî ne yek û dudu ne, hema çi bigire, mijarên piraniya stranên kurdî yên klasîk erotîzm e. Tu dikarî mîna hunermendekî jin, sebebên ku di civateke ku di jiyana rastî de gelekî girtî û kevneperest e, ewqas bi xurtî erotîzm derdikeve pêş, bînin ziman?*

– Ez bawer im piraniya stranên bi vî babetî ji aliyê mêran de hatine gotin. Ji aliyê din ve jî, berî îslamê, di jiyana kurdan de, di stranên kurdan de lîberalîzmek heye. Yanî kurd, civata kurdan li hemberî nûyîtî û guhertinan ne ewqasî hişk bûn. Lê belê, divê mirov vê jî ji bîr neke, yên ku erotîzm dianîn ziman bêtir mitirb bûn. Ew jî kesî ji wan re eyb nedidît. Kêfa xelkê jî ji wê yekê han re hatiye û wilo belav bûye. Ger yekî cidî rabûya di civatê de tiştêkî wilo bigota, belkî pir eyb bihata dîtîn, loma civatê ew wezîfe dane wan însanên ku dikarin wê yekê bikin.

– *Lê mirov di gelek stranên de dibîne ku jin bi xwe jî dibêjin, heta ji bo ku hezkirên xwe bi dest bixin, an jî xwe bêtir ji bo hezkirên xwe balkêş bikin, pesnê sîng û berên xwe didin û wan pêşkêşî hezkirên xwe dikin. Yanî em dibînin ku ev temaya erotîzmê ji aliyê*

jinan ve jî gelekî hatiye bi kar anîn.

– Lê em nizanin gelo ev mêran li hev anîne, an jinan bi xwe gotine. Mirov di gelek stranên kurdî dibîne ku, mêt dibêje, keçê weha got. Yanî, ew li ser navê keçikê jî dipeyive. Îcar bi rastî keçikê weha gotiye negotiye, em nizanin.

– *Şika te ji wê ye ku wê mêt li pişt vê erotîzma di stranên kurdî de bin?*

– Nizanîm, lê mîna ku bêtir bêhna mêran ji vê temayê tê.

– *Baş e, bi taybetî ji salên heftîyê û vir ve, bi gotineke din, li bakurê welêt ji hişyarbûna kurdan û gurrbûna tevgera şoresgerî û kurdayetiyê û vir ve di muzîka kurdî de jî guhertineke bingehîn çêbûye. Muzîka kurdî ya îro ji aliyê tema û naverokê ve ji muzîka kurdî ya do hatiye birrîn. Muzîka evînê cihê xwe ji muzîkeke şoresgerî re hiştiye.*

– Di eslê xwe de, bingeha muzîka îro jî, dîsa muzîka kurdî ya klasîk e. Ew kesên ku îro dibêjin em muzîkeke kurdî ya nû çêdikin jî, dîsan ew ji muzîka kurdî ya klasîk xelas nebûne, praniya wan tradîsyonel in. Yanî ger tu vê sermayeya klasîk ji destê wan bigirî, tiştek di destên wan de namîne. Ew bi tenê gotin û mesajê diguherin, yanî ew bi tenê gotinên ajîtatîv lê zêde dikin, lê bingeh dîsa muzîka kurdî ya klasîk e.

– *Ma ev ne şaşiyek e ku mirov naveroka stranên sedsalane biguhre û gotinên vala têxîyê û bi vî awayî stranên kurdî yê klakîk biherimîne?*

– Me gişan ev şaşî kiriye. Ji ber ku sermayeke me ya zanebûna muzîkê tune bû. Ji me re gelekî hêsan dihat ku em bi tenê gotinên stranên biguherin û wan ji nû ve bistirên. Ji ber ku sazî û mueseşeyên me jî yê nê ku pêşî li vê yekê bigirtina tunebûn, ev şa-

siya han bi hêsanî dikarîbû bihara kirin. Ez bawer im, ev tiştê han ji feqîrî û ji nezaniya kulturê çêdibû û hê jî çêdibe.

– *Baş e, ji bo ku ew were guhertin û ev zanebûna kulturî ku tu behs dikî pêk were divê çi bête kirin?*

– Divê pir tişt werin kirin. Ger tu bala xwe bidiyê, îro dinya gelekî li ser kulturê radiweste. Gelek dewlet hene ku butçeyên mezin ji kulturê û bi taybetî jî ji muzîkê re vediqetînin. Yanî butçeyên ku ew ji kulturê re vediqetînin, ne kêmî butçeyên din in. Ew kulturê an jî muzîkê luks nabînin, berevajiya wê, ew tiştê bingehîn dibînin û loma jî butçeyê mezin ji muzîkê re vediqetînin. Tabî ez vê yekê ne ji bo welatên dinya sêyemîn dibêjim. Rewşa welatên dinya sêyemîn kêm zêde mîna rewşa kurdan e. Lê li Ewrûpa û li Amerîkayê, gelekî li ser muzîkê tete rawestandî û pir qîmet jî didîne. Çawa ku ji bo mirov bibe doktor û muhendîz xwendina dibistanê pêwîst be, ji bo ku mirov bibe muzîkkar jî xwendina dibistanan pêwîst e. Lê mixabin li ba me ne wilo ye. Ji bîlî çend kesan, piraniya muzîkkarên kurdan li ser mîrata awaz û stranên kevin hunermendiyê dikin.

– *Carinan ger yek stranekê bibêje û dengê wî an jî wê hinekî xweş be, civat wan teşwîq dikin, dibêje dengê te xweş e, çima tu kasetan çênakî. Bi rastî çêkirina kasetan bi tenê bi dengxweşiyê ve girêdayî ye, an jî zanebûneke din jî lazîm e? Pirsê min ev e, gelo hunera hunera muzîkê ewçend hêsan e ku her kesê dengxweş bikaribe kasetan çêbike?*

– Mîna tê zanîn, muzîk beş bi beş in. Muzîka klasîk, jaz, pop, rock, ya gelêrî û hwd. heye. Li Tirkiyeyê gelekî munaqeseya muzîka taybet tete kirin. Lê ez bi xwe ne di

wê baweriyê de me, ew muzîka ku ew jê re dibêjin *taybet* jî, dîsan bingeha xwe ji muzîka gel distîne, gelek motîvên muzîka gel tê de heye. Çêkirina muzîkeke nû ne tişteki hêsan e. Kesên ku dixwazin muzîkeke nû çêbikin, divê her tiştê xwe bi xwe çêbikin. Lê belê mirov dikare ji muzîka kevnar jî destkewtî bibe û wê bi pêş bixîne. Loma jî divê zanebûneke mirov ya kûr ya muzîkê hebe. Mirov dikare bi alîkariya hin enstrumanên nû şiroveyên xwe yê nû tevî bike. Lê divê mirov pir bi dîqet be, awazên kevin, stranên kevin bi gotinên nû yê vala xera neke. Bi a min divê mirov kesên ku dixwazin bi erzanî bibe hunermend teşwîq neke.

– *Carinan bi min wisa tê ku nemaze di van demên dawî de, di muzîka kurdî de ritm berî gotinê tê. Lê belê di muzîka kurdî ya klasîk de, gotin navend e. Yanî di muzîka kurdî ya îroyîn de, bi gotinên rijandîna xwî-nê, şewitandîna gundan, kuştîna zarokan, koçkirina kurdan, wêrankirina welêt, bi alîkariya çepîk û govendê tê gotin. Ev ji çi tê? Ji bo çi wisa ye?*

– Ev ji wê nezaniya ku me berî niha behs kir, tê. Awaz û muzîka govendan bi gotinên şoreşgerî û siyasî ve distirên. Gava rewş wilo be, wê şaşî xwe beloq nîşan bide. Ev jî bi ya min ji bo humora kurdan, ji bo kultura kurdan tişteki ne baş e. Ne bi tenê ne baş e, herweha tişteki xerab e.

– *Gava mirov guh dide muzîka kurdî ya klasîk, ew mîna meknatîzê mirov ber bi xwe ve dikişîne. Mirov rehetiyekê, bêhnberdanekê hîs dike. Mirov pê re digirî, pê re dikene. Mirov pê re dilşa dibe, pê re xemgîn dibe. Herweha mirov vê teşîra han, vê jidiliya han di stranbêjan de jî dibîne. Ew bi rastî pê re*

dijîn...

– Rast e, loma jî divê hunermendên îroyîn, çavekî biavêjin muzîka kurdî ya do û li ser wê bikaribin hîmekî xurt ava bikin. Bi rastî dengbêjên kevin bi stranên xwe guhdaran dibe dinyayeke din, bi gotineke din wan hîpnotîze dike.

– *Lê tişteki din jî heye, êdî em di demeke din de dijîn, dema bajarvanîyê; an jî dema komunîkasiyon û teknolojiyê. Jiyana gundîtiyê li paş dimîne, ji berdêla wê celebê jiyaneke nû derdikeve hemberî me. Yanî sinif û kategoriyên civatê karakter diguherin, li gorî vê jî stîla jiyaneke nû, daxwazên muzîkeke nû jî derdikeve holê. Di şûna muzîka yekdeng de, muzîka pîrredeng dibe daxwaz û armanca nivîşê nû. Gelo ji kurdan yê nû ku bixwazin bersiva vê demê bidin hene?*

– Belê, hene, yek ji wan jî kurê min e. Wî niha bi her awayî bala xwe berdaye ser muzîka nû. Ji ber ku kurd jî perçeyek ji dinayayê ne, divê ew jî di nava guhertinên dinyayê de bêne guhertin. Ne bi tenê ji aliyê şikil ve, bivê ne vî ji aliyê stîla jiyaneke ve jî têne guhertin. Ev yeka han xwe di muzîkê de jî nîşan dide. Divê wilo jî bibe. Ji ber ku îro bi hezaran, bi deh hezaran, heta ez dikarim bibêjim bi sed hezaran xortên kurdan li bajarên mezin dijîn. Ev nivîşê han daxwaza tiştê nû jî dike, ew nikarin di nava jiyana bajarvanîyê de, mîna gundiyan bijîn. Xwestekên wan, armancên wan, dinyaya wan cihê ye. Ez bawer im hunermendên ku bikaribin bersiva hewcedariyê wan bide, wê dîsa ji nav wan derkeve. Ji ber ku ez ne bawer im ku wê hunermendekî gundî, bi kulureke gundîtiyê li gorî daxwaz û hewcedariyê jiyana bajarvanîyê rabe.

– *Yanî di nava jiyana bajarvanîyê de, di*

stresa jiyana bajaran de, êdî hew muzîka folklorîk mirov têr dîke. Divê muzîkeke li gora vê jiyane hebe ku mirov têr bibe.

– Mirov dikare bibêje ku muzîk terapiya ruh e. Mirov dikare bi muzîkê bigirê, bi muzîkê şa bibe. Hemû babetên ku mirov pê ruhê xwe terbiye dîke, rehet dîke, têr dîke, muzîk e. Ez dixwazim vê bibêjim, jiyana ku em rojane dijîn û muzîk pir bi hev ve girêdayî ne. Gelek caran gava ku dilê mirov teng be, mirov li muzîkê guhdarî dîke, dilê mirov pê fireh dibe, jiyana reş li ber çavên mirov xweş dibe, mirov ji diltengiya xwe azad dibe.

– *Tiştêkî din jî heye ku gelek caran bala min dikişîne. Hin komên muzîkê, an jî hin stranbêj bi enstrumanên modern, lê belê bi kincên folklorîk derdikevin ser dik û sehmayan. Tu ji vê re çi dibêjî?*

– Gava civatek were pelçiqandin, hebûna wî were înkarkirin, ew millet, ew civat jî dixwaze xwe nîşan bide, dibêje va ye ez heme, ez dijîm, tu çawa dikarî min înkare bikî? Heta niha ev kompleksa hebû, ez bi xwe vê yekê weke kompleksê dibînim. Me jî ev yeka kir. Lê ez bawer im divê êdî kurd xwe ji vê kompleksê xelas bikin. Gava ku mirov govendên folklorîk bigire, an jî stranên folklorîk bibêje, ev tiştêkî tabî ye ku divê mirov kincên folklorîk li xwe bike, lê belê gava mirov stranên nû dibêje, qet jî pêwîstiya lixwekirina kincên folklorîk nake.

– *Îro em dibînin ku hin keş û xortên kurdan hewl didin ku muzîkeke modern çêbikin; enstrumanên kurdî û ewrûpayî, an jî çêhanî tevlihev dikin û muzîkeke derdixin. Ev muzîk jî ji aliyê gelek xortan ve tê girtin û hezkirin. Gelo tu hewldanên te û çêkirina*

muzîka nû heye? An jî tu hê li ser riya xwe ya berê yî?

– Tu bêjî nebêjî piştî evqas sal mirov hewcedariya hin guhertinan dibîne. Ji xwe jiyana me ya li Ewropa jî me dajo ser vê yekê. Roj tuneke ku em muzîka nû nebihîzin. Bi gotineke din guhên me fêrî muzîka nû bûye. Ez bi xwe ji muzîka ku îro kurd çêdikin re nabêjim muzîka modern, lê belê ez dikarim bibêjim ku ev tecrube ne. Di pêşerojê de dikare tiştên baş derkeve holê. Ez bi xwe jî dixwazim hin biharatên dinyayê tevli xwarina xwe bikim. Yanî zewqa ku ez ji muzîka kurdî digirim, ez ji pop, jaz û bluz jî digirim. Muzîk zimanekî navneteweyî ye. Ji aliyê din ve ez bawer im ku mirov muzîkê li gora kultura xwe çêdike. Yanî ger hunermendek xwediyê kultureke kûr be, ew ê li gorî wê jî muzîka xwe çêbibe.

– *Gelo tu bi xwe muzîka xwe çawan çêdiki. Tu li ser notayê dixebitî an jî tu mîna pîraniya muzîkaran kurd bê nota dixebitî?*

– Na, ez li ser notayê naxebitim. Ez bi xwe ne kompozîtor im û min ilmekî muzîkê yê kûr û dûr jî nexwendiyê. Ez bawer im di cavata kurdan de pir kêman kes li ser notayê dixebitin. Lê ez hêvîdar im di pêşerojê de ez ê xwe di warê muzîkê de kûrtir bikim û bixwazibim muzîkeke baş û bi demê re çêbikim.

– *Gava tu bi muzîkê re mijûl nabî tu çi dikî? Entresa te û xwendinê çawa ye?*

– Ez hewl didim ku pir bixwînim. Ez bi kêmanî rojê çend saetên xwe didime xwendinê. Ez bi piranî edebiyata bedew; roman, çîrok û helbestan dixwînim. Lê ev nayê wê maneyê ku ez dûrî xwendina felsefe, psikolojî û sosyolojiyê me. Ez vê xwendina xwe bi sê zimanan dikim. ■

*Merziye Rezazî:
Baweriya min heye
ku wê di pêşerojê
de gelê kurd
qîmeteke hêja bide
hunermendên jin.*

Mustafa Cizîrî: Ge-
lo întresa te ya mu-
zîkê bi hevdunasîna te û
Nasir Rezazî re dest pê
kir, an jî întreseyeke te ya
weha ji berê de hebû?

Merziye Rezazî: dema
ez zarok bûm hezkirina
min ji muzîkê re hebû.
Ez diçûm dibistanê û li
dibistanê min sttan digo-
tin. Heval û mamsote-
yên min ji dengê min
hez dikirin.

Malbara min nedixwestin ku ez stranan
bibêjim û bibim hunermend. Bi awayekî
giştî civat jî li dijî hunermendiya jinan
bû. Lê min tu carî di fikir û baweriya xwe
de ev normên malbat û civatê qebûl ne-
dikir. Dema min dibistana bilind xelas
kir û bûm mamosteya dibistana seretayî,
min Nasir nas kir û me biryara xwe û ze-
wacê da. Malbara min û mirovên nêzîkî



Merziye Rezazî

me, li dijî zewaca min derketin û ji bo ku
Nasir hunermend bû, nedixwestin ku ez
pê re bizewicim. Lê digel hemû astengi-
yên malbat û civatê, me biryara xwe da û
em zewicîn. Baweriya min ew bû ku ez ê
bikaribim hunermendiya xwe bi Nasir re
bi pêş de bibim.

*– Nasir Rezazî di hevpeyvîna xwe de di-
yar kir ku weke hunermend gelek astengî*

derketin pêşiya wî. Ez bawer im astengiyên ku derdikevin pêşiya hunermendeke jin wê bêtir bin. Dîtina te di vê derheqê de çi ye?

– Di civata kurdan de mêr pir serbest û azad in. Digel ku ev serbestî ji bo mêran heye jî, dîsa ji aliyê malbat û civatê de ji bo hunermendiyê astengiyên mezin derdikevin pêşiya wan. Helbet ev bêtoleransiya civatê li hember jina hunermend bêtir e. Min gelek caran ji bo dengbêjiya xwe ji dê û bavê xwe lêdan xwariye. Hemû malbata min bi çavê nebaş li min dinihêrîn. Tev ku ez niha zewicî me û dayika sê zarokan im jî, ez dîsa nikarim bi rehetî tevgerê bikim. Lê digel hemû zehmetî û astengiyên civatê baweriya min bi pêşerojê heye ku wê gelê kurd qîmeteke hêja bide xebata hunermendên jin jî.

– Hunermend gelek caran ji hev didexisin. Gelo ev hesûdî di navbera jin û mêrekî hunermend de jî heye?

– Gorina hesûdî belkî gira be. Bi baweriya min divê reqabet di navbera hunermendan de hebe. Ji bo pêşketina hunerê, reqabeta di navbera hunermendan de tiştekî pêwîst e. Cihekî Nasir yê taybetî heye û daxwaza min ew e ku ew her bi pêş bikeve û bi ser bikeve.

– Testîra te li ser xebata Nasir çi ye?

– Min dixwest Nasir bi xwe bersiva vê pirsê bide. Lê ez ê dîsa bersiva te bidim. Gelek hunermendên jin gava ku dizewicin, xwe dûrî hunerê dikin. Ez bi xwe jî ji hunerê hez dikim û min her dem alîkariya Nasir ya di vî warî de jî kiriye. Ger ez ji aliyê malê de barê wî zêde giran bikim, bêguman ew ê nikaribe di warê muzîkê de zêde bi pêş bikeve. Heta ku ji destê min tê, ez dixwazim bi her awayî ji wî re bibim alîkar da ew bikaribe di warê hunerê de berde-wam be. Nasir di nava gelek bêtmkanî û zehmetiyan de jiyaye, ez dixwazim ji aliyê moral de jî ji wî re bibim alîkar.

– Tu dikarî hinekî behsa xebata xwe ya hunerî bikî?

– Dema ez pêşmerge bûm, min wê demê di radyoya komeleya Zehmetkêşan de gelek stranên şoreşgerî û folklorî gotin. Ji ber tunebûna îmkanan min nikaribû ew tomar bikirana. Ew xebat hemû di arşîva radyoyê de man. Li Ewrûpa min û Nasir me CD'yek çêkir û belav kir. Ez niha li ser kasetekê dixebitim û bawer im wê di nêzîk de xelas bibe. Hemû stranên kasetê min bi xwe beste kirine û gotine. ■

HEVPEYVÎN BI NASIR REZAZÎ RE

Mustafa Cizîrî

Mustafa Cizîrî: *Tu dika-
Mrî xwe bi xwendevanên
Nûdemê bidî naskirin?*

Nasir Rezazî: Berî ku ez bersiva pirsên we bidim, ez serkeftinê jî kovara Nûdemê re dixwazim û hêvîdar im kovara Nûdemê di warê huner û muzîka kurdî de jî astengên ku hene derxe holê û li çareserîya wan probleman jî hûr bibe.

Ez sala 1955'an li bajarê Sinê, li rojhilatê Kurdistanê (Kurdistana Îranê) çêbûme. Min beşê edebiyatê qedand û bûm mamosteyê edebiyatê. Dema şoreş li Îranê dest pê kir alozî û têkilheviyeke mezin pêkhat û mecala ku ez bikaribim karê xwe berdewam bikim nema. Bi şoreşa Îranê re li Kurdistana Rojhilat şoreşê dest pê kir. Ez û xanima xwe *Merziye* me biryar da û em bi hev re çûne nava refê şoreşê. Heta sala 1984'an min 25 kaset tomar kirin û belav kirine. Piştî sala 1984'an li Ewrûpa jî min 5 kaset çêkirine. Min gelek marşên şoreşgerî, niştimanî di dema



Nasir Rezazî

şoreşê de afirandin û ev stranên min di nava gel de belav bûn. Ev deh sal in ku ez û malbata xwe li Swêdê dijîm. Ji derveyî kasetçêkirinê, li hemû welatên Ewrûpa jî min di konser û şevan de stran gotine. Min li Kurdistana Bakur û Başûr jî kon-

ser çêkirine.

– *Dema te dest bi muzîkê kir çi zehmetî derketin pêşberî te?*

– Dema ez yanzeh-diwanzdeh salî bûm, min dest bi gotina stranan kir, hê di dema zaroktiya min de xuya bûbû ku hunermendî bi min re heye. Dayika min, bavê min û apê min jî dengxweş bûn. Cara yekê dema min dibistana seretayî dixwend, di şahiyekê de ez derketim sehnê û min stran gotin. Dengê min gelekî bala kesên beşdar û mamosteyên min kişand û min di wê şevê de xelat wergirt. Dema min biryara xwe da ku bibim dengbêj, zehmetiya esasî ku derket pêşiya min problema devokên zimanê kurdî bû. Kesên ku li rojhilatê Kurdistanê bêtir bi hunera muzîkê mijûl dibûn, kurdên bajarê Sinê bûn. Devoka wan û soranî ne weke hev in. Ji ber vê yekê dema min bi soranî digot wan asteng li pêşiya min derdixistin. Lê min biryara xwe da û piraniya stranên xwe bi soranî gotin. Min devoka soranî ji xwe re kire bingeh, lê min bi zaravên kurdî yê din jî stran gotin. Ji ber ku piraniya kurdên Rojhilatê bi zaravayê soranî dizanin, min jî biryara xwe li gora vê yekê da û min ji bo stranên xwe soranî kire bingeh. Ji ber ku di civata me de hunera dengbêjiyê mîna tişteki negatîv dihate dîtin, gelek asteng di vî warî de jî derketin pêşiya min. Bi taybetî di malbata me de gelek kes li dijî hunermendiya min derdiketin, bavê min mijûlbûna min ya bi hunerê re tişteki negatîv didît. Lê gava ez bûm pêşmerge û derketim çiyar ez ji bandora civatê ya negatîv jî rizgar bûm û min li çiyar di nava pêşmergeyan de gelek stranên folklorî, civakî û şoreşgerî tomar kirin. Lê ez têgihîştim ku xebata hunerî li çiyar ne hêsan e. Ji ber ku em her tim di şer de bûn û topê dijmin li ser me dibariyan, min bi rehetî nika-

ribû bi hunera xwe ya muzîkê re mijûl bibim û wê bi pêş de bibim. Li çiyar îmkannên teknîkî û tomarkirinê tune bûn. Her çiqas pêşmergerî ji bo me muhîm bû û me kesayetîya xwe di nava pratîka pêşmergeriyê de naskir jî, lê ji bo hunermendekî zehmet e ku di nava jiyaneke wilo de hunera xwe bi pêş de bibe. Lê di vê dema ku ez li derveyî welatî mam, min rastiyeke din jî dît ku wexta ku mirov dûrî civat û welatê xwe be ev yeka han jî tesîreke mezin û negatîv li ser hunera mirov dike. Tiştên ku li welat hene li vir tune û îmkannên ku li vir hene li welat tunene.

– *Divê rola hunermendan di civatê de çi be?*

– Hunermend divê di fikir û ramanên xwe de azad be. Kesê hunermend divê guhdarê civata xwe be, lê nebe dûvikê civatê. Huner divê xwe sansur neke, hunerê ku were sensurkirin bi tu awayî nikare mesajên rast û durust bide civatê. Huner divê ne di bin bandora siyaseta rojane û menfeetê grûbî de be. Kesê hunermend li hemberî dîrok û civatê xwediyê berpîrsiyariyeke mezin e.

– *Muzîka kurdî îro di çi qonaxê de ye?*

– Muzîka kurdî a gelerî gelekî dewlemend e û ji bo moderkirin û pêşdaxistinê musaîd e. Xebat û hewldanên ku di derbarê muzîka kurdî de heta niha hatine kirin, ne bi serkeftî ne. Heta ez dikarim bêjim ku xebatên hinek kesan bi navê modernîzekirinê zerareke mezin dide muzîka kurdî. Gelek kes dixwazin bi erzanî bibin nav û ew bi zanebûn an bi nezanî zerareke mezin didin muzîka kurdî. Muzîka kurdî rîtmîk e. Rîtmên duçar û çarçar di muzîka kurdî de bingehê baş e ji bo hevgerêdan û nêzîkbûna muzîka rojava. Heger xebatên ilmî û bi sebir werin kirin wê tiştên heja bêne



Nasir û Merziye Rezazî

afirandin. Kvarton berê di muzîka kurdî de tunebû. Bi hatina îslamê re kvarton kete nava muzîka kurdî. Muzîka kurdî berî îslamiyetê wekî muzîka girêkiyan bû. Ger kvarton di muzîkê de tunebe, guhertin û nêzîkkirina muzîkê hêsantir dibe. Îro di dema ku em tê de dijîn maneya sînoran gelekî nemaye. Huner sînoran derbas dike û dibe navneteweyî. Ger em hunermendên kurd nikaribin îro muzîka kurdî derxin nav qada muzîka cîhanî em ê gelek dereng bimînin.

– *Hunermendên ku îro di nav cehd û xebata ku muzîka kurdî modernîze bikin divê li çi dîqet bikin?*

– Berî her tiştî dixwazim bêjim ku civata kurdî ya îro ne civata berî bi dused salî ye. Guhertinên ku di cavatan de çêdibin pêdivî û hewcedariyên nû derdixe holê. Guhertinên mezin di cavat kurdan de jî pêk tê. Muzîka kurdî a klasîk îro nikare bersiv û daxwaza civaka kurdî bide. Lê dema mirov bixwaze hunera nû biafirîne, divê mirov xwe ji teqlîtê bi dûr bixe. Divê hunerê ke-

vin û nû bi hev re bêne hûnandin û girêdaneke xurt di navbera wan de hebe. Muzîka kurdî a modern divê li ser muzîka kurdî ya klasîk were avakirin û pêşdexistin. Divê di navbera hunermendan de pêwendî û alîkariyeke xurt hebe ji bo hunereke baştir û têkûztir were avakirin. Mixabin ez îro nikarim bêjim ku pêwendî û alîkarî di navbera hunermendan de heye.

– *Ji derveyî xebata te ya muzîkê tu bi karê nivîskariyê jî mijûl dibî, tu dikarî hinekî behsa xebata xwe ya nivîskariyê bikî?*

– Dema ez li Kurdistanê bûm, min stranên folklorî ji nava gel berhev dikirin û dinivîsandin. Bi vî awayî ez ketim nava karê nivîsandinê. Cara pêşî min şanoyeke ji zaravayê *sînî* wergerand zaravayê *soranî*. Piştî ez hatim Ewropa, mamosta *Ferhad Shakely* ez teşwîq kirim ku ez karê nivîsandinê berdewam bikim. Min her a niha çend pirtûk wergerandine zimanê kurdî. Min pirtûkek jî li ser cografiya Kurdistanê nivîsandiyê û hinek xebatên min jî di destên min de he. ■

Derwêş M. Ferho

Dev bi ken "ez di sala 1954'an de li Girêpîrê/Tirbespiyê li binya xetê (Kurdistan Suriyê hatime dinê", Temo dibêje. Ew heta sinifa 6'an li wira dibistanê dixwîne.

Ji malbateke feqîr û hejar tê. Lê hemî kesên malbatê welatevîn bûn.

Ji biçûkatiya xwe ve îlhama mûzîk û dengbêjiyê pê re çêbûye. Ev îlham ji civatên gund, dawetên derdoran, radyoya Kurdistanê Iraq û Radyoya Yerîvanê bûn. Bi pirranî hez ji sitranên Mihemed Arif, Meryem Xan, Hesên Zîrek û Kawis Axa dikir. "Min gelekî hez ji mitribên dora me dikir."

"Di 8 saliya xwe de min hez ji mûzîkê kir. Di 12 saliya xwe de min bi qutîkan, zerikan, tepsîk û pîpikên ji saqên genim muzîk çêdikir. Gelek caran bê aletên mûzîkê min ji xwe re sitran digotin. Paş demekê bi sed mîşkîlan min tembûrek peyda kir û kirî. Xortên gund tembûra min ji min distandin. Wan jî dixwest hîn bibin. Ez bûm 13 salî û min dest pê kir ku stranên xwe bi tembûrê re bêjim. Mûzîk û stranên min gelerî bûn."

Temo, di 15 saliya xwe de, dawiya 1970, diçe nav şoreşa Kurdistanê Iraqê. "Li wira min Dr. Şivan nas kir. Min jê xwest ku bibim pêşmerge. Ji ber piçûkbûne emrê min ez qebûl nekirim. Despêka 1971'ê ez dîsa ji mec-

bûrî vegeyriyam Kurdistanê Suriyê. Wî ji min re soz da ku ezê rojekê vegeyrim nav şoreşê û ew ê komeke mûzîkê bi min re bide çêkirin." Ew li gundê xwe qederekê dimîne.

"Ji feqîrtî û belengaziyê ez di 1972'n de ji bo kar çûm Libnanê. Li wira min komikên Kurdan nas kir. Min û çend kesên ji wir di 1972'an de koma mûzîkê ya bi navê Erz çêkir. Kêm zêde ez 2 salan li wir mam. Ez vegeyriyam mal. Lê dîsa ez bê dirac bûm. Ji ber ku min xebat ji bo dirav nekir heta diravên min çê bibin. Bi hin kesên ji Kurdistanê Iraqê re min dîsa berê xwe da Kurdistanê Iraqê. 5-6 km ji cihê ku em diçûnê re hebûn ku em bigihîne, me xeberek ne xweş stend. "Neçîne meqerê xwe, Dr. Seîd Elçî hatiye kuştin û Çeko û Brusk jî hatine kuştin. Dr. Şivan dora wî qalib dayine, dixwazin wî bigrin û bibin." "Berê me dane cem Esed Xoşewî. Em jê çûne wira. Gava em gihan, bi çembilên me girtin û em avêtin hepsê. Sê nameyên bi me re teslîmê Esid Xoşewî kir. Em di derheqê Dr. Şivan de mehkeme dikirin. Dema hate xuyakirin ku tu haja me ji wan meseleyan nebû em paş 6 rojan serbest berdan. Roja ez berdama ez vegeyriyam Kurdistanê Suriyê."

Ji ber gelek sedeman ew nikaribû li cihê xwe, li gundê xwe bimaya. Ew piştî hefteyekê berê xwe dide Suriyê. Heta despêka



Temo

1973'an jiyana xwe li Libnanê didomîne. Dan û stendinên wî hem bi kurdên li Libnanê re hem jî bi kurdên ji Kurdistanê re pirr xurt dibe. Lê xerîbî jê re zahmet tê. Ew dixwaze doza xwe ya netewî bi hunerê xwe li nav gelê xwe û li welatê xwe bi xwe bike.

"Sebra min nedihat. Min dikir ne dikir ez li wir dibexş nedibûm. Min rahişte tembûra xwe û ez ketim ser rê ku herim nava şoreşê li Kurdistanê Iraqê. Ez çûme Dihokê. Li wira min û Mihemed Teyib Taha (Hevalê Bargirra) korneke muzîkê çêkir. Di sebara 1973'an de festîvalek li Bexdayê hat amade kirin. Em beşdar bûn. Ew cara pêşîn bû ku ez bi hunerê xwe wek hunermendekî kurd beşdarî rojêke weha mezin dibûm." "Em veşeriyên Kurdistanê. Ez pê hesiyam ku pêşmergeyan cil û livînên min birine Sersingê! Di eynî rojê de me qerar da ku xebata min û Mihemed Teyib bi hev ra ne ma. Ez çûme Sersingê. Min li wira eziyeteke mezin kişand. Bi çend kesan re min berê xwe da Gilala. Em şeş rojan meşyan."

Min li Gilala beşdarî programên radyoya şoreşê kir. Hera payiza 1974'an ku şoreş şikest ez li wir mam."

Piştî şikestina şoreşê Temo jî, wek pirr kesan, berê xwe dide Îranê. "Mihemed Şêxo jî, ku hê jî Beyrûdê nasîna me hebû û me di radyoya şoreşê de jî bi hev re kar dikir, li wira bû. Ez û ew di çadîrekê de bûn. Rojêk î, yek birçî, yek bê xew, ya din bi tirs em heta nîsana 1975'an man. Min dixwest ku em ji wê rezaletê derkevin. Mihemed Şêxo dixwest li wira bimîne. Min got ku em herin Ewropa. Wî digot ku "ez li Ewropa nikarim xwe xwedî bikim.

Meha hezîrana 1975'an ji min re dora Ewropa derket. Di eynî mehê de ez hatim Frankfurt. Polîsê Elman, ez veşerandim. Diravên min jî ji min stendin û ez xistim balafîra Parisê. Li balafîrxana Parisê ez çar rojan mam. Min telefonî Elmanya kir. Ji wira min telefoneke havalekî li Parîs stend. Ez çûme Parisê û ev nozdeh sal in ku ez li Parisê dijîm."

Li ser rewşa penaberî, xerîbî û durîtiya welêt Temo weha dibêjê. "Ne hêsan e ku meriv bikaribe xebata xwe, hunerê xwe, yan hîssên hebûna xwe ya netewîkurdî li Ewropa hunda neke û biparêze".

Digel hemû zehmetiya Temo xebata xwe domand.

"Ez stran û muzîka gelerê û ya nuh ku bi roja têkoşîna netewî ve girêda ye dibêjim û li ser dixebitim. Xebata min ya hunerî jî 15 saliya min û vir de, çi di nav şoreşê de, çi li derveyê welêt nişana vê xebata min e. Li cem stran û muzîka gelerê, gelek berhemên min jî hene. Weka:

... / Ez kurd im wekî te serê min hişk e / ez bûm ereb bin destê ecem û tirk e / xwîna min bû wek mêjiyê her car vala û fîrk e / ez ketim çamborê min daw û delingê xwe hildan / dîk sibê de li min xulculand û bang dan / hêjî dibêjim yan Kurdistan yan naman / ...

"Ez îlhama wan stran û muzîkê jî jiyana xwe û ya gelê xwe distînim. Ez wek hunermendekî kurd ne girêdayî ti hêzên siyasî me. Ez dixwezim hunerê xwe jî bo menfaeta gelê xwe bi kar binim. ■

HEVPEYVÎN BI SEÎD YÛSÛF RE

Nûdem: *Seîd Yûsûf kî ye?*

Seîd Yûsûf: Bavê min bi eslê xwe Rimî ye, ji hêla Bişêriyê hatiye.

– *Bişêrî li ku ye? Serxet e, an bînxet e?*

– Li serxetê ye. Weke hûn dibêjin, li Kurdistana Tirkîyeyê ye. Malbata min ji wir hatine binya xetê, ez bi xwe li binya xetê, li bajarê Qamîşloyê çêbûme. Ez di sala 1947'an de, li kolana Qudûrbegê hatime dinyayê. Di yanzdeh saliya xwe de, em çûne Enteriyê, em neh-deh salan jî li wir man.

– *Gelo tu niha li ku dimînî?*

– Ez niha li Qamîşloyê dimînim.

– *Di malbata we de tu hunermend hebû?*

– Di malbatê de tu hunermendên wilo bi nav û deng tunebûn, lê yê n ku ji stran û dengbêjiyê hez dikirin, hebûn. Bavê min bi xwe gelekî nêzikî hunera stranbêjiyê bû. Ew hostayê xaniyan bû, lê wî li tembûrê jî dixist.

– *Te bi xwe kengê dest bi muzîkê kir?*

– Hema bêje min di hifdeh-hîjdeh sali-

ya xwe de dest bi muzîkê kiriye. Lê min berê di dibistanê de distira û gelekî kêfa xwendevan û mamsoteyan jî dengê min re dihat. Lê bi profesyonelî min di hufdeh-hîjdeh saliya xwe dest bi muzîkê kir.

– *Em dizanin ku tu li tembûreke xweş dixî. Tu bi xwe fêrî lêdana tembûrê bûyî, an tu çû dibistanên muzîkê?*

– Na na, ez neçûme tu dibistanên muzîkê. Ez xwe bi xwe fêr bûm. Min radihişt tembûra xwe, ez diçûm malê û min bi saetan lê dida. Ez di pratîka lêdanê de xwe bi xwe fêr bûm.

– *Min bihîst ku tu hin enstrumanên muzîkê bi xwe çêdikî, gelo tişteki wisa heye?*

– Na xêr, ez enstrumana bi xwe çênakim. Lê ez bêtir enstrumanên bi tîl bi kar tînim.

– *Te got te di hufdeh-hîjdeh saliya xwe dest bi muzîkê kir. Wîlo xuyaye ku ew roj ev roj e tu di nava cîhana muzîkê de yî?*

– Belê...

– *Heta niha çend kasetên te derketine? An jî sêlik û CD?...*



Seîd Yûsûf

– Heta niha 27 kasetên min derketine û ez dikarim bibêjim ku stranek naşibe yeka dîn, strana ku di kasetekê de heye di yeka dîn tuneye. Ji bilî van jî çî bigire neh-deh kasetên min yê bi tenê enstrumen hene. Ev ji muzîka tirkî, ya erebî û ya kurdî pêk tîn û piraniya wan yê reqsê ne. Ger em van jî bixine ser, zêdeyî sî kasetî çêdibe.

– *Baş, bi tevayî mijara muzîka te çî ye?*

– Ez ji destpêkê ve pir ji stranên folklorî hez dikim. Bi taybetî ez ji yê li ser gilî û gazinan, yê evînî û evîndariyê pir hez dikim. Di kultura me kurdan de li ser şer, pevçûn û kuştinê jî heye, ez ji wê hez nakim. Yanî ez dikarim bibêjim ku mijara stranên min ji sedî not li ser evînê ye.

– *Ji xwe tiştê ku bal dikişîne, ji bilî stranên evînî ku te bi xwe çêkirine, ew stranên folklorî û gelêrî ku tu distrê jî, yê evînî ne.*

– Ez jê hez dikim.

– *Ji bo çî?*

– Ez nizamim hemû mirov wilo ne an na, lê yê min ez her tim aşiq im. Ez aşiqê tiştên xweşik im, aşiqê tiştên delal im, aşiqê tiştên rindik im.

– *Gelo ev evîndariya te ne berdewamiya hezkirineke ciwanîyê be?*

– Tu bêjî nebêjî berdewamiyeke wilo heye. Lê nayê wê maneyê ku ez ê ji xwe re yekê bînim û pê re bizewicim. Lê çî ye, ez ji tiştên spehî hez dikim. Ez psîkeke xweşik bibînim ez ê jê hez bikim. Ez çavekî xweşik bibînim ez ê jê hez bikim. Ez guleke xweşik bibînim ez ê jê hez bikim. Bi taybetî jî jin tiştêkî Xwedayî ye. Ne di destê mirov de ye ku mirov ji jina xweşik hez neke.

– *Yanî mirov dikare bibêje ku naveroka piraniya stranên te civakî ne, lê ne politîk in.*

– Rast e, stranên min bi piranî evînî û civakî ne, lê ne siyasî ne.

– *Tu get nafikirî ku stranên polîtîk jî bistirê?*

– Ma ez ê çi stranên polîtîk bistirê? Gerçî bi dehan stranên min yên polîtîk ku hê min belav nekirine hene, lê nêrina min ya şexsî xuyaye. Ez kurd im û bi her awayî yekîtiya kurdan dixwazim. Gava yekîti û hevkarî di nava kurdan de çêbibe, wê kurd ji bin zilm û zorê jî xelas bibin û welatê kurdan jî azad bibe. Lê belê karê min çêkirina muzîkê û gotina stranan e, ne kirina şoreşê ye. Ez nikarim weke hinekan bi hum û gum bibêjim Kurdisran ha Kurdisran, an jî digel ku gelekî hurmeta min ji şehîdan re heye, bîst û çar saetan li ser şehîdan bistirê.

– *Te bîska din got ku te heta niha 25-30 kaset çêkirine. Tu van kasetên xwe çawan çêdikî; gotinên wan kê dinivîstine, kê meqamdidiyê?*

– Piştî ku min dest bi stranê kir bi demeke kurt, min dest bi nivîsandina helbestan jî kir. Yanî min dest pê kir û gotinên xwe bi xwe nivîsandin. Nivîsandina stranan ne weke ya şîran e, stîleke wan ya taybetî heye û bi ya min nivîsandina stranan ji nivîsandina şîran zehmettir e.

– *Ev taybetî an jî zehmetiya nivîsandina stranan ji ya şîran çi ye?*

– Ya yekem divê armanceke wê ya nêzik hebe ku her kes têbigihîje. Ya duduwa divê xeberên wê jî vekirî bin, yanî ne aloz û tevlihev be û bi zehmetî neyê fêhmkirin. Ya sisiyan divê ne gelekî dirêj be. Ya çaran divê bi hêsanî bête fêhmkirin. Gava gotinên stranê hêsan be, zarok jî dikarin têbigihîjin, mezin jî dikarin têbigihîjin, her kes dikare

têbigihîje. Lê gava ku dirêj be, tevlihev be, aloz be û piştî sed rêzî ji nû ve mirov armanca wê fêhm bike ka bê mebest çi ye, bi rastî xelkê me ji stranên vî babetî re ne amade ye.

– *Yanî piraniya stranên xwe tu dinivîstîni...*

– Ne piraniya wan, ez hemûyî dinivîstînim.

– *Baş e, tu çawa muzîkê çêdikî?*

– Muzîk jî her mîna gotinan e. Ev hebekî jî bi îlhamê ve girêdayî ye. Carinan ez ji nişka ve ji nava nivînan radibim û gotinên stranekê dinivîstînim. Ez herweha carinan bi nivîsandina stranê re awazê wê jî didimê. Yanî dengdayina stranekê an jî çêkirina awazekê carinan nîvsaet digire, carinan jî bi rojan ez li ser dixebitim, heta ku li hev tê.

– *Tu muzîka xwe li gorî notayê çêdikî, an jî tu mîna gelek hunermendên kurd bê nota çêdikî?*

– Ma bê nota dibe? Muzîka bê nota ne tu muzîk e, bi ser nakeve. Nota bingeha muzîkê ye, muzîkeke baş ancax bi notayê çêbibe.

– *Yanî tu stranên xwe li ser notayê çêdikî?*

– Tabî, tabî...

– *Mîna tê zanîn gelek hunermendên kurd muzîkê bê nota çêdikin, gotina te ji wan hunermendan re çi ye?*

– Niha hin hunermend hene ku bê nota jî bi ser ketine, lê belê ev hejmareke pir hindik e. Heta gava mirov baş guhê xwe bide stranên wan û hebekî jî ji muzîkê agahdar be, mirov ê fêhm bike ku kêmaniyek di stranan de heye. Ji ber ku ne li ser notayê çêbûne.

– *Mirov dikare bibêje ku tu dixwazî bibê-jî, hunermendên ku muzîka bê nota çêdikin jiyana kurt in?*

– Belê, belê. Ji xwe ez dikarim bibêjim ku ji niha de nivê rawestiyane, kaniya wan miçiqî ye, êdî hew dikarin tiştêkî nû biafirînin. Lê dikarin kurtedemeke din jî li ser muzîka tirkî, farisî û tirkî bijîn û bêjin ev muzîk me çêkiriye. Lê ma heya kengî ew ê li ser kîsê xelkê bijîn?

– *Muzîka hin miletan dişibin hev, nêzikî hev in. Gelo muzîka ku tu çêdiki nêzikî ya kîjan miletî ye? Nêzikî ya tirkî ye, ya farisî ye, ya erebî ye an jî xweser e, ya kurdî ye ku te bi xwe afirandiye?*

– Tabî divê mirov rast bibêje, stranên kurdî her heye, bingeha muzîka kurdî her heye û dewlemend e jî, lê perçeyên ku kurd lê dijîn, di bin tesîra wan de jî dimîne. Em bixwazin nexwazin, em di bin tesîra tirkî, erebî û farisî de dimînin, hin deng û awazan ji wan digirin. Ew jî di bin tesîra muzîka kurdî de dimînin, bêhna kurdî ji gelek stranên wan tê. Bi ya min ev yeka han tiştêkî pir tabî ye. Weke însan jî gava mirov bi însanekî din re bijî û pê re bimîne, mirov gelekî ji rabûn û rûniştina wî, ji tevger û hereketên wî digire. Ez bi xwe li Sûriyê me, gava ez meqamekî çêbikim, dibe ku ereb jî eynî meqamî çêbikin, ji ber ku em şerqî ne, gelek tiştên me dişibin hev; herweha muzîka me jî dişibe hevdu.

– *Baş e, jî bo te muzîk çi ye?*

– Ji bo min, wek hunermend Seîd Yûsûf, muzîkê weke av û hewayê ye. Çawa ku mirov nikare bê av û hewa bijî, ez jî nikarim bê muzîk bijîm. Muzîk bûye perçeyek ji

min, perçeyek ji jiyana min, bi gotineke din ew bûye hevaleke min ya bêdawî. Ez bi muzîkê re dijîm. Gava ez carinan li jiyana bê muzîk difikirim, ew jiyana ji min re gelekî bê mane û pûç tê. Yanî jiyana bê muzîk ji bo min jiyaneke vala ye. Ez çiqas aciz bibim, problemên min çiqas çêbibin, an jî çi bobelat bi serê min de werin, muzîk min jê rizgar dike, ew ji bo min piştgirek e, hevaleke ku destê alîkariyê dirêjî min dike.

– *Tu ji muzîka xwe hez dikî? Yanî gava tu bi tenê bî, tu li dengê xwe guhdarî dikî?*

– Erê, bi taybetî jî gava ez tiştêkî nû çêdikim, ez li dengê xwe guhdarî dikim. Piraniya sebeba guhdarîkirina min jî, ji bo ku ez fêr bibim ka gelo min baş çêkiriye an na, ka gelo weke ez fikirîme, muzîka min çêbûye an na. Piştî wê jî ez hew zêde lê guhdarî dikim û êdî hewl didim muzîkeke nû çêbikim.

– *Gelo ji muzîka kurdî tu bêtir li kê guhdarî dikî? Tu ji çi celeb muzîka kurdî zewqê distîni?*

– Divê mirov heqê tu hunermendî nexwe, her yekî stîleke wî ya xas heye, lê ez nikarim bibêjim ku ez gelekî li yê nû guhdarî dikim. Hinek ji hunermendên îro hene, ku mirov carekê lê guhdarî bike, bes e. Hinek jê hene mirov nikare carekê jî lê guhdarî bike. Lê di nav yê nû de hinekî jîr jî hene. Ji yê kevin ez bêtir li *Mihemed Arif Cizîrî, Hesên Cizîrî, Meyremxan, Tehsîn Taha* guhdarî dikim. Van bi rastî muzîkeke baş çêdikin û muzîka wan xweş û temendirêj e. Lê evên nû, ne ku xerab in, lê ji wan re gelek divê ta ku ew bikaribin mîna hunermendên rastîn derkevin qada

hunera kurdî.

– *Ji derveyî muzîka kurdî tu li muzîka bi-yanî jî guhdarî dikî? Yanî çi oriyental, çi jî ewrûpayî û emerîkayî?*

– Ez bêtir li ya oriyental guhdarî dikim. ya tirkî, erebî û farisî... Bi taybetî hin hunermendên ereban hene ku ez gelekî guhdariya wan dikim. Ew ne bi tenê di dinyaya ereban de, herweha li hemû dinyayê navdar in. Ez bawer im hinekî wilo di nava tirkan de jî hene, weke hunermend navdar in. Ew ê li ba farisan jî yên wilo hebin.

– *Te got ku tu zêde li muzîka hevçaxên xwe guhdarî nakî. Gelo têkiliyên te bi wan re çawa ye? Danûstandinên te bi wan heye?*

– Mixabin, çi li vir û çi li deverin din, wilo bû ye, ku divê her kes muxtarê mala xwe be. Yanî çi bigire kes kesî qebûl nake. Komeleyek çêbibe, divê ew serok be, komek çêbibe divê ew di serî de be, şevêk çêbibe divê her tişt di destê wî de be, xwarineke xweş hebe divê ew pêşî bixwe, heger tu li makîneyekê siwar bibî divê ew şifêr be. Loma jî xebata bi hev re ne rehet e. Gava rewş wilo be jî min re jî naserîfe. Bila kes pesnê xwe nede û nebêje em dikarin bi hev re bixebitin, nebêjin têkiliyên me bi hev re baş e. Ji ber ku ne wilo ye?

– *Ev ji çi tê gelo? Mirov dikare bibêje ku di navbera hunermendan de dexesî û çavneubarî heye? Bi gotîneke din reqabet heye?*

– Erê, ev ji dexesiyê tê, ji zikreşiyê tê, ji xweparastinê tê. Gava ez bibînim yekî nû derketiye û xelk lê guhdarî dikin û jê hez dikin, divê ez şerê wî bikim, ji ber ku bi derketina wî re êdî hew kes li min guhdarî dike. Loma ji bo ez xwe biparêzim divê ez

bi her awayî şerê wî bikim.

– *Digel ku têkiliyên we hunermendan zêde bi hev re tune ye jî, dîsan xwestekên we mîna hev in. Hûn çi bigire hemû ji reuşê gazinan dikin, hûn dibêjin kurd li hunermendên xwedî dermavekin, kasetên wan nakirin, naçin şevên wan. Hûn çi dixwazin? Divê kurd bi çi awayî li we xwedî dervekin? An jî gava hûn dibêjin, "kurd" hûn gelê kurd qest dikin, an jî rêkxistin û partiye kurdan?*

– Gava em dibêjin kurd, ji xwe qesta me rêkxistin û partiye kurdan e. Yanî bi kêmanî ji sedî not û heşt ew in. Ji ber ku her partî û rêkxistinek dixwazin hunermendan ber bi xwe ve bikişînin. Dixwazin ku hunermend di behra wan de melevaniyê bikin. Ji bilî wî ne ji kesekî din re be. Ger tu bi yan wan nekî, ew ê kevir û kuçan li te bibarîne, tu di çavên wan de dibî kafir. Daxwaza min ji partiye kurdan ev e ku divê ew hunermendan ji xwe re nekin pir û di ser wan re neçin. Daxwaza min ji wan ew e ku ew hunermendên xwe azad bihêlin. Ne ku ez herim ba rêkxistinekê rêkxistina din şerê min bike. An jî gava hunermendek bixwaze ji xwe re şeveke taybetî çêbike, partiye kurdan ji wan re dibin asteng, naxwazin xelk herin şeva wan, ji ber ku hunermend ne bi wan re ne. Ez kurd im û xelas. Ew ê çima min mecbûr bikin ku ez bidim dû wan? Ne hewce ye ku ez rast bim, çep bim, komunîst bim, an jî hevalbendê filan û bêvan partiye bim. Yanî dixwazin hunermend mîna topekê di destên wan de bin.

– *Yanî tu dixwazî bibêjî ku divê mirov huner û politîkaya rojane zêde bi hev ve girê*

nede...

– Erê, huner huner e û polîtîka polîtîka ye. Gava huner bi polîtîkayê ve bête girêdan, ew sax be jî, dîsan mirîye.

– *Tu bi tevayî reuşa muzîka kurdî çawan dibînî?*

– Mixabin, ez reuşa muzîka kurdî pir nebaş dibînim. Muzîka kurdî bi tevayî li paş e û bipêşneketiye. A îro tu hemû hunermendên li Ewrûpayê bicivînin ser hev, tu ê nikaribî ji wan komeke baş derxîni. Rewşgelekî xerab e. Ev delîlek û îşaretek e ku muzîka kurdî gelekî fireh nebûye û muzîka kurdî bûye hêsîrê herêma ku ew hunermend jê ye. Ji ber ku piştgirîya gel jî ji hunermendan re kêma e, muzîka kurdî seqet û bawî dimîne. Em îro bi kêmanî çil milyon in, çil hunermendên me yê baş tune. Lê nifûsa Lubnanê çar milyon e, tunebe tunebe bîst hezar hunermendên wan hene û piraniya wan jî di konservatuwar û enstîtuyan de xwendine, ji muzîkê fêhm dikin. Muzîkê wan yê herî nezan ji notayê fêhm dikin. Lê mixabin, mirov nikare eynî tiştî ji bo muzîkê kurdî bibêje. Ji aliyekî ve muzîkê kurdî bi tenê ne, bê piştgirî ne, yê ku wan ber bi muzîkeke baştir teşwîq bikin tune. Divê hêz û partiyên kurdan bi her awayî alîkarî û piştgirîya hunermendên xwe bikin. Ji ber ku biserketina hunermendan, biserketina siyaseta kurdî ye jî.

– *Belê, mîna ku di her warê jiyana de dibê, gava ku tiştekî nû derdikeve, yê kevin li dij derdikeve. Îro em dibînin ku li Kurdistanê jî guhertinên bingehîn çêdibe. Di şûna jiyana gundîtiyê de, celebê jiyaneke bajarvani-*

yê dest pê dike. Di jiyana bajarvaniyê de jî folklor popeulertiya xwe winda dike, êdî hewcedariyên muzîkeke nû ku bikaribe bersiva civakê bide, tê kirin. Em dibînin hinek huermendên kurdî bi vî karî radibin. Bi a te, di çêkirina muzîka nû de divê li çî bête fikirandin?

– Ez ne bawer im ku îro kurd muzîka modern çêdikin. Kanî muzîka modern? Ger yekî wek *Ciwan Haco* bi stîleke nû derketiye, ew bi tenê jî çend milyon yek e. Lê wekî din ez bi xwe yê ku muzîka modern çêdikin, nabînin. Rast e, civata me hatiye guhertin û li gorî guhertinê wê civatê jî divê muzîkeke nû çêbibe, lê belê ev pîrseke aborî ye jî. Niha, gava em muzîka xwe çêdikin, em radihêjin darê tembûra xwe û an em li ber teybekê dadigirin, an jî em diçin stuyoyeke feqîr. Lê ji bo ku tu bikaribî kaseteke muzîka modern û pirdeng çêbikî, divê bi kêmanî bîst-sî kes bin. Ji van bîst-sî kesan ewqas aletên muzîkê lazim e. Tu rabî van bîst-sî kesan bibî studyoyekê, dagirtina kasetekê bi kêmanî wê çend hefteyan bigire. Ê kanî mesrefê ewqas însan, mesrefê studyoyê û paşê jî mesrefên kaset, sêlik an jî CD'yê? Ev hemû pere ne, hemû mesref in. Gava kaset neyên firotin û piştgirî û alîkariya hunermendan neyê kirin, ez bawer nakim ew ê bikaribin bi xwe jî bin mesrefekî ewqas giran rabin.

– *Em dizanin ku îro bazereke weşanê bi kurdî tune, gelo bazereke muzîka kurdî jî tune?*

– Ji xwe ev pîrsgirêka hunermendên kurdî ya herî mezin e. Ev jî dîsan bi rola partiyên ve girêdayî ye. Ger partiyek kase-

tekê derxe, ew dikare bi rîya endamên xwe bifiroşe an jî endamê wê bi xwe mecbûr dimînin û dikirin. Lê ger ne wilo be, yanî mirov kasete xwe bi xwe derxe, mirov bîsttan datîne Uppsala, pêncî datîne Stockholmê, sedî datîne Londrayê û hwd. Gava tu telefon bikî û li wan bipirsî, ew hatibin firotin jî pere tune. Yanî li te venagerin. Gava pere venege, mirov ê çawa bikaribe amadeyîya kaseteke din bike?

– Yanî di rewşa îro de hunermendek nikare li ser hunera xwe bijî?

– Na, ebeden nikare. Ev sê mehên min in ku ez li Swêdê me lê ez nikarim kasetekê çêbikim. Rewşa hunermendiya kurdî ne hêsan e. Ne ku ne hêsan e, pir zehmet e!

– Ji bo ku bazereke muzîka kurdî çêbibe divê çi bête kirin?

– Bi ya min ji bo ku bazereke muzîka kurdî çêbibe, divê sazgeheke bi armanca tîcarî ava bibe. Sazgeheke profesyonel ku bikaribe bi xwe li ser xebata xwe bijî, hem jî bike ku hunermendên kurd bikaribe li ser hunera xwe bijîn. Em bêjin wê kasetekê çêbikin, bila ji xwe re ji sedî heftê-heystê hiltînin, dawîya maye bide hunermend. Ev li gelek deverên dinyayê wilo ye û wilo jî muzîka xelkê bipêş dikeve. Gava rewş wilo bibe, wê li ba hunermendan berdewamiyek jî çêbibe. Bi berdewamiyê re wê muzîkeke kurdî ya baş jî derkeve holê. Gava kasetên kurdî bi rêk û pêk bin û di studyoyan de bi

muzîka baş bêne çêkirin, wê xelkê biyanî jî bixwazin lê guhdarî bikin. Bi gotineke din wê muzîka kurdî kirasê xwe yê teng biçirîne û hebekî jî bibe dinyayî.

– Te berî niha got ku hunermendek nikare li ser muzîka xwe bijî. Baş e, ev bîst-sê salên te ne ku tu bi muzîkê re mijûl î, tu çawan diji? Gelo ji bilî muzîkê tu mijûliyên te yên din hene?

– Na, niha ez ji bilî muzîkê bi tiştekî din re nalebikim. Berê ez diçûm dawet û şahiyên kurdan, hinek pere ji wir dihat. Demekê ez derketim şevên kurdan li Ewrûpayê. Ji wir jî tiştek dihat. Lê vê têr nedikir. Dikaneke min ya kasetan li Qamişlokê hebû. Niha ew jî tune. Lê belê, bi qasî ku ez bikaribim li ser bijîm, na!...

– Niha em nêzikî li dawîya hevpeyvîna xwe dikin. Ez dixwazim vê bipirsim; gelo navbera te û xwendinê çawa ye? Tu pirtûkan dixwîni? Pirtûka dawî ku te xwendiyê kîjan e?

– Belê, ez pir dixwînim. Ez bi piranî jî pirtûkên kurdî dixwînim. Ne ku bi tenê dixwînim, ez herweha dinivîsînim jî. Niha pirtûkeke min li ber xelasbûnê ye. Navê pirtûkê Derew e. Ez di vê pirtûkê de, behsa derewên di her warên civatê de dikim. Tiştên ku min herî dawî jî xwendiyê kovara Hawarê ye. Hawar çavkaniyeke çand û edebiyata kurdî ya herî baş e. ■

NE TU BÛ

Abidîn Azad

Ez te dinasim
 Ne tu bû ewa çavreş
 Ewa xewnên min yên şevan dixemiland
 Ewa bi roj ji xeyalên min dervediket
 Ne tu bû, ez baş dizanim.

Ne tu bû, ewa şeveke baranê
 Li ber xanîkî ji axê çêkirî
 Şil bûbû heta qumçokên xwe
 Diricifî li ber wê sermê
 Ne ez bûm ewê sîwan di dest de
 Paltoyê xwe avêt ser milên te
 Ew ne ez bûm, ez baş dizanim.

Ne ez bûm yê te bir mala xwe î
 bi odeyekê
 Ne tu bû a li ber sobê kincên xwe ziwa kir
 Ne ez bûm
 Ew ê doşek û balîfa xwe da te
 Û li erdê raza
 Ne em bûn, ne em bûn
 Yên piştî wê şevê bûn heval
 Di dest de gul û dimeşîyan
 Û guh nedida teqîna çekan
 Ne tu bû ewa şehîd ket
 Ne ez bûm ewê stûxwar mayî
 De ka rabe hevalê
 De ka bêje ev henek bû
 Bêje va ez li jîyanê me
 Va ez li ba te me
 De ka bêje ev xewn bû
 Xewneke pir bi tirs bû
 De ka bêje va xelas bû
 De ka bêje hevalê, heyranê...

Çend nameyên Nûredîn Zaza

ji Firat Cewerî re

Di sala 1984'an de têkiliyên min yên bi nameyan bi Nûredîn Zaza re çêbûn. Di hundurê çend salan de me gelek name ji hev re şandin. Lê mixabin, tu carî nebû qismet ku ez wî bibînim. Ew bêguman rewşenbîrêkî kurd yê bijarte bû. Wî bi koçkirina xwe di dîroka rewşenbîriya kurdî de cihêkî mezin vala hiştîye. Bi hêviya ku wê şûna vî rewşenbîrê kurd yê bi rûmet were dagirtin, em çend nameyên wî yên ku her a niha di cihêkî din de nehatine weşandin, diweşînin. Bi vê hincetê, em dixwazin bi bîr bînin ku di dîroka edebiyatê de, name cihêkî mezin digirin. Ji xwe name, bîranîn, resim, notên rojê yên mezin û rewşenbîrên kurdan ji bo rohnîkirina dîroka kurdan gelekî pêwîst in.

Nameyên ku Nûredîn Zaza ji min re şandibûn ji van bêtir bûn, lê belê ez li malê geriyam negeriyam min ji van pê ve nedîtin. Ger ez di rojên pêş de li dawîya maye rast werim û îmkân hebe, ez ê wan jî biweşînim. Di weşandina van nameyan de ez têkîlî zimanê Zaza nebûm, wî çawan nivîsandibû, me jî ew wilo weşandin. Bi hêviya ku wê di pêşerojê de bi kêr werin...

F. C.

Lausanne le 16. 5. 1984

Firatê delal,

Min nameya te ya 8. 5. 84 û Dîwaneke te wergirtin. Ji bo herduwan jî gelek spas. Di helbestên te de cewher heye; dom bi nivîsandinê bike û Hawar bîr bêtir bixwîne. Kurd şiyar bûne û pêşde diçin. Nexweşiyên wan ên kevin hîn xurt in: eşîrtî, neyekbûn, bêbextî û serbişkî, bi korantî, xwe bi tiştên ji derve hatî re girêdan. Berê misilmantî bû û niha jî çepîtiya xwar (Marksîzm- Lenînizm ji wan re bûye ol û her yek ji wan filozofekî bê hempa ye..., ango sofîyên me yên berê ne...)

Hêvîdar im ku çavên wan zû vebel!...

Li vir dibistaneke min heye; ez tê de frensîzî didim xwendin. Programa xwe dişînim. Heke di întersîtêkê de bidî dalîqandin baş dibe. Heke hun dikarin kitêba min "Ma vie de Kurde" bidine wegerandin Swedî. Li ba Bozarslan heye.

Êdî geşîya we

Nûredîn Zaza

Hevrêyê delal,

18. 8. 1984

Ez spasdarê nameya te 10. 7. 1984 a me.

Çûna te Parîsê ez dilxweş kirim. Tu xwe xweş li zimên û çanda kurdî mijûl dikî; berxudar bi û dev ji vê xebatê bermede. Di rojên tro de, ev xebat tişteki bingehîn e. Ez bi xwe, weke berê, êdî nikarim herim civînan. Ev niha karê we xortan e.

Niha, ez tu tiştê nû nanivîsim. Çend nivîsandinên min ên keyn hene. Yek ji wan, birek ji biranînên min e. Bi kurmançî ye. Kurdek ji Parîsê hatibû vir. Me ew bi hev re xwend. Pişt-re, ewî defter bir û vegeya Parîsê. Dibe ku, bi destê INSTITUT bête çapkirin. Çend helbest û "Lîzên-Temaşa" yên min ji hene. Niha razayê ne.

Nûçeyên libeçketina Kurdan li Ewropa digehin min û dilê min diperitînin. Li derve ji hev dikujin. Ev çi bextreşî ye ku li stûyê me sîwar e û dev ji me bernade?!...

Nivîsandîneke min di HAWARÊ de heye ûsa digehe dawiyê: Nezanî, nezanî, perîşanî!... Ev rewş hîn neguhertî ye û dom dike.

Bi hêviya ku miletê me ji rojekê çavên xwe xweş veke û çarenûsa xwe baş têxe destê xwe...

Nûredîn Zaza

Xortê delal û bêja,

12. 10. 1984

Di nameya xwe de tu behsa dijwariyên nivîsevanên kurdî dikî. Duhi, radyoya (pêlweş) Swîsra (Isvîçre) ya bi frensizî ez vexwendibûm (dawet kiribûm) ku ez li ser nivîsevan û hunermendên Kurd baxêvim. Nêzîkî saetek û nîv min xeberda. Di axaftinên xwe de, min behsa nameya te kir, bêt ku navê te bidim. Min qala Îsmail Beşîkçî jî kir û gelek pesnê wî da. Min navê Yaşar Kemal jî anî. Min got ku Kurd e, nivîsevanekî mezin e, lê, çawa nikare bêje ku kurd e. Min dîsa got ku heke Kurd azad biwana ew ê ji wan nivîsevanên pîr bi nav û deng derketana...

Piştî mirina Yılmaz Güney jî ban min kiribûn; hingî jî, nêzîkî saetek min axaftibû. Çi ji destê me tê, em ji bo miletê xwe yê perîşanî dikin. Lê, em çawa bikin, ji dijminên me yê derve bêtir, em neyartiya xwe dikin: eşîrtî, neyekbûn û bêbextî.

Di kovara Berbang de, te gotinên hin peyayên mezin wergerandine kurmançî. Ev xebateke ne xirab e. Min jî, di Hawarê de, hin nivîsarên biyanîyan wergerandine Kurdî. Helbesta R. Kipling, a pîr bi nav û deng "IF"-EGER, bi min re xweş derketibû. Gelo te ew xwendiyê?

Tevê vê xebata ha, divê ku em gotinên mezinên kurdî jî ji kurdan re bidin nas kirin. Wek Cizîrî, Xanî, Siyeh Pîş û hin. Di pêsgotina Memê Alan de, min Ehmedê Xanî, Hegel û Marx danîne ber hev û min nişan daye ku berî van herdiwan, Ehmedê Xanî bi "diyalektîk" hesiyabû. Heke te ev pêsgotin nexwendibe, Memê Alan peyda bike û bixwîne. Çapa Ewropa heye. Reşo Zîlan bi vî karî rabûbû. Ev kitêb bi xwe, niha, li ba min nemaye.

Di "Kulîlk" de "Şîretên Ehmedê Xanî" derketibû. Ev tişt, bivê nevé, bi destê te çêbûye. Gelek spas. Lê, mixabin ku tê de gelek şaşiyên çapê hene...

Hun, Kurdên Swêdê, xweş dixebitin, dom bikin. Lê, kurmanciya xwe pir tevlihev mekin. Carna, ez bi xwe, ji nivîsandinên hinekan tu tişt fehim nakim...

Êdî, xweşt û serfiraziya te.
Nûredîn Zaza

Nivîsevanê me yê delal,

8. 12. 1986

Min nameya te ya 15. 11. 86 wergirt, gelek spas. Tu ji gotinên "devavêtinên min-rexne-" min ne xeyidiye, mala te ava. Ez hez dikim ku xortên wek te ku hej ji nivîsandinê dikin xwe hîni hemî awayên nivîsandinê bikin. Û çîqa ji we tê, binivîsin. Divê ku kurdiya we, her diçe, siviktir, bi rengtir û xurtir be. Jiynîna we li Swêd bextyariyeke mezin e; ev kêseke welê ye ku nakeve destê hemî kurdên Ewropa. Li Swîsre, hîkûmet qirseke nade ji bo çanda kurdi û li Elmanyayê jî rê venakin ku zarokên kurd bi zimanê xwe bixwînin.

Min "Xewna Orhanov" careke di xwend: xewn û rastî xweş bi hev re hatine girêdan. Hêvîdar im ku rojek berî rojekê Orhanov wê bibe wezîrek li Kurdîstana azad buyî!

Ez pir dixwazim ku kitêba te xweş bête firotin; lê li vir bi xwe, li dora min, kurdên xwendevan nabinim. Ên tîna cem min, "bextxwestiyên" dora Maraş, Antep, Adiyaman in. Dixwazim ku xwe li ber hikûmetê kurdên siyasî bidine zanîn. Lê, gava ez ji wan re behsa Kurdîstanê dikim, kitêb û rojnameyên kurdi ku dikevin destê min, şanî wan didim, ruyê xwe jî wan dizîvirînin. Lê, dixwazim ku ez ji wan re tercîmaniyê bikim, an jî "îtirazan" binivîsim ku bikaribin li Swîsre bimînin, bixebitin û pere kar bikin...

Êdî ez geşîya te dixwazim û, ji nihî da, sala te ya nû pîroz dikim.
N. Z.

Biraziyê delal,

Min karta te ya pîrozîyê wergirt. Gelek spas. Ez jî dixwazim ku 1987 ji te re û ji gelê me re ya xweşt, geşt û serfiraziyê be...

Min li ser kurdên Tirkîyê û nemaze li ser Beşikçi bendek dabû rojnameke Lozanê.

Hinek dirêj bû; bi giştî derneket. Heke tu dikarî bidî rojnamekê swêdî, ez ê wê bi timamî ji te re bişînim. Ha ji te re para ku di rojnamê de derket. Ji kerema xwe, fotokopiyekê jê bişîne Mamoste Bozarlan.

Tevî silavên min ên germ.
N. Z. 20. 12. 86

Firatê delal,

Lausanne, 20 havîna pêşin 1987

Nameya te ya dawîn jî gîha destê min. Beriya wê, karta te ya jî Qamişloke jî hatibû. Ji bo her diwan û nûçeyên te gelek spas. Siyaseta Sûriyê niha rê dide kurdan ku şahiyan bikin; tiştekî ne xirab e, li gora berê, gava em digirtin û didan ber çogan... Kêseke baş e jî bo pêşde birina çanda kurdî...

Ji Rewşen Xanim Rêzimana rehmêtî mîr Celadet xwestibû. Ji min re nivîsand ku ew da-ye te. Gelo te ew bi xwe re anî?

Ji bo "Hêvî" tiştên ku tu ji min bipirîst, ez ê bi dilxweş bersivên wan bidim.


Êdî, xweşî û serfiraziya te.

N. Z.

Şerîfê delal û hoja, 12. 10. 1984

Di nameya xwe de tubeksa dijwarîyên nivîsavanên ^{kuştî} Duhî. radyaya (Pêlucê) Swîs ^{Fransî} ya bi frensîjî ez vexwendibûm (dawet kiribûm) ku ez bi ser nivîsavan û Rûnermen-
dên Kurd baxêvîm. Hêzî sêrtek û niv min xeberda. Di axaftinê xwe de min tubeksa nameya te kir, bêt ku navê te kurdîm. Min Qala Ismael Be-
dikî jî kir û gelek jêrî wî da. Min navê yasar Kemal jî anî. Min got ku Kurd p. nivîsavanêki nîzîkî, lî, çawa nikare bîr ku Kurd e. Min dîda got ku hawî Kurd azad bûwina ewê jî wan nivîsavanên jêr ku nav û deng derxelana...

Pîştî minna yemaz Gûnç jî ben min kiribûn, hegê jî wezîrê sêrtek min arastibû. Çi jî çêrê me kirînz



EV JI BER XWE VE WILO YE

Mayakovskî

*Dema mirov nû tèn dinê
hezkirin di dilê wana de ye.
Lê di nav her babet erk û vatînî,
ber û hatînî û tiştên din de
roj bi roj distewe hezkirin,
ew hîva li dora dilan
wek a li dora dinê.
Dil di bedenê de ye,
beden jî di îşlik de.
Lê ne hew ev tenê ye.
Ehmeqin jê qedîfe jî li xwe dikin,
bi qaîşan, di ser sêngê re tê avêtin.
Lê dema mirov pîr dibe,
mirov baştir fam dike.
Mêr jîmnastîka Muller dike
jin jî xwe dixemilîne.
Lê êdî pirr dereng e.
Rû xav dibe
çerm diqermiçe.
Evîndarî jî wilo ye
wek gulan vedibe,
û bi dû re diçilmise.*

Wergera ji swêdî: Suleyman Demîr

Ji şîtra EZ HEZ DIKIM

ZERDEŞT PÊXEMBER

B.Z 637-560

Pîştî ku jiyana mirovan li dinyayê dest pê kiriye, nezanîn û xirabî jî li nêv wan dest bi jiyana xwe kirine. Ew nezanîn û xirabî rewşa jiyana mirovan her tim guhartine, awane xirabtir daxistine nava wan û ew bi sosretine mexof dane bilêckirin; mirov ji mirovan re bûne kole û bindest, hinek jî ji hinekan re bûne bûjena kêf û devera zewqê. Di nava mirovan de niheqî, xirabî, dek û dolabtî hertim serê xwe girtine û çûne. Îcar ew bîrûbaweriyên ku karibûne ji wan sqûmatan re bibin asteng û rengê jiyânê biguhirînin, pir kêr bûne yan hiç nebûne. Ji ber hindê îcar Xwedayê dilovan di her dem û çaxekî kifş de, mirovekî ku ji xirabiyan dûr bû, herweha paqij û ku pêbawer bûye rakiriye û wî bi xeysetê pêxembertiyê daye naskirin: Jê re Wehî hinartiye, pirtûk hinartine û ew rûqalê xweşiya zatê xwe jî kiriye; erênî û neyênîyên xwe pê dane zanîn. Îcar wî pêxemberî ew fermanên Xwedê pêşkêşî mirovan kirine û riya rast nîşanê wan dane.

Li ser vê yekê mamosteyê nemir Ehmedê Xanî di pirtûka xwe ya bi navê **Eqîdeya Îslamê** de weha gotiye:

"...Ruknê Çarî: Baweriya (bi) pêxemberan e ku (di) her qernekî (de) Xwudê însanekî pak ê ji gunehan, ji hemî xelqê weqta xwo esdeltir (qencitir) bi kerema xwo kirye pêxember; mu'cizat danê ku kesekî digel quweta (wî pêxemberî) beranber nebûye, wehî ji bo şandiye ku emrê Xwudê bigehîne nav xelqê.

(Pêxember) sed hizar û bîst hizar û çar hizar in (124.000).

Ûlul'ezm (ji pêxemberan) pênc in: Nûh û Îbrahîm,



Zeynelabidin Zinar

Mûsa, Îsa û Muhemmed ssee.

(Pêxemberên) *xwudanêt ummeta, sêsed û sêzde* (313) *ne.*

Ê (Pêxemberên) *di meşhûr: Adem û Şês û Idrîs û Nûh û Hûd û Salih û Îbrahîm û Lût û Îsma'îl û Îshaq û Ye'qûb û Yûsif û Eyyûb û Şû'eyb û Mûsa û Harûn û Xidr û Yûse' û Ilyas û Yese' û Zulkîfl û Şe'yûb û Şemuwîl û Yûnis û Dawud û Suleyman û Zekerîya û Yehya û 'Uzeyr û Îsa û seyîd-ul murselîn Muhemmed sese...*"⁽¹⁾

Xwedayê bi tenê gava xwestiye ku mezinatiya xwe bide nîşandan, erênî û neyênîyên xwe bi afirîndatan (mexlûqat) bide pejirandin, vê dinyayê afirand. Afirandina dinyayê jî, li gorî baweriya ola bisilmantiyê, ji cewhera Mihemed Pêxember çêbûye. Û bi çêbûna Ademî, bi afirandina Hawê ji binçenga wî, mirov ji wan çêbûne û dest bi jiyana li vê dinyayê kirine.

Pêxemberê pêşî, Adem bûye. Mihemed jî, pêxemberê dawî bûye. Digel Adem û Mihemed Pêxember, 124 000 pêxember hatine dinyayê. Ji wan pêxemberan hinek **nebî** bûne ku tenê pêxember bûne, lê li mala xwe rûniştî bûne. Ji wan pêxemberan 313 heb, berpirsyarê bi danasîna erênî û neyênîyên Xwedê bûne. Lê di Qurana pîroz de, tenê navên 28 pêxemberan hatiye bilêvkirin.

Li gorî ola bisilmantiyê, Xwedê 104 pirtûk ji pêxemberan re hinartine. Çar ji wan pirtûkan mezin bûne, weke: **Tewrat** ku ji Mûsa Pêxember re hatiye hinartin, **Zebûr** ji Dawid Pêxember re hatiye hinartin, **Incîl** ji Îsa Pêxember re hatiye hinartin û **Quran** jî ji Mihemed Pêxember

re hatiye hinartin. Ew sed pirtûkên din jî, mîna keşkolê piçûk bûne (suhuf) û her yekê çend rûpel bûne. Ji wan deh (10) heb ji **Adem** Pêxember re hatine hinartin, deh heb ji **Brahîm** Pêxember re hatine hinartin, 30 heb ji **Idrîs** Pêxember re hatine hinartin û 50 heb jî ji **Şîs** Pêxember re hatine hinartin. Lê belê li gorî mêjû û belgeyên dîrokî, hinek pirtûkên Xwedê yên din jî hebûne ku behsa wan di ola bisilmantiyê de nehatiye kirin. Yek ji wan, pirtûka Hindiyana a bi navê **Gu-hayan** e, ya din jî **Avestaya Zerdeşt Pêxember** e.

*

Ev yek diyar e ku piraniya pêxemberên Xwedê, ji Rojhilata Navîn, xasma ji nijada Ereba û Cihûyan rabûne. Lê çewa ku Xwedayê dilovan di Qurana pîroz de daye zanîn, ku wî ji her miletekî zilamekî pêbawer û zana rakiriyê û ew kiriye pêxemberê xwe. Îcar bi riya wî pêxemberî erênî û neyênîyên xwe bi zimanê wî miletî daye gotin.

Nexwe madem ku rewş ev bûye, îcar ev pirs girîng tê bîra mirov: Gelo, ew 124 000 pêxemberên ku hatine dinyayê, hemû ji nijada Ereba û Cihû rabûne?

Helbet, bersiv na ye. Lê eger bersiva hinekan *erê* be, ew kes nisbera firq û mêlîtîyê bi bal Xwedê ve didin ku Xwedê firq û mêlîtî di navbera evdên (qûl) xwe de kiriye û pêxemberên xwe hemû ji Ereba û Cihûyan rakirine, ji miletiên din ranekirine. Helbet tişteki wisan ne sezayê Xwedê ye ku kiribe.

Bê guman çewa ku Ereb û Cihû evdên Xwedê ne, Kurd û milletên din jî her wisan ew tişt in. Îcar bo çî dîroknasên Ereb, Cihû û Asûr hewqasî di biwara Zerdeşt Pêxemberê Kurd de bi xirabî nivîsandine?

Dîroknasên bêteref, vê yeka Ereb û Cihûyan bi nijadperestiya wan ve girêdane. Ji ber hindê, çî pêxemberê ku ji nijadeke din rabûye, xasma Ereb û Cihûyan êrîş birine serê û ew bi xirabî nasandine.

Lê jixwe haşa û mandelkirina Zerdeşt Pêxember, diyar e ku ji ber kînedozîyeke siyasî ya rewşa Kurdistanê çêbûye. Lewra hêj di sedsalên VII, VIII û IX'an de gava Kurdistan ji aliyê leşkerên Ereb ve hatibû vegirtin, navê wê danîbûne "Mintûqet-ul Cebel" (Herêma Çiyayê) û bab û bapîrên hemû xuyaniyên Kurdan di azbata (secre) erebî de wek Ereb dane nivîsandin. Piştî wê yekê jî, bi hemû hovîtiyên mexof êrîş birin ser ola Serdeşt Pêxember û di "mêjû" de Ola Bahdînê bi xurafetî û sêrbazî nivîsandine.

Di van salên dawîn de Zerdeşt Pêxember ji pir kesan re bûye devera meraq û vîne ku wî, ola wî, tewrên olî, felsefa wî binasin û bizanibin ka wî çî kiriye û çî nekiriye. Lê berî ku xwendevanên hêja dev bi xwendina vê nivîsa me ya li ser vî pêxemberê kurdnijad bikin, em ê bala wan bikişînin ser berhem û belgeyên dîrokî ku -çî bi rindî û çî bi nerindî- di derheqê Zerdeşt Pêxember de hatine nivîsandin û bi gelek zimanan jî di çapemeniya pir welatan de weşiyane. Hinek ji wan berheman, reha xwe ta digehînin bi sedsalên Berî Îsa Pêxember jî.

Berhema herî dawîn a li ser Zerdeşt Pêxember, pirtûkek bi navê ZARAT-HUSTRA û bi zimanê tirkî ji aliyê Dr. Sirac Bilgin ve, di Sibata 1995'an de li Stenbolê hatiye çapkirin. Pirtûk, lêkolîna du salan e û berê bi dehan berhem û belgeyên dîrokî ye ku wî li ser Zerdeşt Pêxember nivîsiye. Me jî ew pirtûk seredor kir û şroveya wê nivîsî, pêşkêşî xwendevanên NÜDEM'ê kir. Berî ku ev nivîs çap bibe, me ew ji Dr. Sirac re hinart û jê hêvî kir ku di ber çavan re bibihurîne. Wî hin kêr û zêdeyîyên wê sererast kirine û şûnde hinart, hêj hatiye weşandin.

Malbata Zerdeşt Pêxember

Malbata Zerdeşt Pêxember, di nêv Împeratoriya Medê de malbateke xuyanî, esilzade ya Kurdnijad bû û bi navê malbata Spîtamayê dihate naskirin. Gundê ku lê dima, Patiragtaraspooyaya li keviya Çemê Deryayê, xwe di newaleke ji yê çemê Arasê ku bi daristan û darên pirtexlît ve xemilandî bû dihêwirand. Malbata Zerdeşt Pêxember, berpirsyarê olî bi navê magûyan navdarkirî bûye. Yanî malbata meleyan.

Ji wê malbata giranbiha re du lawên weke du gilokên zêr çêbûne. Navê yekî danîne **Poruşaspa** û navê yê din jî danîne **Erestî**.

Malbata diya Zerdeşt Pêxember jî, bi navê malbata **Freno** dihate naskirin. Ew malbat jî, ji esilzadeyên Împeratoriya Medê bûye û li Regayê rûdinişt. Qîzek ji jina **Freno**, **Frahîm Rivana Zaişa** xatûnê re çêbûye û navê wê danîne **Dugdova**.

Îcar li gorî pirtûkên olî gava ku qîzik çêbûye, ji asîmanan nûr rijiyaye xwarê û li ser serê wê weke tac vegirtiye.

Ji ber hindê oldarên demê li malbara **Frenoyî** hatine xezebê û ew ji Regayê qewirandine. Malbat çûye **Patiragtraspoyê** û li wir bi cih bûye. Piştî ku qîzik mezin bûye, bi **Poruşaspayî** re zewiciye. Îcar ew nûra Xwedê ku li ser serê qîzîkê bûbû weke tac, rewşa xwe guhartiye û bûye weke madeyê û rengê mirovan girtiye; di 26 Çiriya Pêşîn, Berî Zayîne 637`an de zarûkekî lawîn jê afiriye û bi devliken rojbaşî daye jiyane. Piştî navê lêwik danîne Zerdeşt.

Zerdeşt hêj di zarûktiya xwe de bi zanewerî, zîrektî û tîjîfehmi navûdeng daye, her kes bi qencî behsa wî kiriye û navê wî li dinyayê belav bûye.

Di derheqê jidayikbûna Zerdeşt Pêxember de, çendî ku tarîxeke serearst nîne jî, lê gelek dîrokzan û kurdologan jê re hin tarîx nivîsîne. Bi piranî gotine ku Zerdeşt Pêxember, 843 sal berî Îsa Pêxember çêbûye. Hinekan jî nivîsiye ku ew 258 sal berî Skender çêbûye. Lê **Dr. E. W. Westî** gotiye ku Zerdeşt Pêxember B.Z. di 660`î de çêbûye û di 583`an de jî miriye. Ji van tarîxan wêdetir, piraniya zanistmendên Ewrûpî gotine ku Zerdeşt Pêxember B.Z di 637`an de çêbûye û B.Z di 560`î de jî miriye.

Li gor pirtûkên olî, çaxê Zerdeşt ji nûrê afiriye û dest bi jiyane kiriye, sê mûcîzeyên balkêş çêbûne.

1- Ruhniyeke tîrêjdar ji aliyê **Ahûra-Mazda** (Xwedayê bi tenê) ve li dinyayê

belav bûye.

2- Rihê ganiyan ji xirabiyê hatiye parastin.

3- **Ahûra-Mazda** bi du milyaketên xwe **Xurdad** û **Murdad** re nişaya madeyê gihandiye dê û bavê Zerdeşt Pêxember.

Berî hatina Zerdeşt Pêxember, çewa ku hatina pêxemberê demepêşê di hemû pirtûkên Xwedê de hatiye mizgînîdan, pirtûka Hindiyan **Guhayanê** jî berî sê hezar salan hatina Zerdeşt Pêxember mizgînîdaye. Herweha Xwedê di pirtûka Mezdaiyan de jî ku navê wê **Dinkerd** e gotiye ku, "*heqî li ser destên Pêxemberê min Zerdeşt çêdibe.*"

Berî hatina Zerdeşt Pêxember, du sêrbazên Tûrayan, **Durasobo** û **Bratokreşî** pê hisiyane ku wê pêxemberê bê û dê rîya rast nişanî xelkê bide û dê wan bê rûmet bike. Wan xwe ji bo kuştina wî pêxemberê demepêşê hazir kirine. Îcar çaxê ku Zerdeşt Pêxember hêj zarûk bû, bi zanewerî, zîrektî û zanistî ku navûdeng daye, di heftsaliya wî de ew herdu sêrbaz hatine û pê re niqaş kirine. Zerdeşt zora wan biriye û ew di nava xelkê de bêrûmet kirine. Piştî wan bi hostatî jehrî dane Zerdeştî da ku bimre, lê Xwedê ew ji mirinê parastiye. Piştî wê bûyerê navûdengê Zerdeşt Pêxember belavtir bûye û şuhreta wî qat bi qat berz gerraye.

Zerdeşt Pêxember hetanî jiyê xwe yê pazdehan, di hemû şaxên zanistiyên dinyayê de gihajtiye radeya herî bilind û xwe ji bo pêxembertiyê amade kiriye.

Li gorî pirtûka **Zat Sparamê**, Zerdeşt hêj di salên xwe yê zarûktiye de bû, ge-

lekî sergiran û bi merhemet, hiskiroxê kal û pîran bûye; li jar û bêwaran xwedîtî kiriyê. Ne tenê li pêşberî mirovan, herweha li pêşberî hemû cûre heywanan jî her wisan bûye. Heta ku di saleke axlêfeyê de alif (ka û giya) ji kadînên bavê xwe derxistiye û biriye daye heywanên xelkê yên birçî.

Li gorî **Zerdeştnameyê**, ew nasnavên dilovan, camêr û qencîkrox ên Zerdeşt Pêxember, ji aliyê xelkê ve bo wî hatine dayîn. Her dîsan li gor eynî berhemê, gava ku Zerdeşt 15 salên xwe dagirtiye, mal û milkên bavê xwe di nava birayên xwe de dabeş kiriyê û ji xwe re tenê kemberek (2) jê hildaye, daye piştê xwe û xwe daye riya **Ahûra-Mazda** (Xwedayê bi tenê), têkiliya xwe ji kar û îşên dinyayê birriye û li riya rast ajotiye.

Gava jiyê Zerdeşt gihaye 30`î, di nêv axa Medistanê de rojê ku li keviya çemê **Arasê** (3) dima, sezayê wehya **Ahûra-Mazda** (Xweda) bûye; bi pêxembertî hatiye vebuhtîkirin, çûye ketiye şkefteke li çiyayê **Sabalanî** û tê de heft salan perestîni (zîkr û îbadet) ji xwedê re kiriyê. (4)

Zerdeşt Pêxember piştî heft salên di şkeftê de gava derketiye, 30 rojan peyatî li rê çûye û li Gola Ormiyê rast hatiye, daye ser ava golê û bi fermana Xwedê di ser re bihuriye, çûye û roja 20`ê adarê gihaye bajarekî. Ew roj li bajêr pîrozkirina Cejna Biharê hebûye û her kes di kêf û xweşiyê de bûye. Zerdeşt Pêxember ji xelkê re riya rast gotiye, behsa pêxembertiya xwe kiriyê û gotiye ku: "*Ahûra-Mazda* (Xwedayê bi tenê) *her tiştî îdare dike.*" Akinciyên

bajêr kêfa xwe ji Zerdeşt Pêxemberî re pir anîne, qedr û siyaneta wî girtine û giranbihatiyeke zêde danê, lê kesî ola wî nepejirandiye.

Lê gava Zerdeşt, pêxemberîtiya xwe û **Ola Bahdînê** eşkere kirine, karbidestên welêt pir jê bêzî kirine, i pêşberî wî derketine û jê re bûne asteng, lê hatine xezebê heta ku ji ber wan reviyaye û xwe wenda kiriyê. Lê karbidest ji bo kuştina wî li dû geriyane. Cih li Zerdeşt Pêxember teng bûye û gazin ji felekê kirine, ji **Ahûra-Mazda** (Xwedê) re gotiye: "*Ez herim kîjan welatî? Ji bo revê berê xwe bidin kû? Wan ez ji malbata min û ji ba nasên min qewirandin. Ne civat û ne jî karbidestên welêt bi min bawerî anîn. Ya Ahûra-Mazda, ez çewa te bi wan bidime bawerîkirin?*" Û heşt salan derbeder li çol û pasaran geriyaye.

Di wan heşt salên gerê de, şeş carn **wehî** ji ba **Ahûra Mazda** ji Zerdeşt Pêxember re hatiye û piştê Xwedê ew careke din vexwendiyê ba xwe û pê re hevdtîtin kiriyê.

Weya Pêşî:

Rojekê Zerdeşt Pêxember di neqeba çiyayên *Hûgar* û *Ahûgîdî* re diçû, sermelek **Vohu Mano** hatiye û jê re wehî aniye, fermaneke Ahûra-Mazda dayê ku ew perpirsyarê êş û derdan û yê giliyê heywanan e. Piştê **Vohu Mano** Zerdeşt Pêxember hildaye û biriye mekanê Xwedê.

Zerdeşt Pêxember ji wê rojê û şûnde bigorîkirina ganiyekî (heywan) ji bo ganiyekî (mîrov) din qedexe kiriyê û li derbe-

deriya xwe domandîye.

Weya Diduyan:

Careke din Zerdeşt Pêxember li keviya çemê **Togan** 'î bûye, milyaket **Aşa Wahîsto** hatiye û wehî jê re aniye, ferman Xwedê dayê ku ji bo pêdiviya mirovan bila hertim agir bête veşartin. (5)

Weya Sisiyan:

Li **Sarayê** sermelek **Şatvêr** hatiye û wehî jê re aniye; fermana Xwedê dayê ku zêr bila ji bo şeran neyête bikaranîn.

Weya Çaran:

Sermelek **Spenta Armaût** li çiyayê **Asnavad** 'î, li ser serkaniya çemê **Daitya** wehî ji Zerdeşt Pêxember re aniye, fermana Xwedê dayê ku bila ruyê erdê ji texprîbatan bête parastin; her herêmek têkeve destên yekî pêbawer, ji her deverekê re dadmendekî adil, ji her navendekê re berpirsyarekî olî (magû-mele), mecliseke rûhanî digel serokekî ji bo hemû sazgehên olî bila bêtin kifşkirin.

Weya Pêncan:

Cara pêncan sermelek **Haurvatat** li çiyayê **Asnavad** 'î wehî ji Zerdeşt Pêxember re aniye û fermana Xwedê dayê ku bila av, çem û derya bêtin parastin.

Weya Şeşan:

Cara şeşan û ya dawîn, sermelek **Amerratat**, ne li devereke kifş lê li gelek deveran, xasma li keviya çemên **Darej** û **Daît** wehî ji Zerdeşt Pêxember re anîne û ferma-

na Xwedê dayê ku bila şînahiya ruyê erdê bête parastin.

Piştî wan şeş wehyan û hevdîtînen Zerdeşt Pêxember bi sermelekan re, êdî ew di pêxemberitiya xwe de kamil bûye û careke din **Ahûra-Mazda** (Xwedê) ew biriyê asîmanê jorîn, wî sezayê rûqalkirina bi xwe re kiriye û gelek tiştên nihênî jê re eşkere kirine. Lê di vegeerê de (Xwedê) gotiyê ku *wê dijmin riya te bibirrin. Heta ku ji te bê, nehêle ku ew têkevin nava gûnehan.* Îcar çaxê ku Zerdeşt Pêxember ji ba Xwedê daketiye erdê, dijminê mezin, şeytanê ku navê wî **Bûhîtî** bû hinartiye keviya çemê **Daraj** 'î, da ku Zerdeşt Pêxember bikuje. Lê **Ahûra-Mazda**, Zerdet Pêxember ji siqûmatan parastiye.

Bi kurtî Zerdeşt Pêxember B.Z di 637'an de li **Patiragtraspoyê** hatiye dinyayê û navê bavê wî **Poruşaspa** û yê diya wî **Dugdova** bûye, di salên 30'î de ew bûye pêxember û bi alikariya şeş sermelekan pirtûka **Avesta** ji ba Xwedê jê re hatiye, di jiyê 77'an de B.Z sala 560'î li bajarê **Belxê** di perestîngeha **Nush-Adarê** (Noşadar) de bi destên **Bradrorêşê** Tûrayî (Tirk) hatiye kuştin. Li gorî **Salnameya Zerdeştîyê**: Navê meha mirina Pêxember: **Artavahîsto**, navê rojê jî **Xûr** bûye û ji salê meha diduyan, roja yazdehan bûye. Li gorî **Salnameya Mîladî**, ew roj rastî yekê **Gulanê** dibe. Çaxê ku Zerdeşt Pêxember miriye, jiyê wî 76 sal û 40 roj bûye.

Çend ramanvanên dîrokê ên navdar **Berî Zayîne** û piştî wê ku li ser Zerdeşt Pêxember nivîsîne, ev in li jêrê:

Altheim (1957)

Argentorati (1710)
 Bar Behlûl (936)
 Bar Eli (832)
 Ctesias (B.Z 401)
 Eugene Burnouf (1833)
 Halle (1947)
 Haug (1860)
 Henning (1974)
 Henry Lord (1732)
 Hermippusî (B.Z. sedsala diduyan)
 Jackson (1899)
 Jules Oppert (1862)
 Mills (1892)
 Perron (1771)
 Qezwîni (1263)
 Sir Henry Rawlinson (1855)
 Weber (1861)

Herodot (B.Z 401) gotiye: "**Magû**, yek ji wan şeş eşîran e ku **Împeratoriya Medê** avakirine. Herweha *Magû*, rewşenbîrên wê demê bûne û pêşiktî ji hemû olên berî Zerdeşt Pêxember re jî kirine."

Dîroknasê bi navûddeng **Erdeşêr F. Xeberdar** (1951) gotiye: "*Niha li ser zinarên çiyayê Teyrê Hindê helbestine olî yên zerdeştîyê nivîsandî bene û hemû pêxemberên ku piştî Zerdeşt Pêxember hatine, li rêçika Zerdeşt Pêxember ajotîne û xwe bi xwedayekî bi tenê ve rabeste kirine.*"

Qezwîniyê ku yek ji nivîskarên navdar ê bisilmantiyê bû, eşkere kiriye ku Mihemed Pêxember (ssxl) gotiye: "*Di navbera Adarbêcan (Azerbêcan) û Ermenistanê de çiyayek bi navê Sebalan heye. Di wê çiyayî de pêxemberek veşartî ye. Li navsera wê çiyayî biharine dirêj çêdibin û avên wê jî mîna qeşemê sar in. Germiya quntarên Çiyê,*

xelkê dikişîne xwe. Li serê serçimka Çiyê darek heye. Heywan nêzî giyayên li binê wê darê nabin. Gava heywan nêz dibin, ditirsin û ji wir direvin. Çi heywana ku giyaya wir bixwe, di cih de jî dimire."

Serkeftina Zerdeşt Pêxember

Berî wehya pêşî ku ji Zerdeşt Pêxember re hatiye, jê re diyar bûye ku wê serokê ordiya herî navdar li dinyayê ya **Împeratoriya Medê** ola wî bipejirîne û wê jê re bibe alîkar ku ew **Ola Bahdînê** li dinyayê jî belav bike. Îcar di wê navê re deh sal bihurîne, **Madyomahê** kurê **Arastayê** mamê Zerdeşt Pêxember, çûye wî (Z.Pêxember) li keviya Çemê **Darej`î** di nêv qamîşgehekê de dîtîye, olawî pejirandîye û pê bawerî (îman) aniye. Bi wê yekê kêfa Zerdeşt Pêxember pir hatiye û derketiya hizûra Xwedê gotiye:

"Ya Ahûra Mazda! Li serkeftina min a deh salan binere ku min tenê mirovekî vegerande ser rîya ras!"

Xwedê jî gotiyê:

*"Ya Pêxemberê min! Tu her semaxê bike. Wê roj bê û tû dê bibînî ku tenê çend mirov mabin ku **Ola Bahdînê** nepejirandine. Lê rabe, tu bi tena serê xwe here koşka **Qiral Wiştaspî.**"*

Ew çax **Ola Qerpezakî** li koşka Qiral Wiştaspî serdest bûye. Çaxê ku Zerdeşt Pêxember çûye koşkê û Qirêl vexwendîye ser **Ola Bahdînê**, Qiral Wiştasp wî avêtîye zîndanê, ew bi zincîran girêdane, lê îşkence kirine û bi rojan tihî û birçî hiştîne. Lê Pêxemberê Xwedê bi hunera îmanê filitiye û derketiye derva, çûye ser ba-

nê koşkê, bèn xwe jê re qelaştiye û ew daketîye jêrê, ba Qirêl. Vê carê Qirêl wî ceribandîye û jê sih û sê⁽⁶⁾ pirs pirsîne. Zerdeşt Pêxember bersîva wan pirsan tev bêkêmasî daye. Qiral û civata xwe lê şaş mane. Hema di wê gavê de, xebera nexweşiya hespê Qiral Wiştaspî hatiye koşkê. Qirêl gotîye Pêxember:

- Eger tu hespê min xweş bikî, ez dizanim ku ola te êdî rast e.

Zerdeşt Pêxember rabûye ji koşkê derketîye û çûye ba Hespê Qiralî, bi ser ve xwendîye û pêre pêre Hesp daye xwe rabûye ser nigan. Wê hingê Qiral xwe avêtîye ser nigên Zerdeşt Pêxember û pê îman anîye. Lê Xwedayê mezin fermanê daye sermelek **Wohuman**, **Aşa Wahiştô** û **Burzîn Mîtro** ku herin xwe nişanî Qiral Wiştaspî jî bidin, da jê re çu guman nemîne. Lê gava ku milyaket xwe pê dane nişandan, Qiral tirsîye û ketîye tayê, milyaketan gotîyê ku ew milyaket in û **Ahûra Mazda** ew hinartine, da ku li ser destên Zerdeşt Pêxember were îmanê.

Pîştî ku Qiral Wiştaspî hatiye îmanê, li dû wî jina wî **Hutaosa**, birayê wî **Zairî-wairî**, keça wî **Homa**, herdu kurên wî **Spendo-Data** (Ku Faris dibêjine wî Esfendiyar) û **Pêşotano** îman bi Zerdeşt Pêxemberî anîne û **Ola Bahdînê** pejirandine. Di wê gavê de ji eynî malbatê sih û yek kes bawerî bi olê anîne û bûne **Bahdînî**. Piştî wan, **Fraşaustrayê** wezîrê Wiştaspî ku xezûrê Zerdeşt Pêxember bû digel kurê xwe **Hvadayêna** jî hatine îmanê û **Ola Bahdînê** pejirandine.

Pîştî Madyomahê pismamê Zerdeşt

Pêxember bi demekurtekê şûnde, nozdeh kesên ku li dinyayê xuyanî bûne hatine îmanê û **Ola Bahdînê** pejirandine.

Çaxê qiral Wiştaspa bûye Bahdînî, Zerdeşt Pêxember ji bona wî çûye li ber **Perestgeha Keşmîrê** dareke selwayê çandîye û navê wî li serê nivîsiye.

Ji ber ku Qiral Wiştaspa gelekî ji Zerdeşt Pêxember re dirust bûye, Pêxember lê ferman kiriye ku ew **Avestayê** binivîse. Îcar Qiralî **Avestayê** li ser çermê 12 hezar ga bi destên **Camaspî** daye nivîsandin û wê nusxeya esîl di arşîva seraya xwe de parastîye.

Li gor dîrokzan **Hermippusî** (B.Z. sedsala diduyan) di wê nusxeya **Avestayê** de bi milyonan rêz hebûne.

Li gorî gotina **Dabistanî**, di 232`ên Zayîne de gava xelîfê bisilmanan **El Mûte-wekîl** hatiye û wê herêma ku welatê Qiral Wiştaspayî bû vegirtîye, wê dara ku ew çax temenê wê 1450 sal bû, bi niyeta çêkirina serayek ji bo Caferîyan birriye. Herweha xelîfê fermanekê jî daye ku perestîgehên Zerdeştîyan hemû bêne rûxandin. Û hin bi hin fermana xwe hişktir û tûjtir kiriye, heta ku kevir li ser kevir nehiştine.

Lê Dabistanî ji gotina vê bûyerê re jî bêdeng nemaye û gotîye: "Gava Xelîfê wê dara Zerdeşt Pêxember birriye û piştî duse salan gewdê wê birine ku têxin dîwarên serayê, xelîfê ji nişka ve ta girtîye û di cih de miriye."

Welatên ku Ola Bahdînê lê belav bûye Gotina Zerdeşt Pêxember ya navdar ku ji

dinyayê re eşkere kiriye, ev bû: **Serbilda-na li pêşberî xirabiyê!** Îcar ew şîra Pê-xember, di demekurtekê de li dinyayê belav bûye û her kesî daye sêwirandin.

Êdî alîgirên Ola Bahdîne pir bûbûn. Oldar ji kesî neditirsyan û pişt xwe dabûne qiraline hêzdar, dewletine xurt û perestîni dikirin, ola nû li welat û şaristanan belav dikirin.

Di nava olê de kesên ku cara pêşî hati-bûne îmanê, bi **Paryotkişas** (Paoiryotkişas), (mîna sehabyên Mihemed Pêxember) dihatine bi navkirin û di nava xelkê de rûmeta wan pir hebû, xwedîsyanet û payebilind bûne.

Ola Bahdîne ne tenê li navrûwa Asya-yê, lê li gelek welatan belav bûye û wek oleke navnetewî hatiye pejirandin. Ji Romayê bigir heta Çînê, ew ol xwe li her deverê bi cih kiriye û her kesî aniye ser riyarast.

Li gorî **Avestayê**, danişvanên welat û herêmên ku di serê pêşî de hatine îmanê, ev bûne:

- 1- Sughdha/ Maweraunehir
- 2- Mourû/ Margiana
- 3- Bakhdhi/ Batria-Belx
- 4- Nisaya
- 5- Haroyû/ Areya
- 6- Vaikereta/ Kabil
- 7- Urwa/ Xezne
- 8- Khnenta/ Areya
- 9- Harahvaiti/ Araşosya
- 10- Haitumant/ Drangyana
- 11- Ragh/ Rey
- 12- Rangha/ Herêma Çemê Rehayê (Ne bajarê Rihayê ye).

13- Çakhra/ Lûxar

14- Varena/ Bûnîr.

15- Herêma Heftçemê/ Pêncab

Yek ji peyrewên Zerdeşt Pêxember ên di serê pêşî de ku li dinyayê bi navûdeng bû, **Spento-Datayê** kurê Qiral Vîştaspayî bûye. **Spento-Data** serdarê giştî yê ordiya bavê xwe bû. Serdarê bi navûdeng ji bo parastin û belavkirina **Ola Bahdîne**, fedekarîne giranbiha kirine û kesî ji tirsawewêre ku di biwara Zerdeşt Pêxemberî de nebûkariyan an lêvleqî bikira. Lê gava Serdarê Giştî **Spento-Data** xwestiye ku textê bavê xwe vegire û li şûna wî rûne, bav lê hatiye xezebê û wî xistiye **Zîndana Kela Çiyayê Gumbadan** û li kelemçe, lele û zincîran xistiye. Bi wê bûyera kur û bav dilê dijminan şad bûye û dost jî ponijîne.

Îcar çaxê ku **Arcaspê** qiralê Tûra bihîztiye ku Serdarê Ordîya Qiral Vîştaspî di zîndanê de ye, ji bo tola xwe bistîne, leşkerê pir zêde civandiye û li ber roja xwe nittiriye. Qira Vîştaspa rojeke ku çûbû **Seîstanê** mêvaniya **Rostemê Zal**, hema **Qiral Arcasp** rabûye û bi wî leşkerê pir êrîş biriye ser welatê Qiral Vîştaspayî û serbajarê wî **Belxê** vegirtiye. Leşkerên Tûrayî, serbajêr wêran kirine, tiştên xelkê yên giranbiha ji wan stendine û zêdetir jî ku ji perestîngeha **Nush-Adarê** pir bêzî dikirin, hilweşandine. Di wê demê de berpirsyarên olî (wek mele û şexan) heştê kes di binê şûran re bihurandine û li Zerdeşt Pêxember geriyane, lê geriyane ta ku wî di perestîngeha **Tûrbaratûrê** de dîtine. **Û Bradrorêşê** Tûrayê şûr li Pêxem-

berê Xwedê xistiye û ew li ser nimêjê kuştiye. Piştî şehîdkirina Zerdeşt Pêxember, îcar leşkerên Tûrayî dest bi bilêckirina Bahdîniyan kirine û piraniya kesên ku îman anîbûn kuştine.

Di dema bilêckirin û leyandinê de, Serdarê Ordiya Qiran Viştaspayî **Spento-Data** ji zîndanê hatiye berdan û dîsanê bûye serleşkerê dewletê, bi Tûrayan re şer kiriye, hêza **Qiral Arcaspî** ya leşkerî şikandiyê û ew ji welatê xwe qewirandine. Belê kuştina Zerdeşt Pêxember tîneke xirab lê kiriye û ew ji bo kuştina "kafir"an (Tûr) ranewestiye û Tûrayîyan kuştiye û kuştiye, ta ku çûye **Qiral Arcaspî** jî di welatê wî de kuştiye

Nivîsandina AVESTAYÊ

Avestaya orijînal a ku Zerdeşt Pêxember spartiyê **Qiral Viştaspayî** û ku bi destên **Camaspî** li ser 12 hezar çermên ga hatiye nivîsandin, bîst û yek nosk (beş) bûne.

Mana bêjeya **Avestayê** ya ferhengî, ev e: **Bingeh** yan jî **hilibijartina bingehê**.

Lê gava ku **Skenderê Romî** Medistanê û aliyê rojhilata wê vegirtine, ew nusxe û gelek berhem û bermayên zerdeştîyê wêran kirine.

Li gorî hin rîwayetên din **Avesta** û **Ola Bahdînê** ne tenê bi destên **Skender**, hêj di çaxê azabata **Pers Akaemenîdî** de hatine wêrankirin.

Avesta piştî wek **Tefsîra Quranê** bi zimanê **Pehlewî** jî hatiye şrovekirin û jê çend cild derketine. Navê wan cildan **Apastak** û **Zend** e. Lê di nava demê de ew herdu nav bi **Zendawestayê** hatine

guhertin. Sasaniyan jî di çaxê xwe de wê **Avestayê** kirine du beş. Beşeke wê kirine sê pirtûk û her yekê navêkî cuda lê danîne. Navê yekê **Vendîdad**, navê ya din **Vispêrad** û navê ya dîtir jî **Yasna**.

Vendîdad, tewr û rêveçûnên **Ola Bahdînê** beyan dike.

Vispêrad, xwendina xwestina (dua) li pêşberî perestîgehên Bahdîntîyê ye.

Yasna, ji 72 pişkan (cuz) hatiye holê û behsa ku bi çi hawayî **Avesta** ji aliyê **Xwedê** ve bo Zerdeşt Pêxember hatiye hinar-tin dike.

Ji bo keşîfkirin û parastina nusxeyên cuda yên **Avestayê**, dilqê (rol) lêkolog û kurdologên **Rojavayê**, xasma yên **Girekan** pir mezin bûye. Herweha ji bo bidestxistina nusxeyên cuda, gelek tarîxên cuda hene. Li gorî hin dîrokzanan, nusxeya herî kevin, ya berî 1600 salan hatiye dîtin. Nusxeyeke destnivîs hatiye dîtin ku di 1205'an de hatiye nivîsandin. Di 1278'an de nusxeyek ji aliyê **Visperadanî** ve hatiye amadekirin. Di 692'an de çaxê ku **Yezegerd** derketiye ser text, nusxeyekê ji ber wan nusxeyên heyî nivîsiye. Nusxeyeke din di eynî salê de (17.11.692) hatiye nivîsandin, nusxeyeke dîtir jî di 1352'an de hatiye nivîsandin.

Lê xebata herî zêde bi awayekî zanistî ku li ser Zerdeşt Pêxember û pirtûka wî **Avestayê** çêbûye. Şah **Riza Pehlewî** daye kirin. Wî komîteyeke navnetewî ji van welatên li jêrê dabû çêkirin: **Emerîka**, **Elmanya**, **Îngilîztan**, **Frense**, **Îtalya**, **Belçîqa**, **Hindistan**, **Japonya**, **Turkiye**, **Yekîtiya Sovyetan**, **Îspanya**, **Misir**, **Avustiralya** û

Norveç, Di wê komîteyê de gelek profesor, dîroknas û pisporen olî hebûne û li ser **Avestayê** şixulîne. Piştî ku ew komîte gihaye encama xwe, berhemêke zanistî afirandiyê, Ew berhem di 1975'an de ji aliyê **S. Inslerî** ve bi zimanê îngilîzî hatiye wergerandin û li dinyayê, xasma jî li sazgeh û wargehên zanistiyê hatiye belavkirin. Niha gelek nusxeyên Avestayê li Unîwersîte û pirtûkxaneyên Rojavayê, di binê parastinê de hene. Wek pirtûkxana Parîsê ya Qiraliyetê, Unîwersîteya Rîga ya Londonê, Pirtûkxaneya Kopenagê, li Elmanyayê û hin deverên cuda yên din.

Piştî 1987'an, gava ku karbisetiya Ayetullah Xumeynî li Îranê bûye serdest, wê berhemê qedexê kiriye û nusxeyên wê tevşewirandine.

Navê ola Zerdeşt Pêxember **Bahdîn** an **Behdîn** e. Bêjeya "bah-beh" bi mana delal, xweşik, rind, bedew û çê ye. Yanî dî-nê delal, ola rind. Kesê ku peyrewê wê olê ye, jê re **Bahdînî-Behdînî** tê gotin.

Di Qurana pîroz a bisilmanan de, navê **Bahdîniyan** "mecûsî" hatiye bikaranîn. Bêjeya mecûs, jî "magû" ku navê meleyên Bahdîniyan bû, hatiye girtin. Ew yek jî, ji ber ku tîpa "g" di zimanê erebî de nîne, îcar bi tîpa "c" bi lêv kirine.

Zerdeşt Pêxember ji Xwedayê bi tenê re **Ahûra Mazda** gotiye. Bêjeya **Ahûra**, di zimanê Arîyan de bi mana *yek, timî û da-îm, rawestîn, xwedî, efendî, mezin, serwer û serkar* e. Bêjeya **Mazda** jî, bi mana *aqil, hikmet û zanîna zêdetir* e.

Li gor felsefeya **Ola Bahdîntiyê, Ahûra Mazdayê** (Xweda) ku sistema vê dinyayê

çêkiriye, jê re şeş teref jî çêkirine ku timî pê re têne libarkirin, weke xwar û jor, pêş û paş, rast û çep. Ji ber vê yekê ye jî ku wan bawerî bi hebûna şeş milyaketan hanîne ku ew milyaket serdarên giştî bûne.

Zerdeşt Pêxember weha gotiye: "*Mirov bi temamî serbixwe ye. Mirov di nava xirabî û qenciye de hîlbijartinê dike. Her mirov aliyê xwe dikişîne û çarenûsa xwe kifş dike. Şeytan ne qiralê ruyê erdê ye, yên ku reng û ruyê erdê diguherînin mirov in. Minrov kole ne û mirov efendî ne. Mirov di nava vê sistema Xwedê de bi cih bûne.*"

Zerdeşt Pêxember her û her behsa "drûx"an (derew) kiriye ku tersê "aş"yê (rastî) ne. Û Pêxember xwestiye ku her kes ji derewan dûr bikeve.

Yek ji xalên girîng ku di felsefeya Zerdeşt Pêxember de hebûye, ev bû: "*Di dinyayê de li pêşberî heft cûre xirabiyan, heft cûre qencî jî hene ku timî bi wan re şer di-kin.*" Ev hawe di gelek tewran de reqema heftan ku li nava gelek miletan bi mane tê hesabandin tîne bîra mirov. Xasma jî li nava Medan ku her heft rojên heftiyê ji ber vê yekê hatine girtin hîn zelaltir e.

Piştî Zerdeşt Pêxember, hin kes ji Medan gava ji welatê xwe çûne deverine dûr, ola xwe jibîr kirine û bawerî bi hin xwedayên din anîne. Piştî çaxê ew vegehiyane welatê xwe, wan ew xwedayên ku pê bawerî anîbûne jî, anîne û di nêv ola Bahdîntiyê de bi cih kirine. Wek xwedayê avê, **Anahîta** û yek jî bi navê **Mîthra**. Li dû vî jî, xwedayek bi navê **Homa** (7) derketiye holê. Lê oldarên Bahdînî, bi gelek salan şûnde rutbeya van xwedayên nû

daxistine jêrê û wan ji **Ahûra Mazda** (Xwedayê bi tenê) re kirine milyaket.

Bingeha **Ola Bahdînê**, li ser sê tiştên girîng avabûye. Ew hersê tişt ev in ku Zerdeşt Pêxember gotine:

1- **Manahîca**: Rind bisêwire.

2- **Vacahîca**: Rind bipeyive.

3- **Akemca**: Rind bilipike.⁽⁸⁾

Ola Bahdînê, zewaca jin û mêran tişte-kî pîroz dêraye û têkiliya bê zewac (zina) gelekî guneh pejirandiye û kiryarên wê tawanbar kiriye. Keç piştî ku 15 salên xwe kutadikirin, karibûne ku bizewicin.

Di Ola Bahdînê de Nimêj

Ola Bahdînê di şev û rojê de pênc caran nimêjê ferz kiriye:

1- Nimêja **Hîvanîyê**, di serê sibehê de dihate kirin.

2- Nimêja **Rapîtwînayê**, di nîvrojê de dihate kirin.

3- Nimêja **Uzayêrînayê**, di navbera nîvro û mexribê de dihate kirin.

4- Nimêja **Awîsrûtrîmayê**, piştî avabûna rojê dihate kirin.

5- Nimêja **Ûşahînayê**, di şevê de dihate kirin. ⁽⁹⁾

Ji bo kirina pênc nimêjên **Ola Bahdînê**, pêwîst bû ku **Gahî** (desmêj) bihatina girtin. Gahî ev e: Şûştina serçav, ya herdu dest û herdu nigan (10). Piştî her nimêjekê, xwestina (dua) bi navê **Nyayîle** hebû ku di dawiya **Avestayê** de cih girtiye. Ew nimêj piştî jiyê heşt salan, li ser her kesî wacib bûye. Lê gava ku jin diketin kirasan, nimêj li ser wan ne wacib bûye.

Cejnên Olî

Di **Ola Bahdînê** de sê cejnên olî yên menşûr hebûne. Ew cejn, ev in:

- Cejna **Maîdya-Zaremya**, di nivê biharê de bû û pîrozkirina wê bi dadana êgir dihate kirin; mirov li dorê dicivyan û zikr û perestîna ji **Ahûra Mazdayî** re dikirin.

- Cejna **Maîdya-Şem**, di nivê havînê de bû.

- Cejna **Maîdyûrem**, di nivê zivistanê de bû.

- Lê piştî cejneke din jî bo zerdeştîyan wek cejna olî hatiye pejirandin: Roja 26`ê Çiriya Pêşî ku ji dayîkbûyîna Zerdeşt Pêxember e dihate pîrozkirin.

Di pênc rojên destpêka her demsalekê de, ayînine olî dihatin kirin. Ew ayîn, di her şeş (li gorî Zerdeştîyan, demsal şeş bûne) demsalan de dihatin kirin.

- Demsala yekê: **Maîdya Zaremya**, nivê biharê.

- Demsal diduyan: **Maîdyûşem**, nivê havînê.

- Demsala sisiyan: **Paîtûş**, çaxê rakirina dext û dan.

- Demsala çaran: **Ayathrem**, çaxê vege- ra sewalan (pez) ji zozanan.

- Demsala pêncan: **Maîdyarem**, nivê zivistanê.

- Demsala şeşan: **Hamaşpahmaêda-ê**m, çaxê germiya şev û rojê dibe mîna hev.

Di salnameya (teqwîm) Zerdeşt Pêxember de, sal 360 roj û meh 30 roj bûne. Pênc rojên din, bi navê **Rojên Gathayê** bi nav kirine û ew bi salê ve zêde kirine.

Ew pênc rojên zêde ji Zerdeştîyan re seranser cejn bûne.

Magûyên (mele) **Ola Bahdînê**, tevî pirtûka xwe ya pîroz li gelek welatên dinyayê belav bûne û xasma ew qefleya ku çûye Anatolîyayê, fikra bahdîntiyê li wir û li nava Asûran bi cih kiriye. Hem di felsefeya Cihûyan û hem ya Philoya Grekan de guhartinine mezin jî dane kirin. Xebata Magûyan a li Kapadokyayê, rûmeteke mezin girtiye xasma ew keşe û pitrikên Filehan ku sirgûnê wir bûne, ketine binê tîna Magûyan û bo xwe gelek tişt ji wan girtine, piştî di ola xwe de jî bi cih kirine.

Çêbûna Dinyayê

Li gor baweriya Zerdeştîyê, çêbûna dinyayê di sê pêravanên (merhele) rûhî re bihuriye û hêj ev diyaya ku em lê dijîn afirîye: Berî her tiştî valahiyeke bêdawîn a xirab hebû, tê de herêmeke bi ruhî cih digirt. Ew herêm, hêzek bû ku her tiştî dizaniya û şûna **Ahûra Mazda** (Xwedê) bi xwe bû. Îcar tariyê xwestiye ku wê ruhîyê di nava xwe de wenda bike, lê Xwedê ferman li çêkirinê daye û du tişt afirîne: *Jiyan* û *bêjiyan*. Piştî Xwedê *jiyan* û *bêjiyanê* di du pêravanên din re dane bihurandin.

Pêrava pêşî: Her tişt bê gewde bûye û rihê mirovan hatiye afirandin. Sehabiyên Zerdeşt Pêxember jî di vê demê de çêbûne. Ev tişt hemû, sê hezar sal bihurandine û bi havên meyiyan.

Pêrava paşî: Xwedê rih û mirov li nava hevûdu dane gerrandin. Xirabî kiriye

bingeha pevçûn û şeran û xistiye xîmê ge-tîgê (made). Piştî dest bi çêkirina nîveka wê ya dawîn hatiye kirin û gumêçîşn (plazma) çêbûye; rih û made di hev de werbûne. Ev pêrav jî sê hezar sal bihurandine, hêj viçarişn (pişkafîn) çêbûye, weke madena erdê, asîman, av, şînayî, heywan, mirov û ruhî (agir). Li ruyê asîman roj, heyv, stêr û gathokîk (planet) afirîne. Herweha duwazdeh burc û 6.480. 000 stêr çêbûne.

Li gorî baweriya olî, ev pênc tiştên girîng hebûne:

1 - Dinya sermedî (daîmî) namîne û dê dawiya wê bê.

2 - Qencî û xirabî her û her li pêşberî hevûdu şer dikin.

3- Ahûra Mazda (Xwedê) û Ehremen (şeytan) ji hevûdu re ters in.

4- Hemû tiştên xwezayê (natur), du beş in. Yek qenc e û yek xirab e.

5- Her jîndar dimire, piştî mirinê dîsanê jîn dibe û dest bi jiyanê sermedî (ebedî) dike.

*

Ariyan pênc planet nasîyane: **Amrîtat** (Mercury), **Haurvatat** (Venûs), **Khsatrhra** (Mars), **Asha** (Jubîter) û **Vohumano** (Satûm). Lê piştî Bahdîniyan şeş planet nasîyane: **Haurvatat** (Mars), **Ameretat** (Mercury), **Aramaîtû** (Heyv), **Haurvatat** (Venûs), **Asha** (Jubîter), **Vohumano** (Satûm). Û wan ruhîya herî mezin ku roj e jî, şewqa **Ahûra Mazda** (Xwedê) pe-jirandine.

*

Li gor Bahdîniyan, ew mirovê pêşî ku afirîne û ku mirov hemû ji dîndeya wan çêbûne, herweha ku ji wan û dola wan re mirin çêbûye, navê mêr **Maşyê** û yê jinê jî **Maşyanê** ye. Li gor Hindiyan navê wî mirovê pêşî, **Yama** ye. Ev nav (Yama) di mîtolojiya Îranê de bûye **Yîma**. Li gor mîtolojiyê, ango **Yîma** goşt xwariye û jê re xwarina goşt tawanekî pir mezin bûye, heta ku piştê ew bi destên birayê xwe hatiye kuştin. Lê li gor Cihû û bisilmanan, navê wî mirovê pêşî **Adem** e. Li gor Malyanan, navê wî mirovê pêşî **Balam-Guitz** e. Mezopotamî navê wî danîne **Apsû**. Li gor Skandînaviyan, navê wî bapîrê mirovan **Ask** e. Kenyayî jî jê re **Mwambû** dibêjin.

Di ola Bahdînê de, piştî mirinê dana hesabê di roja dawîn (qiyamet) de, ev bû:

- Piştî mirinê, saxbûn heye.
- Her kes ji ber xwe ve hesab dide.
- Hesabxwestina herî dawîn a roja qiyametê, di mabeyna **Ahûra-Mazda** (Xwedê) û **Angra Maînyûda** de ye.
- Di jiyana sermedî (ebedî) de, rih û gewde digîjin hevûdu.
- Bihişt û dogeh hene.

“Roja qiyametê, Zerdeşt Pêxember li meydana **Hamestaganê** (Meydana hîsabbê) bi Xwedê ve zarî dîke û jê hêvî dîke ku ew li gunehên Bahdîniyan bibore.” Herweha Zerdeşt Pêxember ji bo ketina bihiştê soz daye Bahdîniyan û ku rihê wan jî her paqij e.

Li gorî Zerdeştiyan, bihişt çar tebeq e û dogeh jî wisan e. Tebeqên bihiştê ev in:

Duşumato, Duşuxto, Duşuvarşto û Tarîktûm (tebeqa binî ku tarî ye). Li bihiştê navê **Ahûra-Mazda** (Xwedê) jî dibe **Garotman**.

Li gorî Zerdeşt Pêxember, horî di bihiştê de nînin û kêm-zêde jiyê zilaman 40 û yê zarûkan jî 15 ye. ■

Ev tēbiniyên ku stêrk (*) li pêşiya wan heye, yên min in. Tēbiniyên ku bê stêrk in, ji pirtûka Dr. Strac Bilgin hatine wergirtin.

(1) * *Kurdische texte*- A. v. Le Coq- Berlin 1903, rûpel: 45 tekesta destnivîs.

(2) Piştê girêdana kemerê, di çaxê nimêjê de ji nimêjkerên **Ola Bahdînê** re bûye edet. Îcar li ser wê yekê ye dibêjin ku niha jî gava hinek Kurd xasna jî yên Başûrê Kurdistanê nimêjê dikin, kemberekê yan egalekê li piştê xwe girêdidin.

(3) Li gorî hin rîwayetan, Zerdeşt Pêxember li keviya çemê **Daitayê**, yan li keviya çemê **Darajayê** (Çemê Dirêj) bûye. Lê baweriya dîrokananê bi navûdeng **Damesteter**: Ne li keviya wan çeman lê li keviya çemê **Tingrist** (Dicle) bûye û gotiye ku Hingê ew her çar çem jî di nêv axa **Împeratoriya Medê** de bûne.

(4) Li gor nivîskarê **Grekî Porphyriusî**, ew çiya di wan heft salan de herim bi nûrê xemilî bûye.

(5) Ji ber wê yekê ye dibêjin ku weşartina êgir di nava Kurdan de bûye wek torre û heta niha jî vedîşêrin da venemire û ku careke din dadin.

(6) Hemû kesên peyrewê **Ola Bahdînê**, li pêşberî ola xwe, ji sih û sê pîrsan berpîrsyar bûne, diviya ku her kesî bersîva wan 33 pîrsan bizanibûna. Kesên ku nizanibûna, ew **Bahdînî** nedibatine hesabandin.

* Li nava Kurdan tîzbiya destên zilaman ku niha jî 33 lib in, grêdayê bi wan 33 pîrsan ve ye.

(7) * Di kurdiya kirdîkî (zazakî) de, navê Xwedê **Homa** ye.

(8) Ev hersê peyvik niha jî di kurdiya kirdîkî de bi eynî maneyê têne bikaranîn.

(9) * **Ola Bisilmaniyê** di şev û rojê de, pênc nimêjê wacib kirine. Çaxê kirina wan, herwekî di **Ola Zerdeşt Pêxember** de, eynî ne.

(10) * **Gahiya** (desmêj) **Ola Bisilmaniyê** herwekî **gahiya Ola Bahdînîyê** ye. Lê bisilman bi herdu destan re herdu milên xwe heranî enîşkan jî dişon.

BOKRÛZ

Her parçeyekî cigerim
Ke debînim çiqil eçê be pêy guliya
Ya helavî jî lemoy qîr bokrûzî lêwe dênê
Hezar bizmarî jengawî
Be... goştî dilma deçeçê!
Her bêwejinê...
Debînim memkekanî wekû porî awerûtin
Be êşqan û çermî singiya tûrekey şor...!
Hezaran derzî eşterxan
Mêşik û bîrim dekrojîn!
Her kiwêstanê debînim wê!
Na... aşinay germesêr e...!
Ke areqe û siwêrawkî leş
Le cê teqe lê terîbdanî kewakey da
Nexşey kiwêrewerî jîni
Cêgay destî asinîni
Şermezarî em serdemey tiya nexşawe!
Gilêney çawî ebleqim
Cûtê... taney zengiyaney tiya nêjrawe.

M. Emîn Pencewîni

HEVPEYVÎN BI RONALD HARWOOD RE

Şahîne Bekirê Soreklî



Ji çepê: Serokê PENê Ronald Harwood, Joe O'sullivan, serokê PENê yê beşê Perth, roavayê Australya, Profesor Dennis Haskell, ji zanîngeha roavayê Australya.

Di navbera 26.10 û 1.11.95'an de Kongreya Navneteweyî ya Nivîskarên Cihanê, PEN, li Fremantle, li nêzikî bajarê australî Perthê, çêbû. Hevalê me Şahîne Bekirê Soreklî jî beşdarî kongreyê bû û ji bo Nûdemê ev kurtehevpeyvîna jêr bi Serokê navneteweyî yê PENê, Ronald Harwood re çêkir.

Ş. B.S: Birêz Ronald Harwood, bi dîtina te, rola herî girîng ya rêxistina PEN çi ye?

R. H: Ne hêsan e ku merov bi kurtî behsa hemî rolên PEN bike, lê bi dîtina min du rolên esasî yên rêxistinê hene: Yek, Piştgiriya çand, wêje û zimanê endamên hemî beşên rêxistinê, rêxistina PEN ya ku 120 navendên xwe li 94 welatên cîhanê hene. Van rêxistinan ne nûnerên hukmatên çî welatan, lê nûnerên zimanên xwe ne. Du, rêxistina me piştgiriya azadiya gotinê dike û li nivîskarên di girtîgehên de xwedî

derdikeve. Îro dora 900 nivîskarên cîhanê girtî ne. Ew têne êşkencekirin, yan di rewşeke xirab de girtî ne; hindêk ji wan heta têne kuştin jî. Em piştgiriya van nivîskarên dikin.

Ş. B. S: *Xemgîniyên rêxistinê yên herî mezin di rewşa îro de çi ne?*

R. H: Xemgîniya herî mezin bi rewşa komarên Yûgoslavîya ya berê ve girêdayî ye, bi taybetî rewşa nivîskarên Sarayêvo. Li milê din, problêmên me yên herî mezin bi wan welatan re ne ku xwe wek demokrat bi nav dikin, welatên wek Tirkiyê. Li Tirkiyê 90 nivîskar di girtûgehan de ne. Pîrraniya wan ji bo piştgiriya mafên Kurdan û zimanê wan girtî ne. Me navendeke PEN'a kurdî jî heye. Me li gel Çînê jî problêm hene, bi taybetî ji bo pîrsa HONG KONG, ku di 97'an de dê bibe beşekî ji Çînê. Bêpirsiyarên çînî naxwazin kesek behsa mafên merovan li Çînê bike û dibêjin, ev pîrseke hundurîn e. Lê bi baweriya min, her kes li cîhanê xwediyê mafê merovahiyê ye, wekî ku ez xwediyê vî mafî me, wekî ku tu li Australyayê xwediyê wî mafî yî. Divê merov ji bo ku herkes li cîhanê vî mafî bi dest bixe têbikoşe. Bi saya Japonê, em hewl didin ku endametiya navendên PEN'a Çînî vejînin. Hêviya me ew e ku em wan car din di nav xwe de bibînin.

Ş. B. S: *Wekî ez dibînim, ji Rohilata Navîn tenê wefda Israîl beşdar e. Ji 22 welatên ereb kesek nehatiye, ne jî ji Îranê. Çima?*

R. H: Gellekî kêfxweş im te ev pîrs kir. Me nuha navendeke filistinî heye. Wefda Israîlî bi xwe ew pêşniyar kirin. Mixabin, ji ber astengine nikaribûn beşdar bibin. Li

Misrê û Tûnisê jî navendên PENê dest bi kar kirin, lê li gel wê jî di rêxistina PEN ya navneteweyî de hejmara nivîskarên bi erebî dinivîsinin kêm e. Ev jî cîhê mixabê ye. Li Cezayir problêmeke mezin heye. Musilmanên şewehişk nivîskar di bin tehdîdan de neçar kirin ku dest ji PENê berdin. Îran maf nade nivîskarên ku navendeke PENê damezirînin. Navendeke nivîskarên Îranî li derve heye. Li Îrêqê navenda PENê nîn e.

Ş. B. S: *Birêz Harwood, wekî hûn dizanin, îro dora 40 mîlyon kurd hene. Zarokên kurdan ji mafê perwerdekirina bi zimanê zikmakî bêpar in. Ev zarok dikarin ji rêxistina PEN çî bipên?*

R. H: Dikarin piştgiriya tevahî jê bipên. PEN bi tevahî piştgiriya mafên zarokên kurd dike, ku bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde bibin. Wekî te di civîna gelemper de bihîst, PEN hewl dide wesîqeyê navneteweyî ya mafê parastina zimanên cîhanê bi rê bixe. Her kes maf heye ku zimanê xwe bi kar bîne. Zimanê gelan canê (ruhê) wan yê hevpar e. Bêparkirina merov ji mafê bikarhanîna zimanê wî bêparkirina wî ji jîyanê bi xwe ye. Zaroyên kurd dikarin li benda piştgiriya tevahî û bêyî şert ya rêxistina navneteweyî, PEN, bin.

Ş. B. S: *Birêz Ronald Harwood, gellekî spas ji bo vê heupeyvînê. Ji bo Kongreya 62'em ya PEN serkeftinê hêvî dikim û ji bo we kateke xweş li Australya.*

R. H: Ez jî ji bo vê fersendê pîrs spas dikim. ■

ÎSAL SEAMUS HEANEY BÛ XWEDIYÊ XELATA NOBEL YA EDEBIYATÊ



Seamus Heaneyê îrlandî îro yek ji wan şairên mezin yê zimanê îngilîzî ye, herweha ew yek ji şairên ku hezkirên şîrê bi kêfxweşî şîrên wî dixwînin, cihekî wî yê taybetî di dilê xwe de çêdikin e. Pevgirêdana neke xurt di navbera şîrên wî û paşeroj û cografiya Îrlandayê de heye. Lê belê ew hemêza xwe ji tema cihanî re jî vedike û dibe şîrê xweşî û nexweşiyên wê.

Seamus Heaney piştî Yeats şairê Îrlanda-

yê yê herî mezin e. Nivîskariya Heaney dinyayên derveyî û hundurîn hemêz dike. Heaney di salên 60-70'yan de li Ulsterê di nûkirina kulturê de roleke navendî lîstîye. Şîrên wî li ser temayên dîroka Îrlandayê û herweha li ser temayên jiyana kesane û rojane radiwestin.

Seamus Heaney ne îrlandiyê pêşî ye ku bûye xwediya xelata Nobelê. Ji bilî xelatgirên Nobelê jî, Îrlandayê gelek nivîskarên navdar û cihanî derxistiye.

Xelatgirê Nobelê yê îsal Seamus Heaney di sala 1939'an de li gund, li Mossbawnê, li bakurê Îrlandayê hatiye dinyayê. Piştî xwendina xwe ya li unîversîteya Queenê, li Belfastê wî digel nivîsandina azad, li gelek unîversîteyên welêt ders dane. Ew ji sala 1989'an û vir ve mîna profesorê şîrê li unîversîteya Oxfordê dixebite. Seamus Heaney ji bilî şîran gelek ceribandî jî nivîsandine. Wî herweha gelek nivîskar û filozofên cihanî jî wergerandine îngilîzî. Ew zewicî ye û bavê sê zarokan e.

Xelata Nobelê her sal, li Stockholmê, ji aliyê akademiya Swêdê ve tête belavkirin. Qîmeta xelatê ya îsal heft (7) milyonên swêdî ye, yanî milyonê dolarên emêrikî ye. ■

WEŞANÊN NÛ

Kundê Kor
Sadiq Hidayet
Wergêr: Edîp Polat
Weşanên Berfîn

Ev romana nivîskarê faris ji aliyê Edîp Polat ve ji tirkî hatiye wergerandin. Edîp Polat di derheqa vê romanê de weha dibêje: Kundê Kor ji bilî ku şopên ji jiyana nivîskar ya taybet di hundurine, berhemêke ji berhemên wilo ye ku xerabî û dilrêzî, evîndarî û hesûdî tê de herî qenc hatine ziman. Digel vê yekê tevî mistizma tîpîk ya civatên rojhilat, qalkirineke tevlihev ya xeyalî û rastî-nî ji bi ser ve bûye, wêca tama wêjeyî ya herî xweş derketiye holê. Ji bo ku di kurdî de jî ev tam bê zefîkirin, bi armanca ku ev behskirin ruhê edebiyata kurdî jî bide biriqandin, di çend cîhan romanê de gotinên pêşiyên kurdan hatine bikaranîn. ■

Antolojiya Edebiyata Kurdî
Amadekar: Mehmed Uzun
Weşanên tûmzamanlar

Antolojiya Edebiyata Kurdî ji du cildan pêkhatiye û li ser hev nêzikî 1000 rûpelî ye. Nivîskarên her çar perçeyên wêlê di antolojiyê de cih girtine. Antoloji ji çîrok, şîir, hevpeyvîn û hwd. pêkhatiye. ■

Ken û Girîn
Amed Tigrîs û Roman Motkî
Weşanên Apec
Pêkenîn, 200 rûpel

Ken û Girîn ji 184 pêkeninan pêk hatiye. Nivîskarên pêkeninên xwe li ser rewşa kurdan, li ser rewşa rêxistin û partiyên kurdan, li ser rewşa nivîskar û rawşenbîrên kurdan û herweha li ser gelek babetên din yê civakî û siyasî ava kirine. Di pêkeninan de humora kurdî baş diyar dibe. ■

Nêçîra Rovî
Sven Nordqvist
Wergêr ji swêdî: Mustafa Cizîrî
Weşanên Apec

Mam Mendo, pisika wî Findo û çend mirîşk di daristanekê de, di xaniyekê de dimînin. Rojêkê cîranê wan tê serdana wan. Ew dibêje ku ew ê here nêçîra rovi.

Ev pirtûka tijî fantazî, li ser dîtina

Mam Mendo û Findo ye. ■

Cembelî (Kurê Mîrê Hekaryan)
Îhsan Cûlemêrgî
Weşanên Apec
Roman, 197 rûpel

Serpehatiya Cembelî, kurê Mîrê Hekaryan û Binevşa Narîn, di folklorê kurdî de devkî de bi sedan sal e ku dom dike û tê. Cembelî kurê Mîrê Hekaryan e. Binevş jî keça Mîrê eşîreke koçeran e. Binevş ji aliyê pîsmanê xwe Ehmed ve tê xwestin, lê ev zewac ne bi dilê bavê Binevşê ye. Berpê û girêyan diavêje ber Ehmed. Şertên pêkanîna wan zehmet û riya çûn û nehatinê dide ber. Lê Ehmed xweşmêr û mîxasê eşîrê ye. Xwe ji van daxwazan nade paş. Cembelî, di salên xwe yên zewacê de ye. Heval û hogirên wî pesnê spehîrî û bedewiya keça koçer Binevşa Narînê digihîne. Mesele bi riya diya wî û hinek mezinên eşîrê ve ji Mîr re tê gotin. Mîr, keçaçoçerekefî hemkûfê kurê xwe û mîrîtiya xwe nabîne. Lê evîn bi ser mîrîtiyê dikeve... Bi wî awayî serpehatî didome û diçe... ■

Keser û Kovan
Havîz Qazî
Weşana xwe
Şîir, 78 rûpel

Mijara helbestên Havîz Qazî ku di vê pirtûkê de cih girtine piranî li ser rewşa Kurdistanê, li ser welatêzî û li rizgariyê ye. ■

Xwîn û Hêstîrên Çavan
Lokman Polat
Weşanên Çanda Nûjen
Çîrok, 117 rûpel

Pirtûkê ji 23 çîrokan pêk hatiye. Mijara hemû çîrokan li ser rewşa kurdan û li ser problemên civata kurdî ne. ■

Çîrîskên Rizgariyê
Mîhemed Dehsîwar
Weşanên Newroz
Roman, 314 rûpel

Paragrafa dawî ya li pişt vê romanê weha ye: Çîrîskên Rizgariyê romanêke xeyalî ye, lê ji jiyana gelê kurd û pêşerojê tîne zimên. Berxwedanê, tekoşînê û xeterên giran, fidakarî û hevalbendiyê, dosranî û dijminatîyê, hêsanî û zoriyê tîne

ziman. ■

Tarîxa Felsefeyê Ya Rojava (Qirna Antîk)

Mustafa Düzgün
Weşanên Berhemê
Felsefe, 189 rûpel

Nivîskar û lêkolîner Mustafa Düzgün bi xwe di derheqa vê pirtûka felsefeyê de weha dibêje: Bi qasî ku ji destê min hat min xwest ku ez Tarîxa Felsefeyê ya Rojava bi zimanekî sivik û ruhwan binivîstînim. Min wisan jî kir. Lê divê dîsan jî ji bîr neçe, ku felsefe bi xwe zehmet e û di kurmancî de ev problem zêdetir dibê. Ji ber vê çendê divê ku xwendevan bi dîqet bixwînin, li ser bisekinin û lê hûr bibin. Lê dîsan jî mirov dikare bi bêje ku kurmancî wek zimanê felsefeyê jî zimanekî şîrîn û vekirî ye. Di destpêkê de xof û tîrseke mezin li ser min bû; lê belê her ku lê hûr bûm, pêşî li min ve bû û qîma min bêtir bi min hat. ■

Bir Kûrt Olarak Yaşamım
Nûredîn Zaza
Weşanên Mezopotamya
Bîranîn, 361 rûpel

Ev bîranînê Nûredîn Zaza ku berê bi fransî de bin navê "Ma vie de Kurde" de derketibû, Aytelîn Karaçoban ew wergerandiye tirkî. Nûredîn Zaza di vê pirtûkê de diroka Kurdistanê ya heftê salên dawî radixe ber çavan. Herweha ew bi hostedî ji jiyana xwe ya zarokî, xortanî, siyasî û rawşenbîrî mîna resimekî pêşkêş dike. ■

Lêkolîn
kovara Înstîtuya Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanistiyê
Hejmar 1, Adar 1995
Weşanên Înstîtuya Kurdî
235 rûpel

Ev kovara ku ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Berlînê ve hatiye derxistin, bi taybet li ser zimanê kurdî û problemên zimanê kurdî rawestiyaye. Di vê hejmarê de ev nivîskar hene: Îsmet Şerîf Wanly, F. Husên Sagnîç, Fêrîgîn Melîk, Kurdistan Mukriyanî, Selîm Biçûk, Husên Kartal, Îzedîn Nasso, Lerzan Jandî, A. Balî, Baran Rizgar, Bavê Nazê, Beyhanî Şahîn. ■

Boris Pasternak

Evgeni Pasternak

Wergêr: Ferhad Shakely

Weşanên: Kulturföreningen Sverige-Kurdistan

Şairê rûs Boris Pasternak (1890-1960) yek ji şairên sedsala me ye mezin e. Ew bêtir bi romana xwe Doktor Zhivago tete naskirin. Wî di sala 1958'an de xelat Nobel ya edbiyatê girt, lê ji aliyê partiyê ve mecbûr ma ku xelatê nestîne. Pirtûk ji çar nivîsan pêk tê, ku sê heb ji wan ji aliyê lawê wî, Evgeni ve hatine nivîsandin. Nivîs di derheqa jiyana B. Pasternak, evîna wî ya li hemberî jina wî ya pêşî û ya dudan û çiroka xelat Nobel de ye. Wergêrê wê pirtûkê ji aliyê Ferhad Shakely ve hatiye kirin. Pirtûk bi soranî û tîpên erebî ye. ■

Halbizharda la Çirok-î Kurt-î Bêgana

Anatole France, Saki

Wergêr: Goran

Weşanên: Kulturföreningen Sverige-Kurdistan

Ev pirtûka ku bi pêşgotineke Ferhad Shakely ya di derheqa Goran û xebata Goran dest pê dike, ji heşt çirokên Anatole Franc (1844-1924) û Saki (1870-1916) pêk tê. Tema piraniya çirokan evîn û mirovhezî ye. ■

Gashtëk Bo Erzarom

Alexander Pushkin

Wergêr: Dr. Maruf Khaznadar

Weşanên: Kulturföreningen Sverige-Kurdistan

Şairê rûs ye neteweyî Alexander Pushkin (1799-1837) di sala 1829'an de di ser Gurcistan û Ermenistanê re çû rohilatî Tirkîyeyê. Ev rewîti bi şerê rûsan û tirkan ve girêdayî bû. Pushkin di wê gera xwe de li ser rewşa wir ya siyasî, civakî û dînî radiweste. Herweha ew pêrgî kurdan jî tê û behsa wan jî dike. ■

Sînor

Xurşîd Mîrzengî

Weşanên Jîndan

440 rûpel

Ji bo gelê kurd sînor birîneke kûr, pîsgirêkeke pîralî ye. Aliyên sînor yên siyasî, civakî û aborî hene. Dîsa di van sînorên ku derî vîna gelê kurd hatine kirandin de, gelê kurd bi hezaran hejar, belengaz û mîrxasên xwe wenda kiriye.

Ev berhem neçerê li wê birîna kûr dixê û bala xwendevanan dikişîne ser bûyer û qewimînên li ser sînor. ■

Bîrova Çavan

Gabar Çiyan

Weşanên Jîndan

92 rûpel

Gabar Çiyan çend piyêsên xwe gihandinê hev û mîna pirtûk çap kiriye. Her piyêsek bi çend perde ne û giraniya wan li ser zarokan e. ■

Li Kurdistanê Hêzeke Nuh (Jinên Kurd)

Rohat Alakom

Weşanên Apec

144 rûpel û nêzikî 60 rûpel resim

Ev lêkolîna Rohat Alakom ya li ser jinan ji heşt beşan pêk hatiye. Di beşa I' de zimanê kurdî û jin, Kurtenêrîneke lêkolînê li ser jinên kurd, Bi çavên biyaniyan jina kurd, Di civara kurd de cihê jin û maderşahi, Çend edetên zewacê û pozîsyona jinan cih girtiye. Beş II: Berî sedsala 19'an. Beş III: Kurdistanî Tirkîyê. Beş IV: Kurdistanî Iraqê. Beş V: Kurdistanî Îranê. Beş VI: Kurdistanî Sûriyê. Beş VII: Yekitiya Sovyet. Beş VIII: Ewropa. Di dawîya pirtûkê de jî biyografiyê li ser jinan û herweha albumeke fotografan jî hatiye amadekirin. ■

The Case of Kurdistan Against Turkey

Sureya Bedir-Xan

Weşanxaneyê Sara

Pirtûka Doza Kurdistanê li Hevberî Tirkîyeyê - "The Case of Kurdistan Against Turkey" ji hêla Xoybûnê ve ku di sala 1927'an de li derveyî welêt, li Lubnanê hatibû damezrandin, çap bûye. Nivîskarê pirtûkê Mîr Sureya Bedir-Xan e, ku ew yek ji girîngtirin şervanê li dijî kemalîzmê, ye destpêka wê sedsalê bû. Pirtûk cara pêşî di sala 1928'an de li Filadelfiyayê (Amerîkayê) tê weşandin. Pirtûka Doza Kurdistanê li hevberî Tirkîyeyê komêk ji dokument û belgenameyên kurdî yên destpêka wê sedsalê ye. Dewleta tirk gelek hewldanên mezin daye ku ew pirtûk ronahiyê nebîne. Her wisa jî di dawîya pirtûkê de, komêk ji dokument û belgenameyên kurdî bi swêdî hatine berhevkirin û serzêdekirin. Li herî dawîya pirtûkê jî, çend wêneyên neçapkirî hene.

Pêşgotina pirtûkê ji hêla nivîskar û rojnamevan Herbert Adams Gibbons ve hatiye nivîsandin. Wê di pêşgotina xwe de, ku berî bi 70 salî nivîsandiye, dibêje: "It is good for us to know the Kurds and their heroic struggle to save their heritage of centuries. They say they will fight on; and I'm sure that they will." An ku: "Me gelek pê xweş e û em dizanin ku kurd bi têkoşîna xwe ya lehengane parastina hebûna xwe ya salan dikin. Kurd dibêjin ku em ê ji bo wê yekê her têkoşîn û min bawerî pê heye ku kurd dê her bi vi karî rabin."

Kêfarata Mîr Sureya Bedir-Xan û Xoybûnê, xebatek ji dîroka berxwedana kurdan e. ■

Costumes Et Tapis Kurdes

Jezn-Marie Criel / Prvine Jamil

Weşanên Înstîtûya kurdî ya

Brukselê

Pêşgotin: Pervin Cemil. Kurd: Rih (est), Dîroka û çanda wan:

A. Kurdistanî îroyîn: rewşa coxrafî û kaniyên xwedêrî, gelhe, ziman, ol: berî îslamê (Zerdeştî) û di bin îslamê de: sunnî, alewî, yezîdî.... jina kurd.

B. Rih û dîroka kurdan: Berî zayîna Îsa, piştî Mîladê, piştî Îslamê, demên nûjen. C. Kurd li Ewropa: Karkerên derhatî, penaber, rewşa civakî û çandî.

D. Wêbêya kurdan?

Beş I: Cil û xaliyên kurdî: Jean-Marie Criel

I: Cilên zilaman: şal û şapik, kofî, ebayên şivanan, gore û berhemên din ên ji hiriya (Triko).

II: Cilên jinan: cil, gewher, kofî.

Beş II: Xalf û berhemên din ên hêvastî.

III. Taybetiyên xaliyên kurdî.

IV. Navên xaliyan û ciyên eslê wan.

Û herweha beşek albuma foto li ser cil û berg, berhem û xalf û kurd li Beljîkayê.

Berg û wêneyên hundur yên wê berhema bi fransî rengîn in. ■

BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!



Ger hewesa te li ser helbest, çîrok, roman, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, sînema û hwd. hebe, pêşniyazeke me heye; bibe aboneyê Nûdemê!

Ger tu dixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya her çar perçeyên welêt haydar bibî û edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwînî, dîsan bibe aboneyê Nûdemê!

Nûdem dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu jî alîkariya wê bike, bibe abone!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê Nûdemê.

Ji bo Swêd salek 190 Sek, welatên din 50 \$

Nav û paşnav.....

Navnîşan.....

Vê karta jor dagirin û fotokopiya wê li ser navnîşana Nûdemê bişînin. Çer ku ew bigihîje me, em ê Nûdemê digel karta abonetiye ji we re bişînin.

WEŞANÊN NÛDEMÊ YÊN NÛ



Maleke bê pirtûk weke xaniyekê bê pencere ye

Moa Martinsson